

### Hosteyên betaniyan qefle li deriyên xwe dixin

**DI** çanda civakî de, bi keda destan gelek kar û pîşê hene ku ji bo civakê bûne mîrat. Hinek ji van gihiştine heta roja me û hinek jê jî li ber wendabûnê ne. Yek ji wan karên ku bi keda destan tê kirin jî çêkirina betaniyan e.

RÛPEL 09



### Kirdan/Zazayan de Muzîkê Polîtîkî

**Kirdan/Zazayan** de semedo ke yew tradîsyono biquwetin nuştiş nêbîyo, unsurê ke cematan virazenî û cor de nameyê înan ameyê dîyayîş wareyê muzîkî de xo viraştê. Mavajî zaf deyîranê kurdan de bîyayîşanê tarîxîyan ra behs kenî.

RÛPEL 11



### Siyasetmedar û rojnamegerê Kurd: Homer Dîzeyî

**HOMER** Dîzeyî di jiyana xwe de hunermendî, rojnamegerî, siyasetmedarî û pêşmergetî kiriye. Dîzeyî bi dengê xwe yê qedîfe li seranserê Kurdistanê tê guhdarîkirin. Muzîka rojavayî li gor çanda Kurdî gelek balkêş neqişandiye.

RÛPEL 12

bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 24
19 - 25 HEZÎRAN 2017
www.basnews.com



REFERANDÛMA SERXWEBÛNA KURDISTANÊ Û HELWESTA TIRKIYÊ S2

# TÊKILIYÊN KURDISTAN Û TIRKIYÊ TÊK NAÇIN

**> PARLAMENTERÊN AKPê: REFERANDÛM MAFÊ KURDISTANÊ YE**

Parlamenterên AKPê yên Kurd û Wezîrê Derve yê Berê li ser diyarbûna dîroka referandûma serxwebûna Kurdistanê ragihandin ku pêkanîna referandûmê mafê Kurdistanê ye û divê herkes rêzê jê re bigire û eşkere kirin ku têkiliyên Hewlêr û Enqerê têk naçin.

**> TIRKIYE: LI HEMBERÎ KURDISTANÊ SÎNOR NAYÊN GIRTIN**

Tirkiyê ku li gel herêma Kurdistanê di nava têkiliyên xurt û demdirêj de ye li ser biryara pêkanîna referadûma serxwebûnê, eşkere kir ku li hemberî Kurdistanê dê tu ambargoyan daneyne. Herwiha hat ragihandin ku Herêma Kurdistanê dê nûnertiya xwe li Enqerê veke.



**JAN DOST** >02

Redekte



**EKREM ÖNEN** >03

Referandûm Reaksyona Rûsya, Amerîka û YA yê



**MURAD CÎWAN** >12

Nimêja vê destmêjê bivênevê ye

S3 PARLEMENTERÊ HDPê ÎMAM TAŞÇIER:



## Em bêyî şert û merc piştgiriya referandûmê dikin

Herwiha Taşçier biryardayîna referandûma Kurdistanê, helwesta HDPê, çareserkirina kêşeya Kurdî li Bakurê Kurdistanê û helwesta Tirkiyeyê di derheqê referandûma serxwebûnê de nirxand. Taşçier diyar dike ku divê bê şert û merc piştgiriya referandûma serxwebûnê bê kirin.


S5 NECAT ZIVINGÎ



## Kurd rêwiyên rêyeke dirêj in

Kurd, rêwiyên rêyeke dirêj in. Li aliyekî têra xwe hêzdar, tecrûbedar û têgihîştî ne. Li aliyê din westiyayî, birîndar û derengmayî ne. Lêbelê ji bo dewletbûnê mîna zarokekî 7 salî ne. Ber bi xortanî û ciwaniyê ve bilind dibin. Dewletên din, mîna kalên 70 salî ne, ber bi gorê ve dadikevin.

S8 DÎPLOMASIYA SERXWEBÛNÊ DESTPÊ KIR



## Dewletên YE referandûmê çawa dinirxînin?

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî di nava vî heftiyî de pêşwazî li gelek konsol û nûnerên welatan kir. Cîgirê Serokwezîrê Kurdistanê Qubad Talebanî û heyeta li gel wî jî li Hollanda û Belçîkayê dest bi hevdîtinên dîplomatîk kirin.



JAN DOST

## Redekte

Zimanzanên her milletî li edebiyata xwe ya klasîk vedigerin, li stûnên wêjeya xwe vedigerin ku ji wan fêrî zimanê pak û zelal bibin. Li kaniya rêziman û jêdera resen î ferhenga wî zimanî vedigerin û li gor wê yekê gavê xebatên xwe davêjin. Lê zimanzanên me kurdan ji siya xwe dûrtir narin mixabin. Di xwe re nabînin herin Mem û Zîna Xanî, Seyfulmulûka Siyahpûş, Iqdê Durfama Eskerî, Mewlûda Bateyî, Dîwana Cizîrî bixwînin û nas bikin ka bê ziman çi ye? Çawa peyv hatine bikaranîn? Van giregiran çi rêziman bikaraniye.

Zimanzanên me her di gundên xwe de, di herêma xwe de dimînin û her dibêjin: Pîrka min wisa digot. Gotina rehmetiyê Apê Musa Anter tê bîra min lê ez nabêjim. Herhal hûn jî dizanin bê ji rehmetiyê Feqe Huseyn Sagnic re çi gotibû.

Bone û minasebeta van peyvên min dîsa redekte kirina romaneke min e. Ez nabêjim ku ez pisporê zimanê kurdî kurmancî me, lê ez mirovekî ku min xwe zêde bi xwendina klasîkan re westandiye. Min ji zaroktiya xwe de guh daye helbestên giregiran û heta bigihîje Seydayê Cegerxwîn. Ji bilî wê jî dê û bavê min, xweh û birayên min her û her di malê de bi kurdî axivîne, ez li kolanê her bi kurdî axivîme. Heta li dibistanê jî, li zankoyê jî ez dûrî zimanê xwe nebûme. Zimanê kurdî, kurmanciya me ya bakur, êdî li ba min bûye selîqe, yanî hewceya min bi xwendina kitêbên rêziman nîne ku bizanibim çawa binivîsim û biaxivim û bizanibim kîjan  peyv nêr e kîjan jî mê ye. Erê wek her mirovî şaşiyên min hene û ez kêfxweş dibim gava yek şaşiyek min rast dike. Ez jê fêr dibim. Lê gava yek tê bi behaneya redekte kirina berhemek min rastiyek min xwar dike, peyvek min diqurmiçîne, li şûna „Ceh" peyva „Ce" datîne meselen ez êdî hêrs dibim.

Di yekem romana min Mijabad de ez rastî vê teşqeleyê bûm. Tewangê romana min tewand û bi min nexweş hat. "K" di hin peyvên mîna Kemyon û Belkon û hdw de bû "Q". Niha jî romana min Kobanî dîsa rastî vê problem hatiye.

Mixabin çavên min nema alîkariya min dikin ku ez li berhemên xwe vegerim û binêrim ka çawa hatine redekte kirin loma jî dema digihîjin ber destê xwendevanan, ne bi awayê ku ez dixwazim e.

Yek ji kêşeyan meseleya nêr û mê ye. Mêbûn û nêrbûna peyvan ji herêmekê heta yeke din diguhere. Kesek nikare bibêje a min ji a te rasttir e. Çawa "nêrê min î mê" bi guhê te nexweş e weha jî nêrê te bi guhê min nexweş tê. Di zimanê erebî bi xwe de, ku zimanê Quranê ye û bi sedê salan xizmet jê re bûye ev mesele heta niha çareser nebûye, îca ji bo çi hinek dixwazin nêrên me hemûyan bixesînin! Yan jî mêyên me bikin nêr!


Sînga min wek mînak. Gelek dibêjin sîngê min, mirov nikare bibêje a vê heremê yan vî zaravayî rast e û ya din xelet e, tu li berhemên klasîk jî vedigerî tu dibînîn ku li her herêmekê bi awayekî ye.

Em divê li klasîkan vegerin û reseniya zimanê xwe ji nivîsên wan nas bikin ne ku li gotinên derdorê, ji bo me Ehmedê XANÎ jêdera zimanê rast e ne pîrik û kalikên me. Gava em klasîkên xwe bikin esas emê hêdî hêdî ji nakokiyên herêmî jî xelas bibin.

Wek mînak eger em binivîsin: Piştî sî salî rewş qenctir bû. Wê hin werin li vê hevokê binêrin û bibêjin: Na  wisa nabe, ev xelet e, a rast weha ye: Piştî sî salan. Ez nabêjim forma duyem xelet e lê ya min jî rast e çima hûn wê xelet dibînin û radikin û li şûna wê a gundê xwe ya herêma xwe yan jî devoka xwe datînin? Ya min jêdera wê Seydayê Xanî ye, ka gelo te ya xwe ji kû aniye? Xanî dibêje:

Sed salî bigêrî min tu mehbûs
Ma ez qe dibim ji weslê me´yûs?
Her weha dibêje:
Çil salî tu henzelê biçînî
Sed avê bidî bi hingivînî

Mînakên ku em bînin gelek in. Lê ev yek bes e. Hêviya min ew e ji kesên ku tekstan redekte dikin haya wan ji vê meselê hebe, ew nikarin standardekê ferz bikin, ev bi dirêjiya demê re tê. Tu wek xwe binivîse, bihêle ez jî wek ku dizanim binivîsim, zeman wê forma min û te bêjin bike, wê vebêje û ya minasibtir hilbijêre û bigihîne destê neviyan.




Karîkator ---------- Dijwar Ibrahim

Hewlêr û Enqere hevalbendên stratejîk in

# Referandûm têkiliyên Kurdistan û Tirkiyeyê têk nabe



Kurdistanî bi tifaqeke xurt, biryareke dîrokî wergirtin û ji cîhanê re ragihandin ku   referandûma serxwebûna Kurdistanê di 25ê Îlona îsal de pêk bînin. Li hemberî vê biryara dîrokî bertek û nêrînên pêşî ji DYA, Almanya û Tirkiyê hatin û parlamentêrên Kurd yên di nava AKPê de destnîşan kirin ku pêkanîna referandûmê, mafê Kurdistanê ye.



CESÎM ÎLHAN

Li hemberî referandûma serxwebûna Kurdistanê, welatên cîran jî helwestên xwe eşkere kirin. Yek ji van welatan a ku nêrîn û helwesta xwe eşkere kir, Tirkiye bû ku bi Herêma Kurdistanê re di warê aboriyê de rêkeftinên demdirêj pêkanîn e û têkiliyên stratejîk danîne. Her çiqas Tirkiyeyê bal kişandibe ser 'yekperçebûna Iraqê' jî li hemberî biryara referandûmê bertekeke tund nîşan neda. Parlamenterên AKPê yên Kurd jî piştî diyarbûna dîroka referandûma serxwebûna Kurdistanê ragihandin ku pêkanîna referandûmê mafê Kurdistanê ye û divê herkes rêzê jê re bigire.

### "Em ambargoyê danaynin ser Kurdistanê"

Piştî ku Herêma Kurdistanê biryara dîrokî ji raya giştî ya cîhanê re ragihand, dihat îddîakirin ku Tirkeye ji bo ku Kurdistanê ji vê biryarê vegerîne û proseya serxwebûna Kurdistanê asteng bike, wê deriyên sînor li ser Herêma Kurdistanê bigire û ambargoyê deyne ser Kurdistanê ku pê re di nava têkiliyên xurt yên aborî, bazirganî û siyasî de ye. Lêbelê Berdevkê Serokkomariyê İbrahim Kalın, di axaftina xwe ya li ser biryara referandûma serxwebûnê de ragihand ku ewê bi tu awayî deriyên sînor negirin û ambargoyê daneynin ser Kurdistanê. Kalın herwiha diyar kir ku ew bi Hewlêr û Bexdayê re vê mijarê gotûbêj dikin û îddîa kir ku ev biryareke şaş e. Kalın wiha axivî: "Xebatên me yên di vê mijarê de didomin. Bêyî ku em ligel wan biaxivin, bişêwirin, girtina deriyên sînor û sepandina ambargoyê ne di rojeva me de ye û tiştekî wiha nabe."

### Hikûmeta Kurdistanê nûnertiyê li Enqerê vedike

Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî piştî van daxuyaniyên Kalın, ragihand ku ew ê li Enqereyê nûnertiya xwe vekin. Berpirsyarê Karûbarên Derve yê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) Wuşyar Siweyli li ser biryara avakirina nûnertiya li Enqerê diyar kir ku ev tê wê wateyê ku têkiliyên siyasî û aborî yên di navbera Kurdistan û Tirkiyê wê bi awayekî xurt berdewam bikin. Siweyli herwiha amaje bi  wê yekê kir ku vekirina nûnertiya Hikûmeta Kurdistanê li Tirkiyê, bersiv e bo wan aliyên ku îddîa dikin cîranên Kurdistanê li dijî serxwebûna Kurdistanê ne. Siweyli ragihand: "Di vê heyama ku me proseya serxwebûna Kurdistanê daye destpêkirin de girîngiya vekirina nûnertiyê gelekî mezin e. Ji ber ku rola Tirkiyê ya di herêmê de ne biçûk e. Vekirina nûnertiyê, ji bo vegûhestina daxwazên milet û rêveberiya Kurdistanê bo Tirkiyê gelekî girîng e."

Parlamenterên AKPê û Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyê ku dirêjtirîn dem li Rojhilata Navîn kar kiriye, biryara pêkanîna referandûma serxwebûna Kurdistanê, helwesta Tirkiyê û pêwendiyên Hewlêr û Enqereyê ji Heftenameya Basê re nirxand.

### "Birayara referandûmê têkiliyên herdu aliyan têk nabe"

Parlamenterê berê yê AKP û Rektorê Zankoya Hacı Bektaşi Veli ya Nevşehirê, Mazhar Bağlı destnîşan kir ku pêwendiyên Kurdistan û Tirkiyê di pozîsyoneke stratejîk de ne û xera nabin. Bağlı axaftina xwe wiha domand: "Tu biryar nikarin têkiliyên herdu aliyan têk bibin. Tirkiye jî bi tu awayî têkiliyên xwe bi Herêma Kurdistanê re qut nake. Tirkiye ne tenê di warê aboriyê de, di warên siyasî û civakî de jî têkiliyên xurt ava kirine û her du hêz hevalbendên stratejîk in. Ev heval bendiya stratejîk bi hêsanî têk naçe. Lidarxistina referandûmê jî têkiliyên Hewlêr-Enqereyê têk nabe û xera nake."

### "Herdu hêz wê rêyeke hevsengiyê bibînin"

Serokê Komîsyona Dadê yê Parlamentoya Tirkiyê Ahmet İyimaya, radigihîne ku pêwendiyên Kurdistan û Tirkiyê têk naçin û wiha berdewamiyê dide axaftina xwe: "Ev sedsal û heyam a hevgirtin û xurtbûnê ye. Eger derfeta jiyana bi hev re hebe, ez ne alîgirê wê yekê me ku belavbûn çê bibe û digel serweriyeke hevgirtî me. Biryara pêkanîna referandûmê têkiliyên Kurdistan û Tirkiyê xera nake û her du hêz wê riyekê hevsengiyê bibînin. Hiqûq û têkiliyên di navbera herdu aliyan de ji ber referandûmê ji holê ranabin."

### "Em sînor û dilên xwe li ser hev nagirin"

Parlamenterê AKPê yê Stenbolê Mehmet Metiner jî li ser biryara referandûmê wiha diaxive: "Ez biryara pêkanîna referandûmê wek konjonktorî jî û wek stratejîk jî rast nabînim. Em di nav xeleka ji agir re derbas dibin. Hin hêz hene ku ji bo avakirina krîzan di kêmînê de ne. Ez di wê baweriyê de me ku divê Hikûmeta Kurdistanê bi Tirkiyê re, nemaze jî bi Recep Tayyip Erdoğan re gotûbêj bike. Lewma ez vê biryarê ji bo Herêma Kurdistanê jî û ji bo Kurdan jî rast nabînim û ez di wê baweriyê de me ku divê ev biryar bê paşxistin. Barzanî hevalbendê Tirkiyê ye. Di van demên binakok û krîz de, divê herdu hêz bi hev re tevbigerin û bi hev re di nava guftûguyê de bin. Em sînor û dilên xwe li ser hev nagirin. Em Herêma Kurdistanê weke yekî ji malê dibînin. Helbet dema ku me got ev biryar şaş e, ev ne bi neyartî ye, em li ser bingeheke dostane vê rexneyê dikin û vê yekê dibêjin."



Tirkiyeyê biryara pêkanîna referandûma serxwebûna Kurdistanê weke 'bêwext' binav kir, lêbelê eşkere kir ku li hemberî Kurdistanê dê tu ambargoyan daneyne. Herwiha hat ragihandin ku  Herêma Kurdistanê dê nûnertiya xwe li Enqerê veke.

### "Em ji destkeftiyên Kurdan aciz nabin"

Metiner li ser pirsa, 'Gelo mafê Kurdên Herêma Kurdistanê tune ku wek hemû miletên cîhanê ji bo diyarkirina çarnûsa xwe biçe ser sindoqan û îredeya xwe ji cîhanê re ragihîne?' wiha pê de diçe: "Her rastî li her derê nayê gotin. Carinan eger dema wê şaş be, hûn biryareke rast jî bidin û gavên baş jî bavêjin, ev sûdekê nagihîne tu kesî. Divê rastiyên herêmê li ber çavan bên girtin û li gor vê yekê gavên rasteqîn bên avêtin. Siberojê piştî referandûmê, hikûmeta Iraqê û Îran û Sûriye ku alîgirên wê ne, êrişî Herêma Kurdistanê bikin û bi vî awayî li ser DAIŞ û PKKê bikevin nav hewldanên hilweşandina Herêma Kurdistanê, gelo ma bandor û tesîra vê li Tirkiyeyê nabe? Fikara me li ser vê bingehê ye, an na em ji destkeftiyên Kurdan ku birayên me ne, ne aciz in. Ez hêvîdar im ku Herêma Kurdistanê guh bide van hişyariyên dostane yên Tirkiyê."

## "Divê referandûm têkiliyan têk nebe, Kurdistan paş de gav neavêje"

Yaşar Yakış ku yekem Wezirê Karên Derve yê Hikûmeta AKPê bû û dirêjtirîn demê li Rojhilata Navîn kar kiriye di derbarê referandûma serxwebûna Kurdistanê de ragihand: "Welatên din jî dê li hemberî biryara referandûmê  bertekan nîşan bidin. Lêbelê ev bertek bi Kurdan paş de gav nade avêtin. Di 25ê Îlonê de referandûm pêk neyê jî di demeke guncawtir de Kurd dê referandûma serxwebûnê teqez pêk bînin."

Yakış di dirêjiya axaftina xwe de destnîşan kir ku divê biryara referandûmê têkiliyên Kurdistan û Tirkiyê têk nebe û wiha got; "Divê referandûm nebe sedema girtina sînoran û qutkirina têkiliyan. Tirkiye di derbarê girtina sînoran de Erebîstana Siûdî û Katarê rexne dike û bertekên tund nîşan dide.  Rabe heman tiştî ew li hemberî Herêma Kurdistanê bike gelo ma nayê rexnekirin û nabe nakokî?! Divê ev mijar baş bê nirxandin. Nivîsgeha PDKê beriya  niha li Enqereyê hebû. Biryara vekirina nûnertiya Hikûmeta Herêma Kurdistanê li Tirkiyê jî pêngav û biryareke gelek girîng e. Vekirina nûnertiyê tê wateya bihêzbûn û berdewamiya têkiliyên her du aliyan."

Parlementerê HDPê Îmam Taşçier:

# Serxwebûna Kurdistanê dê cesaretê bide hemû Kurdan



RABİA ÇETİN



> Çûyîna Başûr a ber bi serxwebûnê ve tesîrê li seranserê Kurdistanê dike. Ne tenê li beşên Kurdistanê, li ku dera cîhanê be jî destkeftiyên Kurdekî tesîrê li her Kurdî dike. Destkeftiyên li Başûrê Kurdistanê dê her sê beşên din jî bi cesaret bike. Têkçûn jî dê li hemû Kurdan tesîr bike.

**HDPê ragihandibû ku piştgiriya diyarkirina dîroka referandûmê dike. Gelo ev piştgiriya HDPê dê şênber bibe?**

Ne rast e ku ez li ser navê HDPê daxûyanî bidim. Ji ber ku nûnertiya min tune ye. Tenê dikarim weke parlementerekî Kurd binirxînim. Biryara referandûmê di serî de Hikûmeta Kurdistanê eleqadar dike. Em Kurdên Bakur ji hemû biryarên Kurdên Başûr re rêzê digirin. Divê ev piştgirî derbasî asta netewî û navnetewî jî bibe. Li Rojhilata Navîn dewleta Ereban, Farisan û Tirkan heye çima dewleteke serbixwe ya Kurdan jî tunebe. Ev mafekî sed sal e paşketî yê Kurdan e. A girîng ew daxwaz e. Eger Kurd, daxwaza xwebirêvebirinê bikin ev mafekî rewa ye. Divê her Kurd jî piştgirî bide vê daxwazê. Di şert û mercên îro de tu qiymeta nîqaşên ev pêwîst e ev ne pêwîst e tune. Bêguman ev daxwazeke ku sedsal dereng mayî ye. Eger derfetên veqetandinê hebin divê ev bê parastin. Ji xwe têkiliyên ligel hikûmeta navendî ya Iraqê têk çûbûn. Mafên Kurdan ku di destûra bingehîn de hebûn bicih nehatin. Jixwe di destûra bingehîn de jî mafê referandûmê heye.

**Li dijî gotina hin aliyên ku digotin 'Serdema netew-dewletê derbas bûye' di nexşa cîhanê de dema dewleta Kurdan jî hatiye?**

Hin alî paradîgmaya netew-dewletê diparêzin hin alî jî li hember derdikevin. Eger gelek daxwaza xwebirêvebirinê bike mimkûn e ku dewleteke demokratîk a netewî çê bibe. Serdema netew-dewletan jî derbas nebûye. Li gelek dewletan ev statû heye. Ez tevlî gotinên 'Em netew-dewletê naxwazin' nabim. Mafê Kurdan yê dewletbûnê heye. Lê birêvebirineke li gor esasên demokratîk, parastina mafî, girîngiya pirdengî ku wekheviya gelên din jî diparêze mirov dikare tercîh bike.

**Başûr bi rêya diyalogê ji Iraqê vediqete, ev model dê çi tesîrê li Bakur bike?**

Li gelek deverên cîhanê ev rê û rêbaz hatine ceribandin. Bêyî bikaranîna çek û tundrewiyê rêyên demokratîk tên ceribandin. Çûyîna Başûr a ber bi serxwebûnê ve tesîrê li seranserê Kurdistanê dike. Ne tenê li beşên Kurdistanê, li ku dera cîhanê be jî destkeftiyên Kurdekî tesîrê li her Kurdî dike. Destkeftiyên li Başûrê Kurdistanê dê her sê beşên din jî bi cesaret bike. Têkçûn jî dê li hemû Kurdan tesîr bike.

**Li Başûr dewleteke Kurdan çêbibe dê çi tesîrê bo çareseriya kêşeya Kurdî li Bakur bike?**

Li Başûr dewleteke me çêbibe li Bakûr bo bidestxistina mafê me tesîreke erênî dê bike, dê çareseriyê nêz bike. Bo bicihanîna daxwazan dê çalak be. Dê Kurd li hev xwedî derkevin. Di encamê de Kurd bêyî îrada xwe dabeş bûne. Şîn û şahiya her çar perçeyan jî yek e.

**Niha di nav Kurdan de tenê ligel Herêma Kurdistanê têkiliyên Tirkiyeyê baş in, li gor vê yekê jî tenê Bexdayê mixatab dibîne hûn vê yekê çawa dinirxînin?**

Serê Enqereyê tevlîhev e. Beriya Başûrê Kurdistanê statû bistîne digot 'Statûstandina Kurdan xeta me ya sor e.' Lê li hember vê yekê jî dema Kurd bûne xwedî statû têkiliya herî baş ligel wan danîn. Berteka Enqereyê ya niha hestiyar e. Dema Kurdistan serbixwe bû dê têkiliyên wan baştir bin. Cîranên hev in di encamê de. Di warê aborî de jî pêdiwiyên wan bi hev heye.

**Erdoğan pêşiya 16ê Nîsanê mînaka ETA danî ber PKKê û got eger çek bên berdan rêya diyalogê vekiriye. PKK dê çeka deyne?**

Bê axaftin, çima bernede. Eger diyalog hebûya çek jî dê tunebûna. Di proseya çareseriyê de yek çekek jî nehatibû teqandin. Bi gotina 'Çeka berdin, bixin bin betonê' nayê berdan. Kê çek hilgirtibe divê ew biaxivin. Eger sedema hilgirtina çekan bo kêşeya Kurdî be dema çareserî çê bû dê berdin jî. Pêşî divê rewşeke bi îtîbar bê afirandin paşê ji bo çekdanînê gav tên avêtin.

**Hûn bi takekesî 'Li dijî doza bi çek in'**

Ez siyaseta legal dipejirînim. Di jiyana min de min tu carî şerê çekdarî pesend nekiriye. Lê şerê çekdarî jî rêyek e. Ez ne ligel çareseriya bi tundî ya kêşeya Kurdî me.Ez ligel diyalogê û çareseriya bi demokrasiyê me.

Parlementerê Enqereyê Sirri Sureyya Onder got ku 'Dibe ku diyalog destpê bikin'. Em dikevin rewşeke nerm gelo?

Min ne di parlementoyê de ne jî li Enqereyê ev hewa nedît. Sinyalên nermbûnê tune ne. Tundrewî zêde dibe. Parlementerekî CHPê yê Kemalîst jî hat girtin. Bi van rê û rêbazan heta rewşa demokratîk ava nebe, nabe.

**Parlementerê CHP xwedî fikriyata Kemalîst be bo girtina wî asteng e? Rewşa îro ne bi siyaseta CHP derket holê?**

Eger di dengdayîna bexşîniyê de CHP bigota 'Na' îro ne parlementerên me ne jî yên CHPê nedihatin girtin. CHPê ev rê vekir. CHP bû alîkarê AKPê da ku şaredar û parlementer bên girtin.

**Demîrtaş gelek caran qala 'Welatê hevpar' dike. Piştî van her du salên dawî 'Welatekî hevpar' heye gelo?**

HDP partiyeke Tirkiyeyê ye. Dema serokê HDPê diaxive hemû gelên Tirkiyeyê datîne berçavan. Dema hûn li rêziknameya HDPê dinêrin bo Kurdan statû, bo gelan jî demokrasî dixwaze. Ev fikrên siyaseta demokratîk in. Ji ber ku demokrasî an jî dîktatorî tesîrê li hemû gelan dikin...

We qala rêziknameya HDPê kir. Di 7ê Hezîranê de dema bernameya HDPê hat ragihandin ji Filîstînê re serxwebûn dihat xwestin lê bo serxwebûna Başûrê Kurdistanê qet daxwaz tunebûn...

Di daxûyaniya bernameya hilbijartinan de rasterast Başûrê Kurdistanê nayê nivîsandin. Elbet ev kêmasî ye. Lê wê rojê şerê serxwebûnê tunebû. Eger Başûrê Kurdistanê û Iraq di şer de bûna dê ew jî bihatana nivîsandin. Lê îro heye û gotinên Osman Baydemir di derheqê serxwebûnê de gotinên HDPê ne jî.

**Bertekên hêrs û dilmayîna gel a ji ber şerê ku li bajarên Kurdan hat kirin bo HDPê jî heye?**

HDP ne teref û ne jî aligirê şer e. Helbet ji ber ku HDP sîyaseta demokratîk dikir şerê li navendên bajaran çêbû ev yek jî bo sîyeseta demokratîk rewşek e zehmet çêkir. Baş e lê şeş taxên Surê ku hat xirakirin? Lê ji nîvê zêdetir bajarê Şirnexê ku hat wêrankirin û ji holê rakirin? Û şervanên li wir hatin kuştin? Li wir kavilên vî şerî hebûn. 1,5 - 2 sal e kolanên li wir girtî ne. Hemû bajar bi temamî ji holê hatiye rakirin. Ji ber ku 15-20 ciwan şerkirin pêwîst bû ku bajar bihata xirakirin? Gel piştgirî nedida wan. Lê belê dewletê çi kir bi temamî bajar ji holê rakir.

**Kurd di dîroka xwe de yekem car bi 80 parlementerî ketin parlementoyê û piştî vê yekê PKKê 'Xweserî îlan kir' ev yek jî nebû sedem gelo?**

Erê, lê ev yek vî heqî nade dewletê ku bajaran xira bike û ji holê rake. Dewletê hêzên ku li wir şer dikin berteref kir. Temam, paşê çima bajêr xira dike? Heta divê dewlet dema kesên birîndar digire jî nekuje da ku wek dewlet bikaribe hebûna xwe bidomîne. Em bêjin PKK yan jî ev komên çekdar li Enqereyê û Stenbolê tiştek wisa bikirana wê dewletê ew bajar bi temamî xira bikira? Dibe ku PKK şaşitî kiribe, ez îlankirina xweseriyê naparêzim lê ne rast e ku dewlet bi şaşitiyek din bersivê bide vê şaşitiyê.

**Abdullah Öcalan girtî ye, Celal Talebanî êdî ji sîyasetê dûr e. Bi tenê Mesûd Barzanî heye. Gelo Barzanî bo çareseriya meselaya Kurd a Bakur dikare wek serokê Kurd bibe navbeynkar?**

Barzani wek serokekî li ser Kurdan gotina wî tesîr dike. Ger di vê mijarê de bê xwestin dibe ku bi bandor bibe.

**Yanê HDPê vê yekê dixwaze?**

Ger bo çareseriya pirsa Kurd ji rolekî bidin Barzanî, ezê wekî şexs ji vê yekê kêfxweş bibim. Barzanî helbet bo Kurdan serokekî girîng e. Helbet vê rola xwe ya girîng bo çareseriya pirsa Bakur bikar bîne emê kêfxweş bibin.

**Herî dawî hûn helwesta PKKê a bo referandûmê çawa dinirxînin?**

Hin gotinên spekûlatîf ku di tora civakî de cî girtin hebûn lê daxuyaniyên Cemil Bayık erênî bûn. Ez wisa difikirim ku bo referandûmê di navbera Kurdan de tengazî û zehmetê çênabe.

**Endamê Rêveberiya TEV-DEMê Aldar Xelîl di derheqê referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê de gotibû "Herêma Kurdistanê û Rojavayê Kurdistanê di bin pergala konfederaliyê de dikarin bên gel hev" hûn di vê mijarê de çi difikirin?**

Eger malbatek dabeşî çar aliyan bûbe, dema derfet çêbibe dê bên cem hev. Rojavayê Kurdistanê û Başûrê Kurdistanê dema derfet çêbûn dikarin bêne gel hev. Qet nebe dê hin perçe bibin yek. Lê belê heta derfet ava nebin ev yek nabe.

**Hûn parlementerkî Kurd in ku di derheqê we de bi dehan fezleke hatine amadekirin. Gelo rêya vegerînê di mijara kêşeya Kurdî de heye?**

Beriya her tiştî divê Tirkiye demokratîze bibe. Heta kêşeya Kurdî çareser nebe demokrasî nayê Tirkiyeyê. Dema ev rewş ava bibe Kurd bo diyalogê amade ne. Çareserkirina kêşeya Kurdî bi çekan zehmet e. Di encama çekdariyê de jî çûyîna ser maseyê heye. Ev 40 sal e şer didome. 100 sal e jî kêşeya Kurdî heye. Ji van şeran yekî jî çareserî bo kêşeya Kurdî neanî. Bi şer ne Tirkiye diqede ne jî Kurd diqedin. Domandina şer zirarê him dide Kurdan him jî dide Tirkan. Hemû Kurd alîgirê çareseriyeke bê çek in. Lê fikra demokratîzebûnê ligel îktîdarê tune niha. Divê pêşiya siyaseta legal bê vekirin. Pêşî li siyaseta legal bê girtin, sazî û komeleyên sivîl bên girtin ev nîşaneya ku îktîdar hê jî ne amade ye ku rê û rêbazên demokratîk biceribîne. Di derheqê her parlementerê HDPê de doz hatine vekirin. Bo min jî her roj fezlekeyek tê. Me li ku derê peyvek gotibe di derheqê wê peyvê de fezleke ji me re tê. Heta rewşeke demokratîk ava nebe kêşeya Kurdî nayê axaftin.



## ÎMAM TAŞÇÎER

Serokê Komeleya Çanda Şoreşgerî û Demokratîk (DDKD) û parlementerê HDP yê Diyarbekirê Îmam Taşçier bersiva pirsên me dan. Herwiha Taşçier biryardayîna referandûma Kurdistanê, helwesta HDPê, çareserkirina kêşeya Kurdî li Bakurê Kurdistanê û helwesta Tirkiyeyê di derheqê referandûma serxwebûnê de nirxand. Taşçier diyar dike ku divê bê şert piştgiriya biryara referandûma Herêma Kurdistanê bê kirin û dibêje "Ev daxwaz, daxwaza sed salî ye."

> "Eger malbatek bo 4 perçeyan hatibe parvekirin, helbet dema ku şert û merc guncaw bûn, ev malbat wê dîsa were ba hev û bibe yek. Dibe ku Başûrê Kurdistanê û Rojavayê Kurdistanê di bin sîwanekê de hevbigirin."





EKREM ÖNEN

## Referandûm Reaksyona Rûsya, Amerîka û YA yê

Ji bo pirsa referandûma serxwebûnê baş zelal bibe hêjaye hinekî em li tecrubeyên beriya niha binêrin ku miletên din ên di rewşa kurdan de referandûm bi çi awayî kirine û di têkiliyên navnetewî de rewşa wan çawa bûye?

Piştî ku di sala 1989an de bi hilweşandina Sovyetê nîzama piştî şerê cihanê yê duyemîn hiqûqa navnetewî têk çû. Li ser vê gelek miletên di nîzama piştî şerê cîhanê yê duyemîn ên ku di rewşa kurdan de neheqî li wan hatibû kirin, ketin nav xebata serxwebûna xwe ji bo bi dest xin. Di heman demê de welatên rojava ji bo hesabên xwe yî geopolîtîk grubên etnîk ku ji %10ê kurdan bû dewletbûn li wan nedihat, bêyî ku li tu hiqûqa navnetewî pirs bikin, kirin dewlet. Hinek ji van welatên referandûm lê çêbûn ev in: Kosova 1991, Asetya 1992, Abxaziya 1999, Îskoçya 2014 û hwd.

Di sala 2008an de DYA û Brîtanya bêyî ku li tu hiqûqa navnetewî pirs bikin serxwebûna Kosova nas kirin, di heman demê de weke bersivekê ji DYA û Brîtanya re, di sala 2008an de Rûsya serxwebûna Asetya û Abxazya nas kir û ew parastin, heta niha gelek welatên cîhanê serxwebûna Asetya, Abxazya û Kosova nas nekirine. Dervî vana referandûma serxwebûna Îskoçya û Katalonya kete rojevê. Ev herdû pirs jî, Brîtanya û Îspanya xwestin li gor yasaya wan bê kirin bes xelkê Katalonya û Îskoçya guh nedan yasaya ingilîz û îspanî referandûma xwe pêk anîn. Formeke din ya referandûmê jî formê referandûmê ku li Kirim hate kirin. Meclîsa Kirimê bê ku ji Ûkrayna pirs bike biryar da referandûma serxwebûnê pêk anî û sexwebûna xwe îlan kir. Em werin ser referandûma serxwebûnê a Kurdistanê. Di yasaya Iraqê de ne diyariyek di pirsa referandûmê de heye, tu tiştekî konkret ku kurd dikarin an nikarin referandûmê pêk bînin nîne. Her weha niha tu hiqûqek navnetewî nîne ku kurd jî li gor wê bimeşin. Kurd divê bi xwe biryar bidin. Ji ber pirsa serxwebûnê pirsa miletekî bi xwe ye ku ew di paşerojê de dixwaze çawa bijî? Ev mafê rewa yê miletê kurd e. Tişta kurd lê miqatebin balansa hêzên navnetewî ye. Ev balans jî îro ji kurdan re gelek musaîde.Heger em li miletên li jor ku min behs kir binêrin hemû an bi alîkariya DYA an bi alîkariya Rûsya serxwebûna xwe îlan kirine. Lê ji kurdan re rewş îro ji a wan baştir e. Ji ber îro ne DYA ne Rûsya û ne jî YA ne li dijî serxwebûna kurda ne. Beyanên wezaretên derve yên DYA, Rûsya û YA pozîtîvin, her çiqas hinek ji medya kurdan desînformasyon dan ku xwedêgiravî wek ev hersê alî li "dijî" referandûmê ne. Lê di rastiya xwe de beyanên wezaretên derve ên DYA, Rûsya û Almanya tê gotin li "dijî referandûmê" ne rast e, hinek ji medya kurdan gotina ku li "dijin" ji ku anîn nizanim ev cihê pirsê ye? Gelo medya tirk, ereb û farisan kopi kirine. Hêjaye medya kurdî di pirsên weha cidî de li hilbijartina gotinên xwe miqatebe. Ji xwe dema mirov lê dinêre. Wek ku haya wan sê aliyan ji hev heye. Naveroka beyana hersê aliyan ev e ku "em terefê Iraqek yekgirtîne, piştgiriya referandûmê nakin, bes lazim e mafê miletê kurd li gor hiqûqa navnetewî bê parastin."

Em werin ser aliyê dîplomatîk. Yek jê ev hersê alî zirhêzin û siyaseta global dikin. Beyanên wan hertim li gor balansê ye, her weha kesek li vê cîhanê gotina xwe ya paşî pêşî nabêje. Tiştekî din ê girîng kesên ji dîplomasiya stratejîk ne konjukturel fam dikin. Baş zanin ku ferqek mezin di navbera "em piştgirî nakin" û wek hinek ji medya kurdî desînformasyon dane "li dijin" heye. Her weha beyana van hersê aliyan ne stratejîke, konjukturele. Ji ber wek em dizanin beriya îlankirina referandûmê bi du rojan birêz Mesrûr Barzanî li DYA bû û birêz Neçîrvan Barzanî jî li Rûsya bû, piştî vegeriyan bi du rojan kurda îlana referandûmê kirin. Ez ne bawerim birêz Mesûd Barzanî işareta pozîtîv ji DYA û Rûsya ne girtibe biryarek weha zû bi zû bide. Di van 30 salên dawî de alîkarî û piştgiriya van sê aliyan ji bo Başûr û Rojavayê Kurdistanê. Her weha hesabê van sê aliyan di warê stratejîk û aborî de li ser Kurdistanê, şîrketên navnetewî yên van sê aliyan li Kurdistanê hesabên dur û dirêj dikin. (EXXON MOBIL, ROSNEFT, E.ON). Divê kurd li beyana hersê aliya di derbarê referandûmê de wek startejîk erênî lê binêrin û têkiliyên xwe bi DYA, Rûsya û YA re dewam û xurttir bikin kurd bi piştgiriya wan tenê dikarin bighên armancên xwe. Dijminatiya wan bi tu awayî ne di berjewendiyê kurdan de ye. Dinya piştgiriyê dide referandûmê, niha her tişt maye li ser kurdan.

Serdana Kılıçdaroğlu ya HDPê

# ‘Eniya Na’ an jî ‘Eniya Demokrasiyê’?

DILŞAH AMEDÎ

Serokê Giştî yê CHPê Kemal Kılıçdaroğlu, heftiya din di çarçoveya serdana partiyên di referandûma 16ê Nîsanê de gotine ‘Na’ de serî li HDPê jî da. Di çarçoveya serdanên‘Bloka Na’ de Kılıçdaroğlu, serî li partiyên Saadetê, Partiya Demokrat, Partiya Welat û mixalîfên Partiya Nijadperestên Tirk (MHP) ê da bû. Herî dawî jî Kılıçdaroğlu serdana HDPê kiribû û ligel Hevseroka HDPê Serpîl Kemalbay, Sırrı Süreyya Önder û endama Lîjneya Rêvebirî ya Nevendê Fatma Kurtulan civiyabû. Hevdîtin li odeya Selahattin Demirtaş ku ji 4ê Mijdara 2016an ve di girtîgehê de ye pêk hat. Di hevdîtinan de mijarên sereke girtin, desteserkirin, qayûm bûn. Her du serok piştî hevdîtinê civîna çapemeniyê lidarxistin û bal kişandin ser demokrasiyê. Piştî hevdîtinê HDPyiyan destnîşan kir kû ev hevdîtin bo ‘Eniya Demokrasiyê’ ye ne ‘Eniya Na’yê ye û em ê ji bo hevgirtina aliyên demokrat herdem alîkar bin. HDP her wiha dibêje ji dêvla ‘Tekitî’ divê ‘Yekîtî’ derkeve pêş. Hat zanîn ku serokê CHPê Kemal Kılıçdaroğlu jî vê pêşniyarê erênî dibîne. HDP di derheqê ‘Eniya Na’ de helwesta xwe nîşan dikir. Lê heta niha nêrîna CHPê di derheqê ‘Eniya Demokrasiyê’ de nayê zanîn. Her wiha Kılıçdaroğlu di hevdîtinê de diyar dike ku bo serdana parlementerên di girtîgehê de ne dê heyetek destnîşan bike û eger derfet çêbibin ew bi xwe jî dê serdana parlementeran bike.

Parlementerê HDPê yê Mûşê Ahmet Yildirim û Parlementerê CHPê yê Stenbolê Mehmet Bekaroğlu di derheqê serdana Kılıçdaroğlu, ‘Eniya Na’ de ji Heftenameya Basê re axivîn.



Serokê Giştî yê CHPê Kemal Kılıçdaroğlu, heftiya din di çarçoveya serdana partiyên di referandûma 16ê Nîsanê de gotine ‘Na’ de serî li HDPê jî da.

**“Ev ne mijareke ku li ser dengan hesap bên kirin e”**

Parlementerê HDPê Ahmet Yildirim destnîşan dike ku ji hevdîtin û serdanên partiyan re vekirîne û qedir didin van serdanan. Yildirim wiha didomîne: “ Me, Kılıçdaroğlu weke serokê ‘Eniya Na’yê pêşwazî nekir. Di encamê de gel li hember pergalê aciziya xwe nîşan da û di referandûma destûra bingehîn de ji du kesan yekî got ‘Na’. Kılıçdaroğlu, ji bo serokatiya bloka têra xwe kozmopolît bistîne hatibe serdana me, ez tu wateyê nadim vê serdanê.”

Herwiha Yıldırım diyardike ku ji ber ku tevlî van hevdîtinan nebûye nizane li pişt deriyên girtî çi hatiye axaftin û wiha didomîne: “Weke ku di nameya Hevserokê me Selahattin Demirtaş de jî xwiya dike em bo eniya demokrasî û aşitiya netewî xebatan dikin. Ev ne mijareke li gor dengan were şîrovekirin e. Eger bi vî awayî nêzîk bibin, di 16ê Nîsanê de peyama wan kesên ku gotin ‘Na’ nayê famkirin. Herwiha ez wisa bawer dikim ku orana wan kesên li vî welatî demokrasî, hizûr, xweşhalî û îstikrarê dixwazin ji nîvî zaftirin. Eger hin kes ji xwe re dibêjin ‘Na’ û xwe di nava sedî %49an de dikin hepsê dikarin wiha bidomînin. Lêbelê eger em weke eniya demokrasî û aşitiya netewî bibînin û li gor vê tevbigerin em ê bikaribin bi hêzeke mezin re bimeşin.”

**“Em bo avakirina eniya ‘Aşitî û demokrasiyê’ tevdigerin”**

Yildirim destnîşan dike ku xebata wan a ‘Eniya Demokrasiyê’ ne nûye û wiha pê de diçe: “ Em weke HDPê ev salek û nîve bo avakirina eniya demokrasî û aşitiyê bernameya ‘Eniya Demokrasiyê’ dimeşînin. Em dibêjin divê di vê blokê de hemû cudahiyên welat û ew kesên ji bo dahatûya vî welatî xwedî xem e cih bigr e. HDP tenê ne partiyeke siyasî, an jî xwebirêxistin nîne. Di hundirê wê de ji 10an zaftir partî û siyasiyên demokrat hene. Em di hişmendiya pêşxistina vê de ne jî. Ji ber ku li welat ji bilî HDPê jî kesên demokrasî û aşitiyê dixwazin hene.”

Yildirim herî dawî dibêje ku dê îadeyî serdana ji HDPê bo CHPê niha di bernameya wan de nîne.

**“Divê êdî em dev ji nayê berdin”**

Parlementerê CHPê yê Stenbolê Mehmet Bekaroğlu dibêje ev serdan rêzgirtina bo wan partiyên ku di referandûmê de gotine ‘Na’ ye. Em gavek din jî pêş de diçin. ‘Na’ argûmana demekê bû. Zêdekirina yên gotine ‘Na’, tahrîpkirina pergala dadî û tahrîpkirina dewletê, tahrîpbûyîna siyaseta demokratîk, di vê qada êdî ku mirov nikarin siyaseta demokratîk bikin de divê em vê yekê dîsa ava bikin. Ji bo vê yekê divê hemû partiyên siyasî û ligel parastina fikrên cuda zemîneke nû, siyaseteke hevpar, bernameyeke hevpar, xebateke hevpar bê kirin. Lêbelê di vê mijarê de hê jî gaveke berbiçav ne hatiye avêtin.

Bekaroğlu wisa didomîne: “Divê êdî em dev ji ‘Na’yê berdin. Êdî ne bi wateya dengekî erênî ye. Peyvên mîna blok, enî li dewletên weke Tirkiyeyê ku berberî bûne ji aliyê siyasî ehlaqî ve jî ne rast in. Ev, berberîbûnê dixe bîra mirov. Ji ber ku em li ser nav û sembolan diaxivin ev girîng e. Divê li ser vê mijarê em bixebitin.”

Kurdên dîasporayê bo referandûmê dixebitin

# Komeleyên Swêdê piştgiriya referandûmê dikin



NÛJÎN ONEN

Piştî ku roja referandûma serxwebûna Kurdistanê diyar bû ji her çar perçeyên Kurdistanê û Kurdên li dîasporayê dijîn piştgiriya xwe bo referandûmê eşkere kirin. Hin pêkhate, komele, komîteyên li derveyî welat ji bo ku piştgiriya cîhanê jî bistînin û çalakiyan ji bo referandûmê li dar bixin dest bi xebatan kirin. Federasyona Komeleyên Kurdistanê û Komeleya Nivîskarên Kurd yên li Swêdê jî piştgiriya xwe bo referandûmê diyar kirin û hewl didin ku li Swêdê ji bo piştgiriya referandûma serxwebûnê çalakiyan li dar bixin. Serokê Federasyona Komeleyên Kurdistanê yê Swêdê Keya Îzol û Serokê Komeleya Nivîskarên Kurd yê Swêdê Nezîr Akat ji Heftenameyê Basê re li ser çalakî û xebatên ku ji bo piştgiriya referandûma serxwebûna Kurdistanê li dar bixin axivîn.

**“Piştgiriyeke xurt heye ji bo Kurdistanê”**

Serokê Federasyona Komeleyên Kurdistanê yê li Swêdê Keya Îzol wiha dest bi axaftina xwe dike: “Kurdên dîaspora Swêd, Almanya, Îngîltere, Fransa dê karibin bernameyekê amade bikin ji bo ku piştgiriya vê pêvajoyê bikin. Dem bi dem me li vê derê hinek çalakî çêkirin, wek çalakiya roja Ala Kurdistanê. Ev biryara referandûmê dê tesîreke pir baş li ser Kurdên dîasporayê bike ji ber ku li derveyî welat piştgiriyeke gelek xurt heye, nemaze nifşên me yên ku li Ewropa mezin bûne ji bo wan jî mijareke pir enteresan e ew ê bikaribin xwe mobîlîze bikin. Em behsa welat an dewleteke nû dikin, miletekî 30-40 milyon nifûsa wê heye lê bêdewlet e, dewletbûn mafê me ye em dixwazin vê yekê careke din derxin rojevê. Gelek kêmasiyên Kurdên dîaspora hene di vî warî de, kêmasiya welat jî heye. Organîzasyoneke baş heta niha pêk nehatiye. Ji bo ku em piştgiriyê ji Swêd, Almanya û ji welatên din bistînin divê em xelkê baş agahdar bikin. Çima Kurd referandûmê pêk tînin? Çima Kurd nebûne xwedî dewlet? Heta niha ji ber bêdewletbûnê çi zirar gihêştiye Kurdan? Ji bo piştgiriyê divê diaspora û cîhan li ser van mijaran bê agahdarkirin. Ji bo lobî û dîasporaya Kurdî, Swêd cîhekî taybet e. Li Swêdê ji bo maf û azadiyên Kurdan piştgiriyeke gelek xurt heye. Rast, çep an jî navendî piranî piştgiriya mafê Kurdan dikin.”


**“Ji bo referandûma serxwebûnê em ê çalakiyan li dar bixin”**

Îzol derbarê çalakiyên ku dê ji bo referandûma serxwebûna Kurdistanê li Swêdê li dar bikevin wiha diaxive: “Em li ser lidarxistina çalakiyan bo piştgiriya referandûmê diaxivin. Li Swêdê 26-27ê Tebaxê bo 2 rojan me festîvalek plan kiribû. Beriya ku roja referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê diyar bibe, me dê rojên Kurdî yên çandî çêkira. Di heman demê de em ê 35 saliya federasyonê jî pîroz bikin, di vî warî de me hinek çalakî plan kiribûn. 2 rojan em ê li derve festîvaleke mezin li dar bixin, em dixwazin bi minasebeta vê referandûmê ew her du roj bi giranî ji bo piştgiriya referandûmê ji bo Kurdan û ji bo raya giştî ya Swêdê û partiyên siyasî yên Swêdê em dixwazin bangî wan jî bikin. Di panel û civînan de em dixwazin qala referandûmê bikin û bi vî awayî piştgiriyeke xurt bidin referandûmê. Eger ev çalakiyên me pêk neyên gelek çalakiyên alternatîf hene.”

**“Ji niha ve amadekarî tên kirin”**

Serokê Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê Nezîr Akat jî li ser referandûma serxwebûnê, peywîra Kurdên li Ewropa li hemberî vê proseyê û çalakiyên ku wê bên kirin wiha dibêje; “Referandûm pêngava meşrûkirina mafê neteweyî bi xwe ye û loma jî mafekî rewa û meşrû ye. Referandûm encama bi hezaran cangorîyên Kurdistanê ye. Neteweya Kurd bi pêkhatîyên xwe ve bi berdêlên mezin derfeta referandûmê ava kir. Di vê proseya hestiyar de pêwîstî bi hemahengîyeke sîyasî ya Kurdistanî û seferberiyekê heye” û li ser rola Kurdên dîasporayê di cihgirtina vê proseya referandûma serxwebûnê de wiha diaxive; “Girîng e ku Kurd li Ewropayê dengdanê baş organize bikin. Dezgehên Kurdan yên li Ewropayê helwestên xwe bi erênî diyar kirin. Ji niha ve amadekarîyên çalakîyên hevbeş û curbecur dikin. Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê dê konferans û semîneran li dar bixe. Nivîskar û balyozê berê yê Swêdî Îngmar Anderson dê beşdarî konferansê bibe ku 2 pirtûk li ser Kurdan nivîsandine. Di konferansê de ji bilî pirtûkan wê mijara lidarxistina referandûmê bê axaftin û gotûbêjkirin. Konferans dê 2ê Îlonê li Stockholmê pêk bê. Bêgûman di warê dîplomasîyê de dê rola Kurdên Ewropayê mezin be. Ronakbîrên Kurd li ewropayê pêwîst e wek balyoz an jî sefîrekî Kurdistanê helwest bigirin û ji bo piştgiriya referandûmê bixebitin. Ronakbîr û nivîskarên Kurd li Ewropayê û nemaze li Swêdê pêwîst e bi helwesteke neteweyî tev bigerin, Palpiştê referandûm û serxwebûna Kurdistanê bin. Di mijara serxwebûnê û mafê Kurdan yên neteweyî de bêalîbûn ne karê nivîskar û ronakbîrên Kurdan e. Em nikarin di vê mijarê de bêalî û bedeng bin.”





HOŞENG OSÊ

## Jan Dost û romana Kobanî

Bajarê Kobanî bi çekên atom û kîmyasal ne hate bombebarankirin lê ast, şêwe û radeya rûxandin û kavil kirina bajêr, ne kêmî bajarên di şerê cîhanê yê duyemîn de hatin rûxandin bû. Bi gotinek din; rast e Kobanî kete dîrokê, lê ji erdnîgariyê hate derxistin. Hema hema hemû kes behsa berxwedana Kobanî dikin, nemaze medya, ragihandin û nivîskarên bi ser PKKê-PYDê tên hesab kirin, lê ev camêr qet behsa ew zêdetirî 300 gundên derdora Kobanî, bê çawa PKK, PYD, YPG... û hwd di 48 saetan de berdan û ji “DAÎŞ” re hiştin, bi bihaneya ku dê di bajêr de şerê terorîstan bikin. Qet behs nakin. Ev camêr bi çi mijûl in? Bi sedema nivîsandina nivîskar û romanûs Jan Dost romaneke li ser Kobanî mijûl in û dibêjin çênabe binivîsîne û çima binivîsîne... û hwd bihaneya van camêran çiye ne çiye? Jan Dost “dijûnan” û “gotinên pîs” ji YPG – YPJê re gotiye. Jan Dost, ev tawanbarî derew derxist û belge li ser vê tawanbariyê xwestin. Lê bi rastî, çîrok ne ev e.

Çawa ji mafê Jan Dost e û ji mafê her kesiye li ser Kobanî, romanan binivîsînin, her wisa ji mafê nivîskarên derûdora PKKê PYDê ye, li ser asta têkst, tevin û hunera hûnandina romanê rawestin û rexne li romana Jan Dost bikin, lê tu carî nikarin mafê nivîsandina romanê li ser Kobanî ji Jan Dost bistînin. Ji ber ku çi nivîskar, ji kur dibe bere bibe, ji mafê wî/wê ye li ser Amed, Dêrsim, Botan, Hewlêr, Mahabad, Qamişlo, Kobanî û Efrînê... û hwd roman û çîrok binivîsîn e. Yawo, ji bo Xwedê, li kur çêbûye ku nivîskar ji nivîskarekî din xwestiye ku çênabe li vî bajarî yan wî bajarî binivîsîne! Daxwazeke wisa, bi serê xwe sosretek e.

Baş e, dema hûn mafê nivîsandina romanê li ser Kobanî ji Jan Dost distînin, ew romannivîsên “tirtire”, yan jî “zir-romannivîsên” derûdora PKKê PYDê hene, çima roman li ser Kobanî ne nivîsandin? Ev nivîskar, romannûsên “pehlewan” çima Kobanî û janên vî bajarî û berxwedana wî ne kirin roman? Yan tenê ev kes dikarin bakurê Kurdistanê û Kobanî... hwd li ser navê PKKê PYDê tapo bikin, qaşo Kurdistan milk û malê dê û bavê wan e.

Dibêjin mamoste Medenî Ferho di sala 2015an de, “Romana Kobanê” nivîsandiye. Mala wî hezar carî ava. Lê ji mafê her kesiye bipirs e: Gelo Ferho heta çi radeyê tax, kolan, malbat, êl û mirovên Kobanî nas dike? Û çend rojan li wir jiyaye?

Mixabin, Jan Dost jî diçe serê xwe bi van kesan têşîne û bersiva wan dide û li ser wan gotar dinivîsîne û wan bi “hesûdî, dexesî, zikreşî” tawanbar dike. Ne tenê wisa jî wan bi navê “Daîşê wêjeyê” bi nav dike. Ev jî ne rast e û ne baş e, ne ji Jan Dost re ne jî ji romana “Kobanî” re baş e. Çiqasî tawanbarkirina “Daîşê wêjeyê” mecazî be jî, qet çênabe Jan Dost jî bi mentiq û metodê apociyan nêzîkî “rexnegirên” xwe bibe.

Jan Dost, çiqas mirov ne digel nêrînên wî be, yan jî mirov bi wî re nakok be, lê di wejeya kurdî a nûjen de, navekî berz û nirxekî hêja û bilind e. Ji ber ku Jan kurê bajarê Kobanî ye, eger ew li ser kambaxî, wêranî, rûxandin û janên vî bajarî ne nivîsîne, dê kî binivîsîne? Lewma ji maf û erkên Jan Dost in ku roman binivîsîne. Ji ber ku bajarê Kobanî xist nav wêje û romana Kurdî, divê Jan Dost were xelat kirin, ne ku êrîş li ser wî û romana wî gur bibin.

Dibe ku hin “zigurt-migurtên” derdora PKK, PYDê bêjin: “Dema tu apocî bûyî, te jî êrîşî Jan Dost dikir, lê niha tu parastina wî dikî”. Jixwe ev mesele bûye benîştê devê van “zigurtan” û hema dicûn û dicûn, bera heta hetayê bicûn. Rast e, min rexneyên tûnd li Jan Dost kirine, wî jî bi wê tundiyê bersiva min daye, lê em li hev hatin û ew rûpel me qulapt û em li hev bûrîn. Ji vê zêdetir, kesekî ji me bavê yê din ne kuştiye. Lewma ez xwe mecbûr dibînin romana Kobanî û nivîskarê wê biparêzim û qampaniya li dijî Jan û romana wî, rexne û şermezar bikim, ji ber ku; îro êrîş li ser Jan Dost e, sibe dê li ser nivîskarekî/ê din be.

Di encamê de, biraderên me yên apocî, yan jî, yên nîv-apocî, xwiya dike ku ne ew li ser Kobanî roman dinivîsinin, ne jî dihêlin kesekî din ku rexne li PKK-PYDê dike, binivîsîn e. Wisa li van nivîskarên me yên apocî û nîv-apocî yên hatiye ku ne tenê hemû çalakî û festîvalên çandî û wêjeyî li bakurê Kurdistanê xistine bin kontrola xwe, di nav xwe de parve dikin, lê kîjan nivîskarên rexne li PKK-PYDê dike, berî biçe Tirkiye yan Kurdistana Bakur, divê “Vîze” ji wan bistîne. De îja werin vê sosretê temaş bikin.

# Serxwebûn hebûn e





NECAT ZIVINGÎ

Kurd, rêwiyên rêyeke dirêj in. Li aliyekî têra xwe hêzdar, tecrûbedar û têgihîştî ne. Li aliyê din westiyayî, birîndar û derengmayî ne. Lêbelê ji bo dewletbûnê mîna zarokekî 7 salî ne. Ber bi xortanî û ciwaniyê ve bilind dibin. Dewletên din, mîna kalên 70 salî ne, ber bi gorê ve dadikevin.

Ragihandina referandûma serxwebûnê li başûrê Kurdistanê ya 25/09/2017an, di nav hemû Kurdên cîhanê de bû sedema bextewarî û kelecanê. Her Kurdekî xwedî xîret û rûmet, ev biryar bi kêfxweşî pêşwazî kir.

Lewra serxwebûn hebûn e. Yê serbixwe be, bi nav û nîşanên xwe be, mezinê mala xwe be, heye û yê ne wisa be tune ye. Çawa ku Xaniyê nemir gotiye: “bêrewac û meşkûk” e; yanî kes berê xwe nadiyê û tim jê bi guman e.

Ger miletek ne serbixwe be, di nasnameyan de navê wî, di nexşeyan de nîşanên wî, di maseyan de kursiyên wî, di dar û dîrekan de alaya wî tune ye. Ji ber vê yekê serxwebûn hebûn e. Ehmedê Xanî 300 sal berê nivîsiye: “Ger dê hebûwa me padîşahek / Laiq bidiya Xwedê kulahek / Te’yîn bibûwa ji bo wî textek / Zahir vedibû ji bo me bextek / Hasil bibûwa ji bo wî tacek / Elbette dibû me jî rewacek”

Ger mîrektiyên Kurd û dewletên wek Mahabadê (1946) neyên hesibandin û dawiya dewleta Merwaniyan (983-1085) esas bê girtin heta niha 900 sal e; ger dawîlêhatina dewleta Eyûbiyan (1171 – 1252) esas bê girtin 800 sal e; ger ketina bin desthilata Osmaniyan (1514) esas bê girtin 500 sal e Kurd bê dewlet in. Lêbelê çawa ji bo her şevê rojek, ji bo her zivistanê biharek heye, her wiha ji bo her xewê jî şiyarbûnek heye. Ji lew Seîdê Kurdî wiha gaziya Kurdan kiriye: “Ey şêrekurdên di serdema cîhangîriya Asûrî û Keyaniyan de pêşdar, leşkerên qareman bûn! Xewa we ya pêncsed salî bes e! Êdî şiyar bibin, şeveq e.”

Cihû piştî 2000 salan, Ermenî piştî 1000 salî bûn xwedî dewlet. Ne dûr e ku Kurd jî piştî 500 salî li ser axa Kurdistanê bibin dewlet. Di vî warî de mînakeke herî balkêş jî, ji bo Kurdan têkoşîna Arnewûtan e. Di sala 1468an de ji aliyê Osmaniyan ve axa Arnewûtan hat dagirkirin. Piştî 500 salî, di sala 1910an de ji ber polîtîkayên merkeziyetê yên Osmaniyan, Arnewûtan serî hilda. Di sala 1912an de ji hikûmraniya Osmaniyan qetiyan û di sala 1925an de serxwebûna xwe ragihandin. Di wan salan de Seîdê Kurdî wiha bang li Kurdan dikir: “Ya ku ez dixwazim, parastina namûs û heysiyeta kurdîtiyê û di xizmeta meşrûtiyet û ‘edaletê de bûyîna mîna Arnewûtên egîd û qareman e.”

Di berhema Seîdê Kurdî (Bedîuzeman) ya bi navê “Reçeteya Kurdan/Munazerat”ê de (1911), Kurd ji Seîdê Kurdî dipirsin:“Ev hikûmet û Tirk çawa bin em rihet nakin, bilind nabin. Em serê xwe rakin, di ser wan re li ‘alemê temaşe bikin û destê xwe bi wan re dirêjî ava zelal bikin, nîşan bidin ku em jî miletek in, çawa ye?”

Di muqabilê vê pirsê de, Seîdê Kurdî şîreta xwedîderketina meşrûtiyetê (azadîxwazî, hakimiyeta milet) li Kurdan dike û wiha dibêje:“Stenbol gol e, hikûmet hewz e, Tirk kanî ye yan jî divê wisa be. Kanî bi me re ye yan jî divê bi me re be.” Di vê hevokê de eşkere ye ku Seîdê Kurdî ji bo xwebûn û serxwebûnê metafora “kanî”yê bi kar tîne. Lewra kanî ji xwe dizê û ne girêdayî ye. Seîdê Kurdî dibêje divê payîtexta Stenbolê bibe wek golekê û hewzekî, gel jî (Tirk, Kurd hwd) bibin mîna kaniyan, ne muhtac û mecbûrê wî paytextî bin. Lêbelê Seîdê Kurdî zanibû ku kurd hê nebûne kaniyek. Ji ber vê yekê şîreta wî ev bû: “Gelî Kurdan! Ez dibînim ku di me de kanî tune ye. Ji ber vê yekê em ava ji dûr tê ya genî vedixwin. Nexwe xîret bikin, bixebitin. Ji bo teqwiyekirina meşrûtiyeta ku sebebê bextewariya me ye, fikra miliyetê bikin kolîner, me’rîfet û fezîletê bidin destê wê. Li van deran boriyeke avê deynin; ta ku kaniyeke kemalatê di me de jî derkeve. Yan na hûn dê tim bibin parsek, yan jî ji tîna bimirin… Ger mirov bibe parsek bila ji xwe re bibe.”

Sed sal e Kurd, bi awayekî berfireh bi xwe hesiyane û ji bo ji parsekiyê (bindestiyê) xelas bibin û kaniya ava heyatê ji xwe re çêkin hewl didin. Di encama vê hewl û têkoşînê de kurdan hebûna xwe parast û ber bi serkeftinê ve hatin.

Kurd, rêwiyên rêyeke dirêj in. Li aliyekî têra xwe hêzdar, tecrûbedar û têgihîştî ne. Li aliyê din westiyayî, birîndar û derengmayî ne. Lêbelê ji bo dewletbûnê mîna zarokekî 7 salî ne. Ber bi xortanî û ciwaniyê ve bilind dibin. Dewletên din, mîna kalên 70 salî ne, ber bi gorê ve dadikevin.

Serxwebûn xewna Ehmedê Xanî; hêza Nehrî, Berzencî, Barzanî; xebata Seyid Evdilqadir, Xalid Begê Cibirî, Seîdê Pîran, Seîdê Kurdî, Îhsan Nûrî, Qazî Mihemed, Mistefa Barzanî û bi hezaran têkoşer û pêşmergeyan e. Ji lew ev ne doz û daxwaza hizbek, partiyek an serokekî ye. Doz û daxwaza miletekî bixwe ye.

Li hember vê doz û daxwazê wek muxateb du alî hene: aliyê yekem gelê Kurd, tevgerên Kurdan û ‘tevgerên ji Kurdan pêk tên’ bi xwe ne. Aliyê duyem dewlet û gelên din in.

Ji bo yên aliyê yekem ferz e ku bi her awayî piştgiriya vê pêvajoyê bikin û ji bo serxwebûnê bixebitin. Pêwîst e gelê Kurd û tevgerên Kurdan bi dinyayê bidin zanîn ku Kurdistan ne welatekî qedîm bi tenê ye. Di heman demê de Kurdistan navê miletekî zindî û zîrek e ku li çar aliyên cîhanê belav bûye, şax vedaye. Ji lew ji dijberiya Kurdistanê tu kes xêrê nabîne.

Divê helwest û daxuyaniya hemû hêz û partiyên Kurdan ev be: “Ji bo piştgiriyê bi her awayî em amade ne.” Ne ku bêjin: “Ji vê pêvajoyê re em rêzdar in (bê alî ne)”. Di te’yînkirina qederê Kurdan de, heqê Kurdan ê bêalîbûnê tune ye û şermeke mezin e. Tu kes di avakirina mala xwe de bê alî namîne.

Divê partî û tevgerên Kurdan û ‘yên ji Kurdan pêk tên’ bi qasî tu demê nebûne, di vê mijarê de zelal bin. Lewra ji bo gelê kurd, mijara serxwebûnê mijareke bûn û nebûnê ye. Yên bi gotinên gilover piştgiriyê nedin, di ujdanê Kurdan de dê bên mehkûmkirin.

Aliyê duyem; yanî dewlet û gelên herêmê, ger alîkarî û piştgiriyê nedin jî divê rêzdar bin. Divê bizanin ku li rojhilata navîn, halê berê muhal e. Yan halekî nû, yan hilweşan e. Ev rewşeke diyar e. Karwanê xwebûn û serxwebûnê ji rêya xwe nabe û teqez wê bigihîje serfiraziyê.

Em bawer in ger Kurdistan ava bibe, wê ji bo rojhilata navîn, hemû misilmanan û cudahiyan bibe temînata aşîtî, aramî û pêkvejiyanê. Hebûna Kurdan di herêmê de wê bibe balans û dawiyê li şerê germ ê ciyawazî, neteweyî û mezhebî bîne. Kurd, di coxrafyaya misilman de dê bibin rêya sêyem û rê li ber tundî û fundamantalîzmê bigirin.

Vaye berbangê ji Hewlêra qedîm lê daye û her ku diçe roja serxwebûna Kurdistanê bilind dibe. Bêguman ev roj wê şewqa xwe bigihîne çar aliyên Kurdistanê û hemû cîhanê li xwe bifericîne û biheyirîne… Stêrka Kurdan dibiriqe, roja me hiltê.

Nivîskar – Parêzer

Dewletên desthilatdarê axa Kurdistanê, ji ciyê ku ji ber cirm û cinayetên sed salî, xwe bi Kurdan bidin ‘efûkirin, rola ‘xwediyê mustekbîr’ dilîzin û xwe malik, Kurdan jî memlûk dibînin. Lê ev îluzyonek e û her wê bitefe.

Ger Kurd siyaseteke erênî bimeşînin, ji dijberiya 2-3 dewletên faşîst ên herêmê tu tişt dernakeve. Kurd bi hêsanî dê karibin hevalbend û hevpeymanên herêmî û cîhanî bibînin û dibînin jî.

Doz û daxwaza Kurdan ne dijberî, dijminî, perçiqandin û bindestkirina yên din e. Tenê serdestbûna li ser axa xwe, avakirin û mezinatiya mala xwe ye. Ji ber vê yekê tu sebeb ji bo tirsê û dijberiyê tune.

HELÎM YÛSIV

## Gavek ber bi xewna mezin ve referandûma Başûrê Kurdistanê



Bizava Kurdan ya ber bi serxwebûna welatê wan ve bizaveke kevn e. Eger em hewildanên şoreş û serhildanên berê, komara Kurdistan li Mehabadê jî di nav de, deynin aliyekî û behsa van pêncî salên derbasbûyî tenê bikin, em li Bakur û Başûr rastî du bizavên sereke tên. Giringtirîn tevgera Kurdan li Başûr doza otonomiya başurê Kurdistanê dikir. Herwisa li Bakur doza serxwebûna Kurdistana mezin hate holê. Bi derbasbûna demê re û di encama pêşveçûnên herêmî û cîhanî de, li seranserê Kurdistanê sê nimûneyên berbiçav yên birêvebirina desthilatdariya siyasî li ser lingan man. Nimûneyê partiya demukrat a Kurdistanê, nimûneyê Yekîtî Niştimanî Kurdistan ku heta bidawîhatina sedsala derbasbûyî xwedî pirojeyê otonomiya başûrê Kurdistanê bûn. Nimûneyê sêyem yê Partiya Karkerên Kurdistanê ye ku heta berî çend salên dawiyê yên sedsala derbasbûyî xwedî pirojeyê serxwebûna Kurdistanê bi her çar perçeyên xwe ve bû.

Di van bîst salên dawiyê de hêdî hêdî rol hatin guhertin. Nimûneyê yekem serdestiya xwe li ser Hewlêr û Duhokê bicihkir, nimûneyê duyem li ser Silêmaniyê û vê dawiyê Kerkûkê, wisa jî nimûneyê sêyem desthilatdariya xwe rasterast li Rojava û bi awayekî ne rasterast be jî, li Bakur jî bicihkiriye. Di encama berfirehkirina desthilatdariya her nimûneyekî de, nimûneyê sêyem li kêlekê ma û îro ro reqabet, nakokî û şer û pevçûnên desthilatdariyê di navbera herdu nimûneyên din de heta vê kêlîka ku ev nivîs tê nivîsandin carinan bi tundî û carinan sergirtî berdewam dikin. Gava em bi vî awayê zelal behsa sê nimûneyan û dûre jî du nimûneyan dikin, ev nayê wê wateyê ku nimûneyên din tune ne, lê mebest jê ew e ku ev nimûne xwedî bandoreke mezin û berfireh in di nav civaka Kurd de li her çar perçeyên Kurdistanê. Ji ber vê, di baweriya min de, qedera Kurd û Kurdistanê di asta jihevnêzîkbûn û jihevdûrbûna van herdu nimûneyan de tê destnîşankirin.

Her aliyek aliyê din bi ajantî û xiyanetê tawanbar dike. Her aliyek têkiliyan bi dijminê aliyê din re datîne. Her alî xwe weku xwediyê rasteqîn yê Kurdistanê dide nîşandan. Kîjan alî heta çi radeyê rast dibêje, mijara me ne ev e, lê rastiya ku -ji bilî mirîdên herdu aliyan- her kes dizane ew e, aliyek bêyî aliyê din wê nikaribe hemû Kurdan bigihîne qonaxa azadî û serxwebûnê. Di vê çarçovê de çûna xelkên Başûr a li ser sendoqên referandûmê ji bo serxwebûna Kurdistanê, di bîstûpêncê êlûna îsal de, gaveke pir giring e, di çûna ber bi pêkanîna xewna dîrokî ya hemû Kurdan ve, ku ew jî serxwebûn e. Tevî ku ev referandûm tenê yê perçeyekî, lê ne ya hemû Kurdistanê ye. Wisa jî bikaranîna mafê referandûmê nayê wê wateyê ku wê roja din başûrê Kurdistan serbixwe bibe.

Tevî van hemû gelemşeyan biryara pêkanîna referandûmê bixwe tirseke mezin xiste dilê dijminên stratejîk yên Kurdan ku bi taybetî di helwesta Turkiyê û Îranê de bi gewde bû. Wisa jî bi awayekî rasterast nimûneyê sêyem ku reqîbê nimûneyê xwediyê referandûmê bi xwe ye û li Rojava pê re di nav şer û pevçûnên desthilatdariyê de ye, bi awayekî zelal û bi hemû baskên xwe ve li Bakur û Rojava destek da pêkanîna referandûmê. Ev pêşveçûn rastiyeke zelal tîne holê ku ew jî ev e, hevalbend û dostê stratejîk yê tevgera başûrê Kurdistanê ku me ew weku nimûneyê yekem binav kiribû ne Turkiye û ne jî Îran e, lêbelê tevgera Bakur û rojavayê Kurdistanê ye, ku me ew weku nimûneyê sêyem binavkiribû.

Eger ji roja referandûmê û pê ve herdu nimûne, li ser bingeha girtina berjewendiyên neteweyî di ser berjewendiyên desthilatdariya rêxistinî û hizbî re bigirin, wê karibin Kurd û Kurdistanê bigihînin qonaxa azadî û serxwebûnê. Eger ji vê dersê jî destvala derkevin, wê dîsa me vegerînin şer û pevçûnên li ser berfirehkirina desthilatdariyên xwe yên hizbî û wê serxwebûna Kurdistanê ji berê dûrtir bibe û bimîne xewn. Ji lew re, ez neçar im ku vê nivîsa xwe bi hêviyê bi dawî bikim.

Bi hêviya ku referandûma başûrê Kurdistanê bibe destpêka lihevkirina hemû hêzên Kurdan yên sereke û ji qonaxa jihevdûrketin û derîlihevgirtinê derbasî qonaxa birina Kurdan ber bi xewna mezin ve, ber bi serxwebûna Kurdistanê ve.



# Dengê serxwebûnê, rengê neyaran nîşan dide





ESKENDER CEIFERÎ

Refrandûma serxwebûna Kurdistanê roja 25 Îlona 2017an wê bê encamdan. Piştî ku ew biryar derket, dengên nerazîbûnê jî derketin holê.

Îran her tim radigihîne ku serxwebûna Kurdistanê, aramiya navçeyê têk dibe.

Saziyên ragihandinê yên Îranê jî ku rasterast ji aliyê Elî Xamineyê rêberê Komara Îslamî ve têne çavdêrîkirin, piştî ragihandina roja refrandûmê, li dijî vê biryarê tev digerin. Ajansa Mêhr ku girêdayî saziya Propagendeyên Îslamî li Îranê ye, di raporteke xwe de serxwebûna Kurdistanê dinirxîne û dibêje eger Kurdistan serbixwe bibe, wê Dewleta Îslamî DAÎŞ xurt bibe. Ew raport, çalakiyên partiyên Kurdî yên Rojhilatê Kurdistanê jî dişibîne kiryarên DAÎŞê û teqez dike ku divê dewletên Îran, Iraq, Tirkiye û Sûriyê rê nedin dewleta Kurdî ava bibe. Di berdewamiya raportê de hatiye ku Îsraîl û Amerîka dixwazin ji bo bêbandorkirina eniya Îran û Rûsiyê, nexşeya navçeya Rojhilata Navîn biguherînin. Tevî ku dewleta Amerîkayê bi fermî ragihandiye ku ji birêvebirina refrandûma serxwebûna Kurdistanê nîgeran in, lê Ajansa Mêhr dide xuyakirin ku Amerîka, Erebistan û Îsraîl li pişta Kurdan e.



Dihate pêşbînîkirin ku dengên nerazîbûnê di nav partiyên Başûrê Kurdistanê de hebin. Tevgera Goran û hin aliyên biçûk yên Îslamî li Başûrê Kurdistanê dibêjin xelk mûçeyan dixwaze û hîn dema serxwebûnê nehatiye.

Tevî ku qet nehatibû pêşbînîkirin ku Partiya Karkerên Kurdistanê PKK di vê derbarê de pişta Mesûd Barzanî serokê Herêma Kurdistanê bigire lê Cemîl Bayik hevserokê Konseya Rêveber a KCK ragihand ku refrandûm li Herêma Kurdistanê mafekî demokratîk e û divê kes li hemberî wî mafî dernekeve û referandûm encama rewşa tengav a li hundir û derve ye. Lê pêkanîna refrandûmê di nava giloka pirsgirêkên civakî de, wê serketinê bi xwe re neyine lê nabe ku ti alî û ti kes li dijî wê bisekinin.

Receb Teyyîb Erdogan serokomarê Tirkiyê û serokê giştî yê AK Partiyê jî di derbarê refrandûma serxwebûna Kurdistanê de got, vê weke gaveke şaş dibînin û dixwazin rêveberiya Herêma Kurdistanê bi Bexdayê bişêwire. Erdogan bêyî ku navê Kurdistanê bîne ziman got, gavên ji bo serxwebûna Iraqa Bakur, ziyanê digihînin yekîtiya axa Iraqê û vê bi metirsî dibîne. Erdogan got, me her tim yek parçeyiya axa Iraqê xwestiye lê carinan hinek tişt ji kontrolê derketine û bi vê jî em dilgiran bûne.

Altan Tan parlamenterê Partiya Demokrat a Gelan HDP jî di axaftina xwe ya ji bo refrandûma serxwebûna Kurdistanê de got di Kurdistana serbixwe de divê Kurd, Turkmen û Ereb di nava aştî û aramiyê de bijîn û daxwaza avakirina dewletê, mafê bingehîn yê Kurdan e. Ji ber vê jî pêwîst e xelkê Herêma Kurdistanê bi rêbazên aştiyane dewleteke serbixwe ava bike. HDP got, nabe Enqere Tehran û Bexda li hemberî damezrandina dewleta Kurdî derkevin.

Aliyên Rojavayê Kurdistanê û Rojhilat jî piştevaniya xwe ji bo avakirina dewleta Kurdî nîşan dan û anîn ziman ku her tişta ku ji bo parastina axa Kurdistanê û viyana Kurdan pêwîst be, ewê encam bide.

Îsraîl jî dewletek e ku çendîn caran ragihandiye ku ew piştgiriyê didin serxwebûna Kurdan. Piştî ku sala 2016an êdî DAÎŞ zêdetir ber bi jinavçûnê ve çû û hevpeymaniya navdewletî hewlên xwe ji bo jinavbirina wê xurttir kirin, Moşe Yaalon wezîrê Berevaniyê yê Îsraîlê eşkere kir ku ji bo aramî û asayîşa navçeyê, ew piştgiriya her biryarekê dikin ku xelkê Kurdistanê bide. Eger biryar, biryara serxwebûnê be jî.

Bernard Kouchner wezîrê Derve yê berê yê Fransayê û dostê Kurdan ragihand, dem hatiye ku sînorên vê navçeyê bêne guhertin û êdî pêwîst e serxwebûna Kurdistanê bê ragihandin.

Piştî ku Serok Barzanî bi fermî ferman da Komîsyona Hilbijartin û Rapirsiyan, komîsyonê ragihand ku zêdetirî 2.5 milyon kes li deverên Kurdistanî yên li derveyî Herêma Kurdistanê dikarin roja referandûma serxwebûna Kurdistanê deng bidin û li ser formên dengdanê ji bilî zimanê Kurdî, zimanên Tirkmenî, Aşûrî û Erebî jî tê nivîsandin.

# PKK li Rojhilatê Kurdistanê çi dixwaze?

Partiya Karkerên Kurdistanê PKK'ê, Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê PJAK, di sala 2004'an de li Rojhilatê Kurdistanê ava kir û wê partiyê, di sala 2004'an de kongreya xwe ya yekem pêk anî. Çalakvanên Kurd jî wê demê ragihandin ku sedema avakirina PJAK'ê, amadenebûna hêzên Rojhilatê Kurdistanê li navxwe ye û dixwaze ji wan re bibe alternatîv.

Hevserokên niha yên PJAK'ê ku piştî Ebdulrehman Hecîehmedî bûne kesên yekem yên wê partiyê, Siyamend Muînî û Zîlan Wejîn in. PJAK di Kongreya xwe ya yekem de xwe weke rêkxistinekê ku rêbaza Şarwêraniya Demokratîk ji xwe re weke bingeh dibîne, plana xwe darişt. Piştî zêdetirî salek û nîvan di kongreya duyem de Sîstema Konfedralîzma Demokratîk ji xwe re kire bingeh.

PJAK'ê jî, sala 2014'an Komalgeha Demokratîk û Azad a Rojhilatê Kurdistanê KODAR ava kir û ragihand ku eger Komara Îslamî mafê xwerevêberiyê bi fermî nas bike û amade be ku zagonê xwe ya bingehîn biguhere, KODAR jî amade ye ku pê re danûstandinê bike.

Di hilbijartinên sala 2017'an ya Îranê de jî PJAK angu KODAR'ê ku weke PKK'ya Rojhilatê Kurdistanê tê binaavkirin, ji Komara Îslamî xwast da ku rê li ber azadiyê xweş bike da ku ew jî hilbijartinan baykot nekin û beşdarî proseya siyasî bibin. Lê Komara Îslamî ti bersivek neda û PJAK'ê jî ragihand ku ji bo hilbijartinên civatên gund û bajaran, xelk serbest e ku dengên xwe bikar bîne yan na.

Heya niha ti partiyeke Rojhilatê Kurdistanê, PJAK'ê weke partiyeke Rojhilat nas nake. Ew partî dibêjin ji bo ku em fermiyetê bidin PJAK'ê, divê ew rêbaza xwe ji PKK'ê cuda bike. Lê PJAK rijd e ku ew partiyeke Rojhilatê Kurdistanê ye.



Di nava heftiya derbasbûyî de, kovarek ji aliyê PJAK'ê ve derket ku zêde girîngiyê dide demokratîzekirina Îranê û qet behsa federaliyê jî nake. Navê kovarê Azerbaycan – Kurdistan e. Kovar zêdetir giraniyê dide ser bakurê Rojhilatê Kurdistanê ku akinciyên wê Kurd û Azerî ne. Tişta balkêş ku rexnegirên PJAK'ê tînin ziman, ev e ku çima divê partiyeke Kurdan di kovara xwevde qet gotarekê bi Kurdî nenivîse lê nivîsan bi ziman Azerî li çapê bide.

Heya berî sala 2011'an, hêzên PJAK'ê li navçeyên cuda êrîşî ser hêzên sersînor yên Komara Îslamî dikirin. Di şer û pevçûnan de bi dehan endamên Sipaya Pasdaran û hêzên ewlehî yên Îranê hatin kuştin û bi dehan gerîla jî şehîd bûn. Lê ji sala 2011'an ve, wê partiyê agirbes ragihand. Ji wê demê ve heya niha gelek guhertin bi ser siyasetên wê partiyê de hatine û niha ew partî dibêje eger Îran hewla demokratîzekirinê bide, emê li wî welatî beşdarî proseya siyasî bibin.



# Heftiyek mafên mirovan li Rojhilatê Kurdistanê

Sipaya Pasdaran û wezareta Îtlaata Îranê piştî teqîn û bûyerên li Tehranê, bi dehan welatiyên Kurd binçav kirin. Du jinên Kurd li Sineyê yek jî li bajarê Riwansera Kirmaşanê bi tohmeta endamtî di rêxistinên Îslamî yên Selefî de ji aliyê hêzên Îranê ve hatin girtin.



Îtlaata Îranê bi belavkirina nûçeya binçavkirina nêzîkî 50 kesî li parêzgehên Urmiye, Sine, Kirmaşan û her wisa li Tehranê ragihandiye ku tometa wan endambûna rêxistina DAÎŞê û grubên wehabî û selefî ye.

Piştî deh salan rê nayê dayîn Mihemedemîn Agoşî girtiyê siyasî yê Kurd ku di girtîgeha bajarê Tewrêzê de ye, bi danîna kefaletê here serdana malata xwe. Agoşî ku xelkê bajarê Pîranşarê ye, heya niha çendîn caran bi dirûtina lêvên xwe ketiye nava gireva birçîbûnê. Wî ragihandiye ku eger rê neyê dayîn serdana malbata xwe bike, ewê car din bikeve gireva birçîbûnê. Mihemedemîn Agoşî havîna sala 2007an bi tometa sîxurî ji bo hikûmeta Herêma Kurdistanê hatiye girtin.

Mihemed Nezerî girtiyê siyasî ku nîvê temenê xwe di girtîgehê de derbas kiriye, heya niha nekariye serdana malbata xwe bike û car din piştî 25 salan girtinê, daxwaza wî ya serdana malbatê hate redkirin. Ew girtî ku 46 sal temenê wî ye, ev 25 sal in ku di girtîgehên Urmiye û Recayîşehra Kerecê de derbas dike.

Li sînorê navçeya Çomanê ya bi ser Bane ve, hêzên ewlehî agir berdane daristanan û jîngevan jî hewl didin agir vemirînin lê ew kes ji aliyê hêzên ewlehiya Îranê ve rastî êrîşa gulleyan hatin. Di vê bûyerê de pênc hektar erd û daristanên vê navçeyê ji nav çûne. Piştî bûyerê jî pênc çalakvanên Baneyî dixwastin li dadgeha serbazî ya Seqizê li hemberî hêzên sersînor, dozê vekin lê bixwe rastî gefan hatin û dadgehê giliya wan tomar nekir.

Li nêzîkî sînorê Bêtûşê yê di navbera Rojhilat û Başûrê Kurdistanê de, kolberekî Kurd ji aliyê hêzên Îranê ve hat kuştin. Navê kolberê ku di encama wê êrîşê de hatiye kuştin, Sîrwan Xanexelî û xelkê bajarê Serdeştê ye.

Piştî nêzîkî mehekê, hîn li Şinoyê sê welatiyên Kurd ên bi navên Emîr Pêyxamî, Farûq Şarwêranî û Taha Xurşîdî girtî ne û malbatên wan nekarîne ti zanyariyan di derbarê cihê ragirtina wan de bi dest bixînin. Ew sê kes bi tometa endamtî di partiyên Kurdî de hatine girtin.



Endazyarê Kurd Pûya Salihî ku salekê beriya niha li Bokanê hatibû binçavkirin, heya niha ji mafê destnîşankirina parêzer bêpar e. Sedemên girtina wî, çalakiyên siyasî ne.

Li girtîgeha Recayî Şehr, ji seyîd Cemal Mûsewî re hate ragihandin ku eger ji bo nasandina çalakvanên olî alîkariya hêzên îstixbarata Îranê neke, wê biryara darvekirina wî di demeke nêzîk de bê bicîkirin. Seyîd Cemal Mûsewî bi tohmeta endametî di rêxistinên Selefî de bi darvekirinê hatiye cezakirin.

Li girtîgeha Urmiyê ji Tehmîne Daniş re hatiye ragihandin ku wê di demeke nêzîk de bê darvekirin. Ew jina xelkê bajarê Nexedeyê, 12 salan beriya niha bi tohmeta kuştinê hate girtin.

Li bajarokê Bedre li parêzgeha Îlamê di êrîşeke çekdarî de 2 kes hatin kuştin û 2 jî birîndar bûn. Destpêkê, şer di navbera du xortan de çê bû û yek ji wan xortan bi fîşekan xortê din kuşt. Du kesên ku dixwastin navcîtiyê bikin jî rastî êrişa wî xortî hatin û her du jî birîndar bûn, piştî vê yekê xortê qatîl fîşekek jî li xwe da û xwe kuşt. Rewşa birîndaran baş nîne lewma tirsa wê heye hejmara kuştiyan zêde bibe.

Li bajarê Îlamê, saziya dewletê ya Jîngehê 80 karkerên Kurd bêyî ku pereyên wan yên 16 mehan bide wan, ew ji kar dûr xistine. Ji wan karkeran re pereyên bîme jî nehatine dayîn û li gora zanyariyên ku Navenda Demokrasî û Mafên Mirovên Kurdistanê belav kiriye, heya niha beşeke zêde ji wan karkeran bêkar in û ti saziyeke dewketê jî bersiva daxwaziyên wan nade.

Hozan Cezmî:

# Dengbêjî helbesteke birîndar e

DILDAR KURDISTANÎ

“Ji we re qala dengbêjên xwe bikim.

Belê, dengbêj. Dengbêjên min, dengê dengbêjên min, kelam û ziman.

Van tiştan ji we re vebêjim. Dengbêj, ew kes e ku nefes û jiyanê dide deng.

Dengbêj, deng dide kelam, kelamê dike kilam û stran.

Dengbêj vegotin û vebêj e.

Weke dengbêjê yekem yê edebiyata nivîskî Homeros.

Dengbêj; vegotin e, gotinê neqşî hiş dike û zindî, çist dihêle. Hetta hişmendî bi xwe ye.” dibêje di derheqê dengbêjiyê de nivîskarê gewre Mehmet Uzun. Me jî wek Heftenameya Basê bi Hozan Cezmî re ku ev 30 sal e stranên Kurdî distire qala dengbêjiyê kir. Hozan Cezmî bersiva pirsên me yên ‘Dengbêjî çi ye, cihê wê di nav Kurdan û Cîhanê de çi ye, em ê çawa dengbêjiyê bixin nav standartên mûzîka cîhanê dide.



Di cîhanê de du gel hene ku êş û azarên xwe baş tînin ziman. Yek Kurd in ên din jî Reşik in. Reşik, muzîka Bluesê dikin Kurd jî bo bilêvkirina êşên xwe bi dengbêjiyê dikin. Eger dengbêj nebûna me yê nikaribûya çîroka xwe ya êş ku ev 200 sal e didome bigihanda îro. Dengbêjî bingeha muzîka Kurdî ye.

**“Dengbêjî feylesofî ye”**

Dengbêjî bo min çi ye, gelo tê îfadekirin? Beriya demekê ligel hevalekî xwe yê akademîsyen me sohbetek kir. Hevalê min pirsa ‘Di dengbêjî de lê lê lo lo çi ye’ kiribû. Dema em lê dinêrin di hemû şer, eşq û êşên ku tarîfa wê ne mimkin e de peyv bê wate dimînin wê demê pevgotinên lê lê lo lo derdikevin holê û van êş û azaran terîf dike. Dengbêj van pevgotinên lê lê lo lo bo gihandina êş û azarên xwe bigihîne hemû cîhanê bikar tîne. Ji ber ku yên bi Kurdî nizanibin jî vê êşê bi wan pevgotinan hîs dikin. Pevgotinên lê lê û lo lo yên ku lirîzmê herî baş îfade dikin e. Mînak, ez nû fêr bûm ku muzîka Bluesê di wateya vegotina êşan de bikartînin. Jixwe di cîhanê de du gel hene ku êş û azarên xwe baş tînin ziman. Yek Kurd in ên din jî Reşik in. Reşik, muzîka Bluesê dikin Kurd jî bo bilêvkirina êşên xwe dengbêjiyê dikin. Ez dengbêjiyê hunerek, felsefeyek, senfoniyeke jinantî û hetta temamkerê gerdûnê dihesibînim. Dengbêj di heman demê de aforîzmayan diafirîne.

Hozan Cezmî dengbêjiyê dişibîne feylesofiyê û wiha didomîne. Dengbêj dema xweza û mirovan vedibêje dengê xwe zaf bilind dike. Di dema dengbilindkirinê de dengekî pir dilsoj dertê, ez ji wî dengî re dibêjim ‘Dengê kerr’. Dengbêjî dengekî kerr e. Xwediyê îmgeyeke pir kûr e. Dengbêjî helbesteke birîndar e. Ji dengbêjiyê re tê gotin ku dîroka vegotinê ye lê li gor min ev danasîn gelekî kêm e. Dengbêj deng û azara çiya û sotina qulingê jî bilêv dike.

**“Dengbêj, Mozartê Kurd e”**

Hozan Cezmî, dengbêjan wek Mozartên, Bachên Kurd dinirxîne û wiha didomîne: “Li gor min ti cudahî di navbera dengbêj û Mozart de tune ye. Mozart bi wan destên xwe yên efsûnî pê li piyano dike û dengên asimanî derdixe. Bi wan tûşan êş û azara gerdûnê bilêv dike. Dengbêj jî têlên dengê xwe bikartîne û weke Mozart, Bethooven senfoniyan diafirîne. Hemû dengan bi dengê xwe bêyî amûr tenê bi dengê xwe yê tazî derdixe. Dengbêj ew kesê herî serkeftî ye ku bêyî amûr, bêyî beste xwezayê, hestan û êşan tenê bi dengê xwe tesnîf dike. Ev yek tenê ji aliyê dengbêjan ve tê kirin.

Herî dawî Hozan Cezmî bo me daxwaza xwe vedibêje û dibêje ku: “ Li gor min divê Kurd xwedî li dengbêjiyê derkevin û bigihînin enstrûmanan. Eger veberhênan li ser dengbêjiyê bê kirin li hemû cîhanê dê ev sedsal bibe sedsala dengbêjiyê. Ka bifikirin ku em strana ‘Hekîmo’ bi orkestraya senfonî re dibêjin.”

Hozan Cezmî bersiva pirsa, çima hûn dengbêjiyê tenê li ser êş û azaran terîf dikin wiha dide: “Dengbêj vegotina çîroka kiryar û êş azaran dike. Li nav Kurdan muzîk li ser du esasan ava bûye. Eşq û Şer. Mebesta şer ne tenê şerê di navbera du welat an jî eşîran de ye. Şerê du lehengan jî dibe mijara dengbêjan. Evîndariya di navbera du kesan de jî dibe mijara dengbêjan. Kurdan, Kurdistan her tim şibandiye jineke bedew û nazik û narîn. Ji ber ku Kurd ji Kurdistana( Jina) xwe dûr dikevin û nagihîjin evîndara xwe tim êş û azar dikşînin. Ji ber vî yekî jî stranên dengbêjan tim bi êş û azar e. Ji xwe eşq bi xwe jî bi êş. Bigihîjin hev negihîjin hev jî bi êş e. Weke çîroka Xecê û Siyabend e. Eşq, piştî ketina Siyabendo ew tişt e ku Xecê jî xwe ji kendal davêje ye.

Hozan Cezmî ji me re çîroka ‘Çavê evîndariyê kor e’ vedibêje. Du ciwanên ji hev hezdikirin hebûn. Xort her roj bo dîtina yara xwe, xwe li çem dixe û derbasî aliyê din dibe. Vî karî heft salan her dike û diçe hember yara xwe. Di hembêza wê de 5 demjimêr be jî raweste û bêhna wê bike. Piştî ewçend salan xort deqa li ser ruyê yara xwe dibîne ji evîndara xwe re dibêje ‘Di rûçikên te de deq heye’. Dîsa jî weke her şevî li cem hev dema xwe derbas dikin û bi hebûna hev şad dibin. Dema xort xatirê xwe dixwaze û ber bi çem ve diçe keçik jê re dibêje, ‘Dildarê min nekeve wê avê ji ber ku tu avjeniyê nizanî.’ Xort dengê dildara xwe nabe xwe û xwe davêje nav ava çemê bi xurexur. Çend demjimêrên din xort bi lehiyê ve diçe û li ber xwe dide nade dixeniqe.



# “Ne ehlê siyasetê ye; şair û dengbêj e Seyad”



MURAT ÖZDEMİR

Veysel Çamlıbel li ser pirtûka xwe ya bi navê ‘Qulingê Birîndar’ ku jiyana helbestvan û dengbêj Seyadê Şamê ya bi kul û keser vedibêje, ji Heftenameya Basê re axivî.

**“Em zû li nasnameya xwe xwedî derketin”**

Veysel Çamlıbel di derbarê sedemên vegotina jiyana malbata ‘Kekê’ de wiha dibêje: “Her wek dîroka gelan; dîroka malbatan, ya însanan jî heye. Li ser serê malbata Şameyên Kekê tiştên nebaş qewimîn. Em jixwe hayîdar bûn, ji bo vê yekê jî em zû xwedî li nasnameya xwe derketin. “Însan li gundên xwe nabin pêxember” gelekî gilî û gotineke giranbûha ye. Li ber çavên dewletê malbateke sirgûn, malbateke bêetibar e. Lê em kî bûn, malbateke çawa bûn? Xwenasîn, xwebûn, xwebawerî, xweparastin çareseriya jiyanê bû. Jiyanhezî, gelhezî, welatheziyê meşeke dijwar da pêşiya malbatê... Nivîsa li ser jiyanê, li ser jiyana malbata Kekê bi wan sedeman pejirî....”



“Li ber çavên dewletê malbatekê sirgûn, malbateke bêetibar e. Lê em kî bûn, malbateke çawa bûn? Xwenasîn, xwebûn, xwebawerî û xweparastin çareseriya jiyanê bû. Jiyanhezî, gelhezî, welatheziyê meşeke dijwar da pêşiya malbatê...”

**“Jêhatî ye lê qedera wî, feleka wî xayîn e”**

Çamlıbel cihê Seyad a di doza netewî ya Kurdistanê de wiha pênase dike: “Seyad nixuriya malbata me ye. Wekî ceniyekî tor ê bêfesal e. Ne gem qebûl dike ne jî zîn. Bi xwendina fermî ya Tirkî jî ne qayil e, xwendinê berdide. Seyad, jixwe bi mezinan re heval û hogir e. Wekî her zarokekî serwext meraqdarê serpêhatiyan, meftunê dengbêjiyê ye. Wekî din Seyad di zaroktiya xwe de ehlê dîlan û reqsê ye, deng û seda wî jî gelekî xweş e. Seyad, ehlê kêf û şahiyê ye. Şerek bi cîhanê ketiye, 1941 Ûris li Îranê ye. Bi hezaran Kurdên şer ên Agiriyê li Îranê star bûne, gelekî ji wan şervanan dev ji doza xwe bernedane. Komele, pey re PDK Îran ber bi avabûnê ve diçe... Xela ye, li her aliyên hidût alozî... Qaçaxçîtî û siyaset bi hevûdu re dimeşe, li ber hevûdu dibeze.

Wan deman Seyad 16–17 salî ye. Rêya Seyad bi ticaretê, bi çûn û hatina Îranê, çarûneçar digihîje siyasetê. Seyad her li xwe dihese ku xwe di nava deryayeke mezin de dibîne. Seyad li gorî temenê xwe însanekî ji xwe hayîdar e, jêhatî ye, lê qedera wî / feleka wî xayîn e.. Barekî giran û nebuyî li ser milan e, de hûn bêjin, çi ji dest tê?”

**“Li gorî wan diviyabû malbatên wekî me bihatana sirgûnkirin”**

Sedema sirguniya malbata Kekê jî wiha vedibêje Çamlibel: “Komara Tirkiyeyê 1923yan bi hukmê zorê tê avakirin. Rewş û meşa cîhanê ji bo wê gelekî musaîd e. Bi taybetî Serheda Kurdistanê di nav zilm û zordariyê de ye. Dewlet xwe ji siya xwe diparêzin, mezelê hevûdu dikolin. Hidudê Îranê seranser alûver/danûstandin qedexe ye, çûn û hatin cesusî ye, qayîntî ye... Mesela 33 camêrên Kurd jî wan deman diqewime. Li ser mesela Seyad em malbat pê de sucdar in, li gorî wan lazim e ku malbata me û yên wekî me bên sirgûnkirin. Kurtasî mesela sirguniya malbata me jî wek malbatên din bi wî şeklî diqewime.”

“Sirgûn û sirgûnî... pir bar, xem û kedereke giran e”

Veysel Çamlıbel serpêhatiyên jiyana sirgûniyê wiha vedibêje: “Sirgûn û sirgûnî... Pir bar, xem û kedereke giran e... Sirgûniya malbata me di 1943an de qewimî. Em li Çorumê, navçeya wê Alacayê bûn. 5 sal beriya me sirgûnên Dersimê jî li wê derê bûn. Em di zemanekî kin de bûn bav û birayê hevûdu. Me nan û ava xwe, derd û kesera sirgûniyê, hêviya pêşerojê bi hevûdu re parve kir. Em Kurd bûn, em bi xwe, bi nasnameya xwe hesiyan... Di 1945an de Hîtler cehimîbû, kîrîvaniya Nazîzm û Pantûrkîzmê qediyabû, bayekî hênik ji rojava dihat, rejima Tirkiyê di bin wî bayî de mabû.

Demokrasî digotin lê ev ne demokrasî bû, vir û derew bû. Em sirgûn, em Kurd, li pey efûya 1947an zivirîn welat. Av zivirî ser mêrg û zeviyan. Wek çawa ku bireke berx û karan berdidin nava hev... Hesreteke, keyf û şahiyekê wisa pêk hat...”

**“Feleka wî xayîn, qedera wî reş e”**

Nivîskar û lêkolîner Çamlıbel cihê Seyad a di doza netewî de wiha pênase dike: “Çawa tê gotin; a ku hatiye serê Seyad, nehatiye serê gurê çiyan... Ji 16–17 saliya xwe û şûn de, di riyeke dijwar de meşiyaye. Heya 70 saliya xwe hesreta welat kişandiye. Hesreta dê û bav, ya xwîşk û bîra, ya heval û hogiran...Îlam jî hesreta Zûlfînaz a jina xwe. Feleka wî xayîn, qedera wî reş e. Bi gotina wî bêjim, “di nav derd û kûlan de dil lê bûye pola” 196an bi alîkariya Radyoya Rewanê dengê xwe gîhandiye welat, derd û kûlên xwe gihandiye Serheda Kurdistanê...

Ne ehlê siyasetê ye; şair û dengbêj e Seyad. Ehlê deng, seda û reqsê ye. Ehlê çand û hunerê ye. Her rêzika helbestên wî, ritm û galegala wî xaliçeya Serheda Kudistanê ye ku bi bendên hewrişimî hatiye hûnan, bi heft rengên delal hatiye neqişandin.”



FIRAT CEWERÎ

## Ez

Di civateke polîtîze de, gava mirov bi awayekî aktîf ne di nav siyasetê de be, gelek caran dikare çewt were fêhmkirin. Min hertim gotiye û ez dîsa dibêjim; ez bi salên xwe ên pir ciwan ketim nav siyasetê û pir zû jê derketim.

Me di siyasetê de hem xebatên pratîk dikirin, hem jî ên teorîk. Me belavok belav dikirin, li ser dîwaran slogan dinivîsandin û li gund û bajaran propogandaya siyasî dikir. Ji aliyê din ve jî, me pir kitêb dixwendin. Ji bilî kitêbên siyasî ên ku me bi xwe dixwendin, me hin kitêb jî bi dorê dixwendin û me bi komî li ser sohbet û minaqeşe dikir. Em xort bûn, bi zimanê xelkê, em telebe bûn. Me ê xelk şiyar bikira û bi pêşengiya çîna karker şoreşek li dar bixista. Me di hundirê du-sê salan de bi têra 10-15 salan kitêb xwendin. Xwendina kitêban hem baweriya me xurttir dikir, hem jî em bi rêxistinên din re dihatin hemberî hev û diketin minaqeşeyên kûr. Em wek avê li felsefe û diyalektîkê diçûn û di rengê aliman de diketin analîza îdeolojiyan. Em bi xwe bawer bûn, me gotinên qelew dikirin û em ji emrê xwe mezintir dipeyivîn.

Me di wan salan de li bajarê xwe komeleyek vekiribû û ez wek serokê komelê hatibûm hilbijartin. Êdî gotina dawî li ba min diqediya. Lê ez bi nexweşiya nivîskariyê jî ketibûm. Digel kitêbên siyasî, min zor dabû xwendina kitêbên edebî jî. Min bi tirkî dixwend û bi kurdî dinivîsand. Min ji xwe re defterek peyda kiribû û ew deftera xwe tije gotinên qedexe kiribû. Cihê veşartina wê deftera min jî paxila rebena diya min bû. Gava eskeran ji xafil de digirtin ser malê, an jî ser taxê, min hema ew defterka xwe divirvirand ser diya xwe û wê jî tavilê radihiştê û ew di paxila xwe de vedişart…

Gava dengê teperepa postalên eskeran hat û me hê jî şoreş li dar nexistibû, ez êdî ketim gumanan. Temenê min gihiştibû 18an, lê min digot belkî ez 80 salî me. Ez rojekê bi hevalên xwe, ên ku çend salan ji min mezintir bûn û ji min hinekî xwendetir bûn re ketim minaqeşeya dîktatoriya proleteryayê. Min nerazîbûna xwe ya li dijî dîktatoriya proleteryayê anî zimên û ez li dijî desthilatdariya yekpartîtiyê derketim. Fikreke weha hingî nedihat qebûlkirin. Hingî sîstema Sovyetê hebû, li gora bawermendên Sovyetê, Sovyet ji sosyalîzmê ber bi civaka komunîzmê ve ketibû rê. Em hemû bi awayekî mirîd bûn. Hin ên Sovyetê, hin ên Çînê, hin jî ên Arnawidê bûn. Yanî hin Stalînîst, hin Maoîst, hin jî alîgirên Enwer Xoce bûn. Lê ez li xwe vegeriyabûm. Ez ketibûm cîhana edebiyatê û bi girîngiya zimanê kurdî hesiyabûm. Min şev û roj li xwe kiribûn yek û ha ha dinivîsand. Gava ez têgihiştim ku ewrekî reş dike bi ser welêt de bigire, ez li riyên derketina derveyî welêt geriyam. Min di gulana 1980î de terka welêt kir û di îlona 1980î de jî cûntaya leşkerî bi xezeb hat ser hukum.

Ez hê jî xort bûm. Gava ez niha li wan rojan û li wî temenî difikirim, ez karim pir bi hêsanî bibêjim ku ez xortik bûm. Hê rih û simbêlên min baş derneketibûn. Lê dilê min ji bo avakirin û geşkirina ziman û edebiyata me çargopal lêdixist. Ji wê rojê de, yanî ji sala 1980î û bi vir de ez neketime nav tu partî û rêkxistinên siyasî. Min siyaseta partîtiyê nekiriye, lê min tu carî li dijî tu partî û rêxistineke kurdan nenivîsandiye. Ez hertim li gel diyalogê bûme û bêyî ku ez ferqeke îdeolojîk têxim navbera partî û rêxistinên kurdan, di warê kulturî û edebî de deriyê min heta dawiyê ji hemûyan re vekirî bûye. Ez beşdarî televizyon û radyoyên hemû beşên welêt û ên hemû partî û rêxistinên kurdan bûme û min ne fikrên wan, lê hertim fikrên xwe gotine. Min bi fikrên xwe, xwe nespartiye şelafiyê û tu carî nexwestiye tovê neyartiyê di navbera partiyên kurdan de bireşînim, berevajiyê wê, min hertim doza dostanî û xebata bi hev re kiriye. Herweha ez li televizyon û çapemeniya tirkan jî bûme mêvan û li wir jî min hertim fikrên xwe gotine û di çavîkên televizyonên wan de min berê xwe daye desthilatdariya wan û li dijî zilma wan rabûme. Ez li hemû tiştên ku min heta niha nivîsandine û di çavîkên televizyonan de gotine xwedî derdikevim. Ez ji ber xebat û kirinên xwe piştrast im. Navekî min hebe min bi xwe bi dest xistiye. Ên ku bi şelafiyê tên cihekî dikarin bi pehînekê ji wî cihî werin bidûrxistin. Baweriya mirov bi mirov hebe divê mirov kevirê giran be. Ên ku xwe sivik dikin, çavên xwe digirin û devên xwe vedikin û êrîşî vir û wir dikin, piştî demekê poşman dibin.

Ez bi xwe ji polemîkan hez nakim, polemîkan qet nakim. Bersivên rexne û êrîşan jî nadim. Her sal jî, wek soza sersalê, ên ku neyartiya min kirine û ez êşandime, ez wan efû dikim.

Lê ez kurdên ku li dijî serxwebûna Kurdistanê derdikevin efû bikim jî wê dîrok wan efû neke…

### Hikûmeta Kurdistanê dest bi hevdîtinên dîplomatîk kir:

# Dewletên YE referandûmê çawa dinirxînin?






DERYA KILIÇ

PIŞTÎ Hikûmeta Herêma Kurdistanê pêkanîna referandûma serxwebûnê di 25ê Îlonê de ragihand, ev yek bû mijara rojeva cîhanê. Daxûyaniyên pey hev hatin dayîn. Li aliyê din jî Hikûmeta Kurdistanê dest bi hevdîtinên dîplomatîk kir. Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî di nava vî heftiyî de pêşwazî li gelek konsol û nûnerên welatan kir. Cîgirê Serokwezîrê Kurdistanê Qubad Talebanî û heyeta li gel wî jî li Hollanda û Belçîkayê dest bi hevdîtinên dîplomatîk kirin. Herwiha li Herêma Kurdistanê jî amadekariyên referandûmê dest pê kirin. Ev amadekarî û çalakî dê li welatên ku nûnertiya Kurdistanê lê heye jî di demeke nêzîk de dest pê bikin.

Nûnerê Hikûmeta Herêma Kurdistanê li Fransyê Dr. Elî Dolamarî, Nûnerê Swêdê Shorash Qadir Rehîmî û Nûnerê Awusturya Dr. Mistefa Rama di derheqê nêrînên welatên lê ne di derheqê referandûmê de ji Heftenameya Basê re axivîn.



**"Em dixwazin Swêd jî weke çavdêr beşdarî referandûmê bibe"**

Nûnerê Hikûmeta Herêma Kurdistanê yê li Swêdê Shoresh Qadir Rehîmî bi 'referandûm mafekî rewa û yasayî ye' dest bi nirxandina xwe dike û wiha didomîne: "Referandûm li gel Yekîtiya Ewropayê weke mafekî hatiye nasîn û kanûnî ye jî. Mafê her gelî heye ku dahatûya xwe diyar bike. Li hemû welatan referandûm pêk tên. Tenê ne ji bo serxwebûnê tê kirin. Di her mijarî de pêk tê. Dewlet, daxwaza gel dipirse. Mînak li Swêdê di salên 1960an de referandûm pêk hat. Herwiha li Katalonya, Bask, Skoçya, Sirbistan û Kosova jî referandûma serxwebûnê pêk hat. Li Kosovayê gel ji serxwebûnê re got 'Erê' û pejirand."

Rehîmî di derheqê referandûma Kurdistanê, serxwebûn û nêrînên welatên YEyê de wiha axivî: " Dê piştî referandûmê diyar bibe ku Swêd û welatên YEyê dê îlankirina serxwebûnê bipejirînin an nepejirînin. Niha tu dewlet biryara piştgirî an li hember derketinê diyar nake. Dibe piştgirî nede. Ev karê dîplomasiyê ye û li pêşiya me proseyeke dûvdirêj heye. Em weke nûnerên Hikûmeta Kurdistanê berpirsyariyên me yên dîplomatîk, çandî û tîcarî hene. Di vê çarçoveyê de em bi wezîr û parlementoya Swêdê re hevdîtinan dikin. Iraq, Hikûmeta Kurdistanê îhmal dike. Ev proseyeke ku gelê Kurd, Parlementoya Kurdistanê û Hikûmeta Kurdistanê bi hevre biryar didin. Heta niha tu agahî negihiştiye me ku dê Kurdistaniyên derveyî welat deng bidin an nedin. Hîç guman nîne ku em tev dixwazin Kurdistan serbixwe bibe û referandûmeke demokratîk pêk bê. Em dixwazin Swêd jî roja referandûmê bibe çavdêr."

**"Heta niha Awusturya referandûm nenirxandiye"**

Nûnerê Hikûmeta Herêma Kurdistanê yê li Awusturyayê Dr. Mistefa Ramazan diyar dike ku heta niha ji Awusturyayê tu daxûyanî nehatiye dayîn û wiha didomîne: "Heta niha ji Hikûmeta Awusturyayê tu daxûyanî nehatiye dayîn. Biryara referandûmê nû hat dayîn. Piştî vê biryarê me hevdîtin pêk neaniye û em neaxivîne. Em weke nûnerên Hikûmeta Kurdistanê me tu bername amade nekiriye. Lê ji niha û pê de bo referandûmê xebat û çalakiyên me dê çêbibin."

Fransayê heta niha tiştekî erênî an jî neyînî negotiye. Em jî vê yekê erênî dinirxînin. Daxûyaniyeke fermî nehatibe dayîn jî Fransa her tim rêz li Kurdan girtiye. Bawer nakim bi hikûmeta nû re nêrîna wan biguhere. Ji ber ku Macron di hikûmeta berê de rawijkarê Hollanda bû. Li Fransayê di warê siyasî de tiştek neguherî. Heman siyaset heye."



## "Fransa her tim rêzê dide Kurdan û dostê wan e"

Nûnerê Hikûmeta Herêma Kurdistanê li Fransayê Dr. Elî Dolamarî, balê dikişîne ser ku heta hikûmet ava nebe nêrîna Fransayê diyar nabe û heta niha jî hilbijartinên parlamentoyê didomin. Dolmarî dibêje: "piştî hilbijartin bi dawî bên dê hikûmet ava bibe. Wê demê dê helwesta Fransayê di derheqê Kurdistanê de diyar bibe." Dolamarî destnîşan dike ku Serokkomar Emmanuel Macron heta niha di derheqê serxwebûna Kurdistanê de tiştek negotiye û wiha didomîne: "Macron heta niha tiştekî erênî an jî neyînî negotiye. Em jî vê yekê erênî dinirxînin. Daxûyaniyeke fermî nehatibe dayîn jî Fransa hertim rêz li Kurdan girtiye. Bawer nakim ku bi hikûmeta nû re nêrîna wan biguhere. Ji ber ku Macron di hikûmeta berê de rawijkarê Hollanda bû. Li Fransayê di warê siyasî de tiştek neguherî. Heman siyaset heye." Dolamarî herwiha diyar dike ku heta 25ê Îlonê dê weke nûnerê Kurdistanê çalakî û festîvalan pêk bînin.

### Ji Hikûmeta Kurdistanê

# Komkûjiya Êzidiyan li Dîwana Dadî ya Laheyê ye

Endamê 'Komîsyona Bilind a Danasîna Jenosîda DAIŞê' û Şêwirmendê Mafê Mirovan ê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Kirmanc Osman li gel nûnerên saziyên sivîl û çend aktivîstan beşdarî Dozgeriya Navnetewî ya Cezayê li Serdozgeriya Dîwana Dadî ya Laheyê bû.

Yusuf Mihemed Sadiqê ku beşdarî civînê bûye dibêje: "Ji bo danasîna jenosîda li hemberî Tirkmen, Kirîstiyan û Şebekan hatiye kirin tişta ji destê me bê em ê bikin. Me bo êrişên DAIŞê yên bi plankirî ku li ser kêmneteweyan hatine kirin bo ku weke 'Jenosîd' bê naskirin serî li Dozgeriya Navneteweyî ya Cezayê da ye. Serlêdana me hat pesend kirin. Di rojên pêşiya me de dê vekolîn bên kirin"

Herwiha Hikûmeta Herêma Kurdistanê çend belgeyên sucên ku DAIŞê kiribûn di 24ê Mijdara 2014an de radestî Dîwana Dadî ya Laheyê kiribû.

Li aliyê din, heyeteke girêdayî Komîseriya Bilind a Mafê Mirovan a Neteweyên Yekbûyî di ziyareta xwe ya bo Iraqê de, piştî bi sedan belgeyan vedikolîne ji Konseya Ewlekarî ya NY daxwaza şandina dosyaya sucên DAIŞê bo Dozgeriya Navneteweyî ya Laheyê kiribû.

**Kirmanc Osman:**
**Divê kiryarên DAIŞê weke jenosîd bên pejirandin**

Endamê 'Komîsyona Bilind a Danasîna



Şêwirmendê Mafê Mirovan ê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Kirmanc Osman: 'ger em dewleteke xweser bûna me dikaribû rasterast li Dozgeriya Navnetewî ya Cezayê doz vekira û aqûbeta vê dozê bi xwe bişopanda.'

Jenosîda DAIŞê' û Şêwirmendê Mafê Mirovan ê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Kirmanc Osman hevdîtin û axaftinên di civînê de ji Heftenameya Basê re nirxand. Osman destnîşan dike ku 30-35 pisporên ji civata navneteweyî beşdarî civînan bûne û wiha pê de diçe: "Di civînê de mijarên jenosîdê, sûcên şer û sûcên li dijî mirovahiyê hatin rojevê. Di Dîwana Lahey û Dozgeriya Navneteweyî ya Cezayê de li ser êrîşan û terzên êrîşan hat axivîn. Civîn bi mijarên cuda tên lidarxistin. Komeleyek bi taybetî êrîşên DAIŞê nîqaş dike û dinirxîne. Bi taybetî jî daxwaza 'bila kiryarên DAIŞê yên li dijî Êzidiyan ji aliyê Dozgeriya Navneteweyî ya Cezayê(DNC) ve weke 'Jenosîdê' bê naskirin' tê kirin. Li gorî min kiryarên DAIŞê li dijî mirovahiyê ne û divê weke 'Jenosîdê' bên pejirandin."

**"Em tekane beşdarên Kurd li konferansê ne"**

Herwiha Osman diyar dike ku: "Em tekane nûnerên Kurdan e ku beşdarî vê civînê bûne. Erebên Iraqê jî tune, ji ber ku Iraqê Rêkeftina Satûya Romayê îmze nekir. Eger hûn ne xwediyê vê statûyê bin hûn nikarin beşdarî civîn û dîwanê bibin. Dema Kurdistan serbixwe bû vê rêkeftinê îmze bike dê rasterast beşdarî dîwanê bibe. Em jî bo serlêdana 'Jenosîda li hember Êzidiyan' beşdarî vê civînê bûn. Heşda Şabî û Îran û Îraq jî di vê çarçoveyê de ketin rojevê. Ligel êrîşên DAIŞê dê kiryarên Heşda Şabî jî bên lêkolînkirin. Osman dibêje: "Min êrîş û rewşa mexdûran vegot. Min got ku divê komîsyonên navnetewî biçin van lêkolînan li cihên ku êrîş hatine kirin bikin."

**Sexwebûn ji bo vê dozê girîng e**

Osman beşdarbûna van civînan bo serxwebûna Kurdistanê jî wiha bilêv dike: "Dema Kurdistan serxwebûna xwe stand, Statûya Romayê jî îmze kir û li DNCê aktîf bû em ê hêsantir beşdarî dîwanê bibin û bo Êzidiyan hêsantir bixebitin, hetta em ê bo dozê dosya vekin. Bi vî awayî beşdariya me sînokirî ye. Em nikarin dozan bişopînin û xwe bigihînin belgeyan."

Osman destnîşan dike ku gelek belge di destê wan de hene ku jenosîd li Êzidiyan hatiye kirin û wiha didomîne: "Li vir hin kes û serokên siyasî weke jenosîdê lê binêrin jî heta dadwer nebêje ev 'Jenosîd e' kiryarên ku li serê Êzidiyan hatiye kirin nabe jenosîd."



## Çi bibû?
## Hikûmeta Kurdistanê serî li DNCê dabû

Parlementoya Herêma Kurdistanê bo danasîna êrîşên DAIŞê di sala 2014an de li herêmê serî li DNCê dabû. Di parlementoyê de wê demê parlementerên jin û nûnerên saziyên sivîl û civîneke taybet de bo jinên ji aliyê DAIŞê ve hatibûn revandin civiyabûn.

Heyeta ku îro Kurdan li Laheyê temsîl dike di sala 2014an de hatibû damezirandin. Ev heyet bo naskirina jenosîdê di şerê li dijî DAIŞ de kiryarên DAIŞê di şer de li ser navê Hikûmeta Herêma Kurdistanê xebatan dike.

Dîwana Dadî ya Laheyê îsal di 13-15ê Hezîranê de bi beşdariya 30 pisborên navnetewî yê dadî civiya û parêzeran belgeyên di derheqê kiryarên DAIŞê ku jenosîd li Êzidiyan kirine radestî dîwanê kirin. Dîwana Dadî ya Laheyê jî di civîna xwe de, li ser mînakên sûcên komkûjiyê ên mîna Ruanda, Yugoslavya, Lîbya û Kamboçyayê sekinî.

Endamê 'Komîsyona Bilind a Danasîna Jenosîda DAIŞê' û Şêwirmendê Mafê Mirovan ê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Kirmanc Osman li gel nûnerên saziyên sivîl û çend aktivîstan beşdarî Dozgeriya Navnetewî ya Cezayê li Serdozgeriya Dîwana Dadî ya Laheyê bû.

Li aliyê din Qubad Talebanî û heyeta Kurdistanî ya ligel wî dê serlêdana Belçîka û Hollandayê bike. Heyeta Kurdistanî dê serî li parlamentoya Hollanda, Wezareta Derve, Wezareta Aborî û Dozgeriya Navnetewî ya Laheyê jî bide.

Hosteyê betaniyên Sêrtê yê 20 salan Nurettin Çetin:

# Hosteyên betaniyan qefle li deriyên xwe dixin





GÖNÜL GÜN



Di çanda civakî de, bi keda destan gelek kar û pîşê hene ku ji bo civakê bûne mîrat. Hinek ji van gêhiştine heta roja me û hinek jê jî li ber wendabûnê ne. Yek ji wan karên ku bi keda destan tê kirîn jî çêkirina betaniyan e. Li Sêrtê bi salan e bi keda destan ji tîftikê betanî têne çêkirin û ne tenê betanî gelek cure tişt tên çêkirin. Lêbelê hosteyên vî karî bi gilî û gazinc in û dibêjin di deh salên dawîn de ji ber ku nikarin bi vî karî mîna berê debara xwe bikin an hinek hosteyan îflas kirine an jî bi awayekî zehmet vî karî berdewam dikin. Nurettin Çetin hosteyê betaniyan ê ku ev 20 sal e vî karî dike, ji Heftenameya Basê re li ser çêkirina betaniyên Sertê û derbarê rewşa vî karî de axivî.

Nurettin Çetin ji Erebên Sêrtê ye û dibêje dema ku 9 salî bûye dest bi vî karî kiriye û ev pîşe ji bavê xwe hîn bûye. Çetin destnîşan dike ku ji bo çêkirina betaniyên Sêrtê ked û hunerek hewce ye. Çetin bo çêkirina betaniyên Sêrtê yên resen dibêje ji bo betaniyek bi qalîte divê melzemeyên resen bêne bikaranîn û hosteyên xwedî tecrûbe pêwîst in û wiha qala çêkirina betaniyên Sêrtê dike, "Betaniyên Sêrtê ji tîftikê tên çêkirin û li gorî hewcedariyê têne dûrîn. Paşê betanî têne şuştin û neqşkirin û herî dawî betanî têne zuhakirin. Piştî zuhabûnê êdî betanî amade ye."

> Li Sêrtê bi salan e di dezgehên darîn de betanî têne çêkirin. Hosteyên betaniyên Sêrtê dibêjin di van deh salên dawîn de, ji ber ku tu kes van betaniyan nastîne û hoste jî heqê xwe baş nagirin ev kar mîna berê eleqa nabîne.

**"Betaniyên Sêrtê yên resen ji tîftika biqelîte tên çêkirin"**

Çetin amaje dike ji bo ku betaniyên resen bên çêkirin, divê bi destan bên çêkirin û wiha axaftina xwe didomîne, "Betaniyên resen ji tîftika bi qelîte tên çêkirin. Tîftika resen jî bi tenê ji pirça bizinan tê bi destxistin û tiştekî din nayê bikaranîn. Ya din jî betaniyên Sertê yên resen li ser dezgehên darîn têne çêkirin. Ev dezgeh ji ber ku darê gûzê qayîm e ji gûzê tê çêkirin. Dar piştî ku ji firinê derket gelek qayîm dibe."

Çetin diyar dike ku berê bi temamî betaniyên Sêrtê bi keda destan û di tezgahên darîn de dihatin çêkirin lêbelê niha zêdetir di  makineyên hesin yên li febrîqayan de têne çêkirin. Hosteyê 20 salan radigihîne ku betaniyên Sêrtê yên destan ji ber melzeme û ji ber keda xwe ya destan,  bihayê we ji betaniyên Sêrtê yên ku li fabrîkayan têne çekirin, cudatir e. Çetin diyar dike betaniyên Sêrtê yê destan 'yê bo du kesan' 500 lîre ye û her wiha betaniya 'bo kesekî' jî 250 lîre ye.  Li gorî Çetin betaniyên Sertê yên bi destan tên çêkirin baş têne çêkirin û giran in û ji van bêhneke xwezayî tê, lê yên febrîqeyan baş nayên çêkirin û sivik in û ji van bêhna makîneyan tê.

**"Betaniyên febrîqeyan mîna yên destan ne rind in"**

Hosteyê bîst salan wiha behsa çêkirina betaniyên Sêrtê yên febrîqeyan dike, "Betaniyên ku di febrîqeyan de têne çêkirin ji tîftikên resen nayên çêkirin. Tîftikê ku dişibe elyafê tê bikaranîn. Ji vî melzemeyî betaniyên bi qelîte, nayên çêkirin. Her wisa dema ku baş nayên çêkirin jî betanî zû kevn dibin."  Çetin eşkere dike ku du mirov, bi destan betaniyekê du rojan de çêdikin. Lêbelê yên di feqriyan de jî bi tenê di şeş saetan de tên çêkirin û xilas dibin. Çetin dibêje ev ne tiştekî asayî ye, ji ber ku betaniyên bi destan ewqas zû neyên çêkirin. Li febrîqeyan her çiqas di rojekê de ji yekî zêdetir betanî were çêkirin jî wekî betaniyên destan ne bi qelîte û ne jî rind in.

### "Hoste wek berê nikarin debara xwe li ser vî karî bikin"

Çetin rave dike ku berê gelek hoste û xebatkaran debara xwe û ya malbata xwe bi vî karî dikirin lê belê niha rewşa vî karî gelek xirab e û wiha didomîne; "Hoste, ji vî karî wekî berê nikarin pere bidestbixin. Berê hosteyek hema sicadeyek jî bi desta çêbikira, debara xwe pê dikir. Êdî tu kes betanî û tiştên din ên ku bi destan têne çêkirin nastînin. Heta muşteriyên me betaniyên di destê xwe de jî bo firotîne tînin ba me. Bo kedkarên vî karî alîkarî û piştgirî jî nehat dayîn û hê jî nayê dayîn. Hosteyên betaniyên Sêrtê kilît li deriyên xwe dixin."

"Betanî berê dihatin îxraçkirin"

Çetin bal dikişîne û dibêje di ser de jî betaniyên Sêrtê yên di febrîqayan de têne çêkirin jî bandor li ser karê wan kiriye. Çetin destnîşan dike ku berê karê betaniyê baş bû bo derveyî welat îxracaat dihat kirin lê niha ji ber ku kar ne baş e û hoste heqê xwe baş nagirin û îxracata betaniyan jî nayê kirin. Çetin dibêje bo hosteyên heyî ku tevî vê rewşa xirab karê xwe berdewam dikin divê piştgirî bê dayîn

"Kurd jî vî karî dikin"

Hosteyê betaniyê dibêje tîftik bi tenê ji pirça bizinan û bizinên wekî ji herêmên Sêrt, Şirnex, Enqere û Kastamonuyê tîftîk tê bi dest xistin û rengê betaniyên Sertê reş, spî, gewr, rengê qehweyî, rengê zêrîn û hwd e. Çetin dibêje tenê ne betanî heman demê ji tîftîk û di dezgehên darîn de; bo odeyên dergûş û zarokan cil, betanî, çente, êlek, cila erdê, sicade û qilfên quran jî têne çêkirin. Çetin dibêje betaniyên Sêrte piranî Ereb çêdikin lê ev salên dawî Kurd jî vî karî dikin.

# Li Bakurê Kurdistanê dema patozkirina nîskan e

DILDAR DÎROKÎ

Bi hatina meha Hezîranê re, cotkarên Kurdistanê dest bi dirîtin û patozkirina nîskan dikin. Bi taybetî jî cotkarên ku nîskan diçînin li benda debra nîskên xwe ne. Bi meha Hezîranê re cotkar dest bi berhevkirina çandiniya xwe ku di mehên 10-11an de çandibûn dikin. Gelek hunermend û cotkarên Kurd di dema ji hev veqetandina nîsk û kayê stran gotine û ev kar weke çandekê ketiye jiyana Kurdan. Bi taybetî jî cotkarên Herêma Botanê bi stran û hevkariyê karê xwe dikirin û niha jî ev çand li hin deveran didome. Cotkarên Kurdistanê li ser çandin, berhevkirin, dirîtin û patozkirina nîskan ji Heftenameya Basê re axivîn.

**"Patozkirin li gorî berê hêsan bûye"**

Cotkarê Batmanê Miheme Seîdê Sarîbê, bersiva pirsên 'Nîsk kengî tên çandin, berhevkirina wan çawa û kengî tê kirin' wiha dide; " Em di mehên 10 û 11an de erdê xwe cot dikin, paşê tapan dikin û bi mîmzerê nîskê xwe diçînin, di meha Sibatê de jî em dermanê giyayên xeribî lê dikin da ku nîskê me di berhevkirinê de paqij derkevin. Piştî dermankirinê em heta dawiya Gulanê û serê Hezîranê disekinin. Di dawiya gulanê de em bi makîneyan didirin. Bi qasî 8-10 rojan li ber tavê disekînînin. Piştî ku giyayê nîskê hişk dibe em dest bi patozê dikin. Berê patozkirin gelek zehmet bû lê niha li gor berê hêsan bûye. Dema me patoz dikir gelek zehmet bû, di serî de me bi melêba radihişt komên giyayên nîskan û davêt romoqan, piştî ku romoq tije dibû me vê carê dida ber makîneya patozê û bi melêban kesek li ser qirşê di romoqê de bû diavêt patozê. Ecacok û ba û bahoz toz û dûxana kayê tev bi ser me de dianî û ev yek gelek zehmet bû. Niha hinek hêsan be jî dîsa herî kêm 6-7 kes pê re mijûl dibin. Bi dirûtinê re 6-7 kes bi patozkirinê re jî ewçend kes mijûl dibin. Ev jî ji bo cotkaran kulfeteke giran e."

**"Biha, girêdayî analîza paqijbûna nîskan e"**

Miheme Seîd bersiva, 'Gelo debara cotkaran bi çandina nîskan dibe?' wiha dide; "Eger cotkarekî xwedî 100 donim erd be salane nêzî 25-30 hezar TL jê tê. Ji vî pereyî 10 hezar jî bo sala din tê terxankirin ku tov, çandinî û cot pê bê kirin û tenê 10-15 hezar ji cotkar re dimînin û ev jî têra debara malbatekê nake. Ev jî eger ew cotkar xwedî erd be û erd bi îcarê negirtibe, wisa ye. Lê belê ji ber zêdebûna îcara erdan îro cotkar nikarin debara xwe bi cotkariyê bikin. Mesela; îro sed donim erdê yekî hebe serê donimê 15 kîlo nîsk diçîne. Di sed donimî de jî tonek û 500 gram nîsk davêje erdê xwe. Bi debra baş be jî 10-12 tovî dibin. Em bêjin 10 tovî bibe jî 15 ton nîsk çêdibe. Jixwe nêzî 2 tonî dibe zikat ew ji debra mirov derdikeve. 1 û nîv jî avêtibû erd. Gubre û derman û karkerî û cotkariya wê jî dixî nav hesab ji yê xwediyê 100 donim erd re pereyekî pir hindik dimîne. Ji ber ku derman û zibil pir biha ye. Bihaya nîskan jî zêde ne baş e. Bihaya nîskan girêdayî analîza paqijbûna nîskan e. Eger nîskên me baş û paqij bin jî bihaya nîskê me herî zêde bi 2 lîra û 30 qirûşê Tirkiyeyê ne. Ev eger paqij be wisa ye. Eger ne paqij be jî di serê analîzekê de 25 qirûş biha kêm dibe di kîloyekî de."

> Cotkarên Kurd, dema komkirin û jihevveqetandina nîsk û kayê stran gotine û ev kar weke çandekê ketiye jiyana Kurdan. Bi taybetî jî cotkarên Herêma Botanê bi stran û hevkariyê karê xwe dikirin û niha jî ev çand li hin deveran didome.



### "Nîskên Bakurê Kurdistanê yên herî baş in"

Bihayê nîskan îsal çend sal e dewlet diyar nake. Li gor bazirganan e. Dewlet midaxaleyî nîskan nake. Alaf tê gotin ji bazirganên debra cotkariyê re. Ew alaf tên cem me û debra me ji me dikirin û dibin Dîlokê û bajarên Tirkiyeyê. Eger dewlet piştgirî bide cotkaran dê baştir bibe. Nîskên Bakurê Kurdistanê yê herî baş e di Tirkiyeyê de. Ji ber vê jî divê cotkarî û çandina nîskan bi piştgiriya dewletê bê kirin û xwedî li vî karî bê derketin.



# Qebîlaya Amîşî

**ELÎDA ZERRÎ**

Ma nîka çaxê feza de yê. Teknolojî bîyo cîfê ma. Eke teknolojî ra nêbo, ma mirenê, cuya ma vindena. Labelê yew qebîla esta ke teknolojî cuya înan de qet çin o; qebîlaya Amîşî (amîsh). Na qebîla Amerîka de ya. Nûfusê aye 170 hêzar o. Mensûbê na qebîla xirîstîyan ê. Hetê înan de bawerî zaf muhîm a. Labelê qebîlaya Amîşî qicanê/domananê xo vaftîz nêkena. Vanê; eke qicê ma bîy pîl o wext xo bi xo vaftîz bibê, bi îradeyê xo. Qebîlaya Amîşe verê cû Ewropa de bîye. Tarîxê înan zaf kehen o reseno hetanî serra 1600. Înan Ewropa de zaf zulm û tedayî dîyê. Coka uca ra remayê û DYA

Verê cû nameyê na qebîla Mennucu bî. Dima nameyê aye bî Amîş. Qebîlaya Amîşî zaf muhafazekar a. Mensubê aye vanê; Hz. Îsa ma rê klawuz o. Ey cuya xo de se kerdo ma zî ey kenê. Coka teknolojî ra dûrî vindenê. Elektrîk hetê înan de çîn o. Hîna raştîya ci nêxebitnenê. Keyeyane înan de mume esta.

Vanê "ma herb nêwazenê coka ma leşkerîyê nêkenê. Sîyaset zî nêkenê. Ma gureyanê dewlete ra dûrî vindenê. Citkarîye kenê" Her çîye înan tebîî yo. Makîne û werdê înan tebîî yê. Hema her çîyê înan sey wextanê kehenan o. Mesela înan de traktor çin o, xo rê cite xebitnenê.

Dinyaya înan de erebeyîş zî ca nêgênê. Faytonî estê. Bi faytonan şinê her ca. Qebîlaya Amîşî bac (vergi) nêdana. Cuya amîşijan de telefon zî çin o. Nêweşî zî zaf nênê dîyayenê. Çimkî ê qet îlacan nêşimenê, derzîn xo rê nêdanê. Na qebîla mîyan de nêweşîyê sey qelb yan zî otizmî nênê dîyayîş Eke bene nêweş nêşinê nêweşxaneyan. Mîyanê xo de xo bi xo tedawî vînenê.

Ê fotografan zî nêancenê. Fotograf antene hetê înan de qedexe yo. Ê qayîl nîyê û nêwazenê ke fotografê înan bêrê antiş. Balkêş o; vanê ; eke fotografê ma biancîyê rihê ma benê vîndî.

Na qebîla de cinîyî sereyanê xo anêkenê. Sereyê înan de yew bone esta. Rengê boneyanê cinîyan ê ezeban sîya yo, yê cinîyane zewicnayeyan zî sîpî yo.

Cinîyê înan qet makyaj nêkenê, sade yê, tebîî yê. Ê bi xo qican/domanan ra zî zaf hes kenê û coka pêro cinîyî şeş-hewt heb qicî anê dinya. Amişîjî, zaf xebîtyenê, goreyê înan betal vindertiş gune yo. Camêrdê înan zî sey cinîyane xo tebîî yê. Forsî ra hes nêkenê. Kincê înan sade yê. Qet zimbelan nêverdenê. Qêdexe yo çimkî. Camêrdê zewicnayeyî zî teyna eşkenê erdîşa xo biverde.

Hetê na qebîla de mişagîye (îmece) esta. Înan mîyan de hetêyewbînankerdiş muteber o. Ê zaf qiymet danê qicanê xo. Çimkî qicî neslê înan domenê. Qicê înan teberî de kay kenê. Kikerê/titikê (oyuncak) înan bir a yanî çuwe yo, herre ya.. Destê înan de ne telefon ne zî laptopî estê. Teknolojî ra bêxeber ê qicê înan. Ê nêşinê mekteban zî. Qebîlaya înan de mudetê perwerdeyî tena heşt serrî yo. Û nê perwerdeyî zî kîlîseyan de vînenê.

Qebîlaya Amîşî nika Prensîlvanya de îkamet kena. Goreyê fikrê mi cuya na qebîla zaf enteresan a. Coka mi na hûmare de cuya amîşijan ser o nuşt. Mi waşt ke şima zî înan bişinasnê. Ez vana qey cuya înan şima rê zî enterasan asena. Belkî şima terzê cuya înan ra hes kerd, hetta heyran mendî. Beno ke qismekê şima zî eqsê ci qet hes nêkerd. Çunke çimê şima de amîşjijî zaf cahîl ê. Îhtîmal o ke qismê şima yo muhîm zî vajo ke "çîyo terw hol/baş/rind ê kenê."

Xulasa ez şima nêzanena labelê ez bi xo heyranê înan menda. Ez zaf wazena şirê hetê înan. Teknolojî aver şî embazîye qedîyaye, teknolojî aver şî tey nêweşîyî zî bîy zêde . Hetê înan de teknolojî û îlacî. Ez nêzana şima dîqet kerd yan nêkerd la karaktere înan de egoizm çin o. Belkî heme sir zî no bi xo yo.

Nika her hetê ma de îmkanê teknolojîkî estê labelê huzur çin o. Qehr esto. No yeno a mana ke çiqas tay teknolojî hende zaf huzur. Destê ma ra telefon kêmî nêbeno, hetanî tuwaletan. Qicê ma zî sey ma bîyê bîyonîk. Komunîkasyono beşerî nêmendo. Hal û xatir perskerdiş, mujîlbîyayîş nêmendo. Coka her wareyê cuya ma de herb esto, lej esto, pêrodayîş esto. Têkilîyanê ma de cayê empatîkerdişî nêmendo. Herkes bîyo çimvêşan. Merdimî mird nêbenê. Bêro şima vîr ma zî demanê verênan de cuya xo eynî sey amîşijan ramitêne. O wext mîyanê ma de zî huzur estbîy û nêweşî zaf tay bîy. La nika winî yo?



**İSMAİL GÜVEN**

## Çekuyê Xerîbî

Serê rîyê dinya de gelek ziwanî estî. Tay ziwanî estî, hetê bi mîlyaran merdiman ra yenê qisey kerdene; tay ziwanî zî estî ke tena hetê çend merdiman ra yenê qisey kerdene. Labelê hûmara qiseykerdoxanê xo wazeno wa bi mîlyaran bê wazeno wa tena çend kesî bê, nê heme ziwanî wayîrê qaydeyan ê. Nê qaydeyî prosesê averkewtişê ziwanî reyde vejîyayê werye yan zî vurîyayî. Ziwanê ma Kirdkî/Kirmanckî/Dimilkî/Zazakî zî wayîrê gelek qaydeyan o. Nê qaydeyan ra yew zî – ziwanzanê ma sey qayde qebul kenî yan nêkenî ez nêzana- goreyê mi no yo: Herfê vengînî yê " i, î,o, û, u" sereyê çekuyan de ca nêgenî. Xora sey heme qaydeyan îstîsnayê nê qaydeyî zî estî; sey "inahawa, inaser, îrevetiş, încase, oxro". Heto bîn ra ziwanê ma zî sey heme ziwananê bînan deforme bîyo û beno. Mavaje "o"yê mîyanê çekuyan hetê Çolîg û Palî de vurîyeno û beno "ue, ua". Yan zî "ew" ancîya hetê Çolîg û Palî de vurîyeno û beno "o". Ma eşkenî çend nimûneyan zî bide: sol-sual, kor-kuar, mor-muer, gor-guer; hewt-hot, çewt-çot, rewt-rot ûsn… La gelo eke "o" sereyê çekuye de ca bigêro, se beno? Vurîyayîşê "o"yî nîşanê deformebîyayîşî yo yan zî nîşanê qaydeyêkê Kirdkî yo? Ez wazena nê nuşteyî de cewabê nê persî bida.

Ziwanî ganî yê, û sey heme çîyanê ganîyan aver keweni, vurîyenî, binê tesîrî de manenî û tesîr kenî. Senî ke têkilîya mîyankesî merdiman vurnena, eynî bi no hewa têkilîya ziwanan zî ziwanan vurnena. Ziwanî zaf rey yewbînan ra çekuyan genî. No çîyêko gelekî normal û tebîi yo. La çîyêko bîn o gelekî normal û tebîi zî esto ke ziwanî çekuyanê ziwananê xerîban wina rasterast nêgenî; înan goreyê qaydeyanê xo vurnenê, fînenê formêko newe. No qaydeyê vurnayîşî heme çîyanê ganîyan de esto. Wexto merdim bala xo dano îdeolojîyan ser, vîneno ke her miletî goreyê kultirê xo formêko newe dayo eynî îdeolojî. Na rastîye seba dînan zî wina ya.

Grûba Xebate ya Vateyî tercîhkerdişê çekuyanê xerîban de eynî bi no hewa hereket kena. Çekuyê ke ziwananê bînan ra kewtî ziwanê ma, înan gena, goreyê qaydeyanê Kirdkî vurnena û qebul kena (Xora no girewtiş, vurnayîş û qebulkerdiş hetê ziwanî ra beno, Grûba Xebate ya Vateyî tena nê qaydeyê ziwanî tesdîq kena.). Mavaje çekuya "qeleme", na çekuya Erebî ke eslê xo "qalam" a, sey "qelem, qeleme" kewta ziwanê ma. Her çend nê her di forman ra "qelem" hîna zaf nêzdîyê formê orjînalî bo zî, Grûba Xebate ya Vateyî formê "qeleme" tercîh kerdo. Çimkî Kirdkî de, "-e"yê peynîya çekuyanê makîyan nîşanê deformebîyayîşî nîyo, qaydeyêk o. Yanî tercîhê çekuyanê xerîban bi no hewa beno: a) Çekuya tewr nêzdîyê halê orjînalî. b) Goreyê qaydeyanê Kirdkî vurnayîşê na çekuye.

Ma êdî bê çekuyanê "oda, ortax, orte, ordege" ke bi herfa "o"yî dest pê kenê ser. Nê çekuyî pêro sewbîna ziwanan ra kewtê ziwanê ma. Kirdê ma ca-ca bi no hewa telafuz kenî, ca-ca zî sey "wade, wertax, werte, werdege" telafuz kenî. Grûba Xebate ya Vateyî nînan ra grûba yewine tercîh kerda. Îzahatê xo zî wina yo: Eslê çekuye bi herfê "o" dest pêkeno. "ew" nîşanê deformebîyayîşî yo. Labelê goreyê mi no îzahatê Grûba Xebate ya Vateyî nîme ra nîme rast o. Çimkî, seke mi cor de zî îzahat kerdo, tercîhkerdişê çekuyanê xerîban de di nuqtayî estê: Nêzdîyê halê orjînalbîyayîşê çekuye û goreyê qaydeyanê Kirdkî vurîyayîşê çekuye. Cumleya verêne yê îzahatî de problemêk çin o. "Ortax" goreyê "wertax"î hîna zaf nêzdîyê halê orjînalî yo. Yanî nîmeyo rast cumleya verên a. Labelê wexto ma ewnîyenê cumleya dîyine ra, ma vînenê ke cumleya dîyine şaş a. Çimkî "ew"ê sereyê çekuyan goreyê yew qaydeyê Kirdkî virazîyayo. Ziwanê ma çekuyê xerîbî girewtî; labelê goreyê qaydeyanê xo vurnayî û formêko newe dayo bi înan. Yanî "o" bi di qaydeyan vurîyeno: mîyanê çekuyan de û sereyê çekuyan de. Mîyanê çekuyan de vurîyayîşê ci nîşanê deformebîyayîşî yo; labelê sereyê çekuye de vurîyayîşê ci qaydeyêkê Kirdkî nîşan dano.

Tîya de yewna problem vejîyeno vernîya ma. Gelo her kes goreyê rastîya xo hereket bikero, no seba ziwanî çîyêko baş o yan xirab o? No ziwanî aver beno yan tepîya verdeno? Bêguman her kes rastîya xo dima şoro, no xizmetê ziwanî nêkeno. Çimkî o wext ziwanî de kaosêk virazîyeno. Û feydeyê rastîya ma verê nê tahrîbatî de zaf tay maneno. Coka ganî her kes rastî û şaşîyan binuso, rexne û pêşnîyazanê xo biko; labelê goreyê rastîya xo hereket nêkero. Ganî ma Grûba Xebate ya Vateyî sey otorîte qebul bikere û ma rê şaş bêro zî tercîhanê ci bikar bîyare.

# Wesîyetnameyê Çar Şehîdan



**MUTLU CAN**

Naye ra çend rojî ver yew qeraro tarîxî yo ke do tarîxê kurdan de cayo muhîm bigîro dîya. No qerar, referandumê xoserî ke bi aşman o rojevê kurdan de bî, derheqê ey de bî. Goreyê naye referandumê xoserîya Kurdîstanê Başûrî do 25ê êlule 2017î de bêro kerdene. Bi no qaydê prosesê ronîyayîş û îlanbîyayîşê dewleta kurdan dest pêkeno. Yew hewno tarîxî raşt beno; yew parçeyê welatê ma beno azad. Qerarê referandumî yan zî bi îfadeyêko bîn na gama tarîxîye startê vurnîyayîşê çerenuştişê miletê ma kurdan dana. Kurdê ke wayîrê şerefê neteweyî yê bi sayeyê nê qerarî keyfweş ê û a roje û a roje ra pey roja îlanbîyayîşê dewleta kurdan biheyecan pawenê.

Helbet milete ma bi rehetî û bêzehmetî nêresa nê rojan. Manzarayê pozîtîfî ke rojawan û başûr de asenê netîceyê mîrasê mucadele û xoverdayîşê milî yê kurdan ê. Tarîx ra hetanî ewro, her parçeyê welatî de, bi hêzaran ciwanmerdê kurdan erzîyay wezîfe û rayîrê azadîya welat û miletê ma de zaf bedelî dayî. Bi des hêzaran kurdî bi destê çar dişmenanê hovaneyan û bêînsafan kişîyayî û raxelisiyayîşê miletê kurdî ver şehîd bîy. Her çar parçeyan de rêxistinê kurdan ê ke amancê înan azadkerdişê kurdan bîy, mucadeleyê înan, mucadeleyê hemê lîderan û mensubanê înan mîrasê xovardayîşê ma yê neteweyî teşkîl kenê. Naye ra ma bekê parçeyan û rêxistinanê ma de cîyayîye bikê ganî hemê şehîdanê Kurdîstanî /dewaya azadîya miletê kurdî tim bîyarîn xo vîr û înan yad bikê. Çunke no seba ma hem mesulîyetê şerefê milî yo hem zî yew wasitayo ke payanî ra mendişê tarîxê mîrasê xoverdayîş û şuurê miletpewerwerîya kurdan temîn keno.

Ez na çarçewa ra girêdaye wazena ke bala şima biancê tarîxê mucadeleyê ma yê milî yê parçeyê Başûrî ser, hîna raştîya ci çar zabîtê kurdî ke mensubê artêşa Îraqî bîyê û dima hereketê Mela Mistefa Barzanî yê neteweyî de ca girewtê û ronîyayîşê Komara Kurdîstanî de xizmetê înanê muhîmî bîyê, derheqê înan de bi hawayo kilmî melumat bidê şima.



Destê çepî ra: Muhemmed Qudsî, Hayrullah Kerîm, Mistefa Xoşnaw, Îzzet Abdulazîz

Serra 1933î de Kurdîstanê Başûrî de hetê çend kurdperweran ra 1939 de bi nameyê Hîva (Hêvî) yew partîye ronîyaye. Amancê na partîye zî sey rêxistinanê bînan temînkerdişê heqanê neteweyîyan yê kurdan bî. Mistefa Xoşnaw, Muhammed Mahmûd Qudsî, Îzzet Abdulazîz, Hayrullah Abdulkerîm ke sey çar şehîdan name benê ronîyayîşê na rêxistine de ca girewt.

Nê çar zabîtê şehîdî (mîyanê 1943 û 1945î de) beşdarê serewedaritişê Barzanî bîyî. Înan naye ra teber 1946 de ronîyayîşê Komara Kurdîstanî de xizmetê muhîmî kerdî. 1947 de mîyan ra wedarîyayîşê Komara Kurdîstanî ra pey semedo ke mucadeleyê xoyê xoserîye bidomnê sînorê sunî yo ke mîyanê Îraq û Îranî de ca girewtêne, uca ra derbazê herêma Îraqî (Kurdîstanê Başûrî) bîyî. Heyf ke dima ra esîr kewtî destê dewleta Îraqî û mehkemeya Leşkerî ya Îraqî derheqê înan de qerarê îdamî da. Nê çar zabîtê kurdî yê kurdperwerî 19.06. 1947 de ameyî dardekerdiş. Înan nê tarîxî ra rojêk verî ciwananê kurdan rê yew wesîyetname nuşt û verda. Ez sey kurdperwerêk, serrgêrra 70. ya şehîdbîyayîşê înan de, înan û bi no wesîle heme şehîdanê Kurdîstanî bi rehmet û hurmet yad kena.

**Birayanê ma yê ewladanê kurdan yê ezîzan rê!**

Saeta ke ma na mektube nusenê emre ma yê koletî ya binê kolonyalîstîye tena qasê çarês saetî mendo. Dima ra ma do bierzîye dare, ma do bivîyarê dinyaya azadîye, dima ruhê ma yê pakî şehîdanê ke canê xo seba welat û rayîrê Homayî dayo, ruhê înan reyde bibê yew.

**Wa û birayêne!**

Ma xo zaf bextewer hîs kenîme çunke ma wezîfeyê xo yê milî û nîştimanî (welatî) ra hîç apey nêmendîme.

Şima rê şîretê ma no yo ke şima sey ciwananê kurdan û welatperweranê kurdan, yew cuye û feraseto ke do piştîya kolonyalîstan bîyaro war û bêîstîsna heme şaran biresno azadî xo rê sey terzê cuye bigîrê û yewî û pîyayîya xo awan bikerê.

**Wa û birayêne!**

Bibîn dişmenê cehaletî, bi heme hêzê xo vera ey mucadele bikîn û mekewîn cahîlan dima. Ma 1947 de sembolê mucadeleyê şarê kurdî yê. Wa û birayê ma yê ke ma dima bimanê do rayîrê heq û şerefi de mucadeleyê xo biramê û bi ardimê Homayî biresê azadîya xo.

**Wa û birayêne!**

Dare rê erzîyayîşê ma ne zeîfîya ma ne zî mucadele de teredutkerdişê ma ver beno. Eqsê ey, ma hetanî ke resay na netîce sey leşkeranê azadan şer kerd.

Biciwîyo yewî û azadîye, biciwîyo Kurd û Kurdîstan.

**Mistefa Xoşnav - Muhammed Mahmûd Qudsî**

**Îzzet Abdulazîz - Hayrullah Abdulkerîm**

Bexdad, 18.06.1947




Helbet beno ke tayê şima vajê haya ma nê çar şehîdan ra estbî la beno ke tayê şima înan ra bêxeber bîy yan zî mavajîme nêzanayêne ke înan yew wesîyetname nuşto û ma rê verdayo. Xulasa mi waşt wa kurdê ma yê kirmancî zî wesîyetê înan bizanê. Coka mi no wesîyetname çarna kirmanckî ser û îlaweyê nê nuşteyî kerd. Çend çîyê peyên ê ke ez do derheqê çar şehîdan de vaja nê yê:

Nê fermandaran ra Hayrullah Abdulkerîm û Muhemmed Qudsî Silêmanîye ra, Mistefa Xoşnaw Hewlêr ra, Îzzet Abdulazîz zî Akrê ra bîy. Ewro Silêmanîye de heykele înan esto û her serrgêra şehîdbîyayîşê înan de, verê ey de seba înan merasîmê yarkerdişî virazîyeno.

Ma kurdpewerwerî îlahîm ganî tarîxê xoyê milî weş bizanê. Mucadeleyê hereketan/rêxistinanê xo yê neteweyîyan yê pêro parçeyanê Kurdîstanî ra hayîdar bibîn. Ez bi xo na çarçewa de qiymetêko taybet dana vatişanê peyênan yê lîderan û şehîdanê ma yê ezîzan. Hêvîya mi na ya ke ez rojêk pêbihesîye ke na babete ser o xebatî ênê kerdene û çimeyê pêroyîyê ke vatişan, mektuban û wesîyetnameyanê înan îhtîva kenê bivînê. Û vatişê mino peyên o nikayin; bi hêvîya "rojanê bêemsalan" bimanîn.

# Kirdan/Zazayan de Muzîkê Polîtîki

NUREDDÎN CELALÎ

Muzîk yew unsurê cematî yo. Her cemat xo wareyê muzîke de newe ra virazeno. No semed ra hemê cematan de mûzîk esto û tena seba şayî nêno şuxulnayîş. Cematî muzîkanê xo de bi veng û ensturmanan temsîlê xo yo ahengin û rîtmin virazenî. Nê vengî û ahengî aîdê ê cematî yê. Demo ke merdim nê vengan eşnaweno fam keno ke aîdê kam yew cematî yê. Bi no qayde mûzîk beno yew wareyê bîyayîşê cematî. Cematî servîyarteyê xo, dej û şayîyê xo, dîn û bawerîye xo û sîyasetê xo bi no wareyê bîyayîşî de berdewam kenî.

Kirdan/zazayan de semedo ke yew tradîsyono biquwetin nuştiş nêbîyo, unsurê ke cematan virazenî û cor de nameyê înan ameyê dîyayîş wareyê muzîkî de xo viraştê. Mavajî zaf deyîranê kurdan de bîyayîşanê tarîxîyan ra behs kenî. Şar bi nê deyîran tarîxê xo zano û xo vîr nêkono. Reyna dîn û bawerî ke muzîkê kurdan de yew beşê tewr quwetin o. Mavaji elewîyan de tanî îbadetî bi muzîk virazîyenî. Cemê elewîyan de bi tenbur û beyîtan cem girêdanê. Zikrê teriqetê Neqşîbendîyan de bi elbane rîtîm virazenî zîkir kenî. Kirdan de dîn û muzîk kewtî têmîyan.

Muzîk eynî wext de seba mucadeleyê sîyasî yê kurdan zî yew wareyo giran o. Hem deyiranê klasîkan de hem zî yê modernan de sîyaset û mucadeleye sîyasetî eşkera aseno. Deyîranê klasîkan de sîyaset raşta raşt nê, zafê sey gîrîzgeh vîyareno. Yew qisim deyîrî zî tayî bîyayîşê tarîxî ke tarîxê kurdan de wayîrê cayê giran ê, înan ra behs kenî ke nê deyîrî raşta raşt sîyasî yê.

Mavajî deyîra "Oy Mîrî" ke dormaleyê Çewlîg, Pali û Heni de yena vatiş, hem yew bîyayîşê tarixî ra û hem zî tesîrê cemat ra behs kena:


*Oy mîrî mîrî mîrî*
*Oy mîrî ez bimirî*
*Fermûn vecîyê fînî sûr î*

Na deyîre de yeno famkerdiş ke wextê osmanîyan de bi ferman fînî sûr bîye mecbur, kirdan/zazayan goş panêkewt. Dima zî înan ser o tedayî ameyê kerdiş. Na deyîre terefê yew cînîye ra ameya vatiş. O tewr fam beno ke tanî merdimê ke fînîya sûr xo ser nênaya sirgun bîyê û xanima ey zî na deyîre eşta mêrdeyê ser:

*Oy mîrî mîrî mîrî*
*Oy mîrî ez bimirî*
*Fermûn vecîyê fînî sûr î*
*Ez şîya vêr paşayî*
*Mi va bêg mi meşaw cayko dûrî*
*Ez kuena bêg xwi vîrî*

Herçend na deyîra anonîme de hîsê zêr û hesret hîna giran ê zî deyîre yew bîyayîşê tarixî ke ganî şar xo vîr ra nêkero kerdo mîyane mesajanê xo: Fermanê fînîye sûran û tedayî û sirgun..

Muziko polîtîk wextanê modernî de semedê çîya-çîya amancan ameyo şuxulnayîş yew unsuro gelek muhîm o. Şaran semedê xebatanê xo yê polîtîkî de bitaybetî sey yew enstrumanê




> Kirdan/zazayan de semedo ke yew tradîsyono biquwetin nuştiş nêbîyo, unsurê ke cematan virazenî û cor de nameyê înan ameyê dîyayîş wareyê muzîkî de xo viraştê. Mavajî zaf deyîranê kurdan de bîyayîşanê tarîxîyan ra behs kenî. Şar bi nê deyîran tarîxê xo zano û xo vîr nêkono.

leji, leja xo de şuxulnayo. Mavajî, semedê inqilabê miyanneteweyî deyîrê Sovyetan (internationale revolutionary Soviet songs), Latîn Amerîka, semedê temanê netewî "Nueva Cancion o seserra 19 û 20in de Ewropa deyîrê verba kolonîyan seba mucadelê wayîrê rolêkê pîl ê (Massad, 2003: 21 neqilkerdox Saritaş, 2010: 12). Reyna prosesê Înkilabê Îran û badê cû zî cayê muzîkî ercaye yo. Bi muzîkî mesajanê xo eşkenê bişawê her ca û binê hîşî de ca bido xo. Înşayê nasnameyî de muzîk wayîrê cayo erjaye yo. Hemê hareketanê mîlîyan de muzîk sey yew wasitayo tesîrin yeno şuxulnayiş (Saritaş, 2010: 12; Neyzî, 2002).

Xebatê ke muzîk ser o ameyê kerdiş de vejiyo orte ke muzîk sey yew wasitayê polîtîka semedê cîya-cîya amancan ameyo şuxulnayîş. Nê armancî ma eşkenê wîna rêbikere:

- Vera kolonîye têda (pero pîye) vindertiş û veravejîyayîş
- Waştişê yew heyato hîna rind û yew cemato seyyewbîyaye
- Hicvê maldaran, kapîtalîstan, hukmatan û sîyasîyan
- Îdealê sîyasî û exlaqî
- Bimbarek kerdişê mucadeleyê gelî.

Cigeyrayîşî ke kurdan ser o bîyê înan de çiyo balkeş tesîrê muzîk o. Çunkî aktorê pôlîtîkê Kurdan wexto ke prosesê "kurdbîyayîşê" xo ra behs kenê vanê "qicîyê ma de keyê ma de radyoyê Erîwan, radyoyê Kirmanşan û radyoyê Bexdad amênê goşdarî kerdiş". Nê ifadeyan ra yeno famkerdiş ke muzîk tarîxê kurdan de newe ra kurdbîyayîşî de yew faktoro muhîm o. Xusûsen nameyê Kawis Axa, Mehemed Arif Cizrawî, Hesen Cizrawî, Eyşe Şan, Meryemxan û Hesen Zirek yenê vatiş. Nê kese ke cor de nameyê înan ameyê hûmartiş semedê xoşinasnayîşê yew nesîl tesîro giran kerd.

Herçend inşayê nasnameyê kurdan de cîya-cîya xebatî estê zî, la xususen xebatê ke muzîkê kurdan ser o amayê kerdiş hend tayê ke pê giştan yenê humartiş. Cigeyrayîşê ke muzîkê kurdan ser o yenê kerdiş semedê famkerdişê inşayê nasnameyê kurdan yew pasta pîl a. Seke ma cor de vat hereketanê/têgerayîşanê mîlîyan de muzîk sey yew wasitayê lej ameyo viraştiş û şuxulnayîş.

Mavaji Rençber Ezîz ke muzîke xo sey yew wasitayê sîyasî viraşt merdimo ke tewr ver zazakî de muzîko sîyasî keno yeno zanayiş. Ey, muzîkê edetkî yê kirdan/kirmancan bi ensturmananê modernan yew tedeyo sîyasî dekerd û mucadeleyê ê wextî de cayê xo girewto. Lawikê ey sey lawikanê verênanê kirdan bibîy zî o bi yew tedeyeya newe, newe ra înşa keno.



Her di halan de zî zereyê lawikanê edetkîyê ra ke semedê çewlîgijan meqbul yew meqam o vengdano.

Mavajî lawikê Xunê Hecî zaf varyantê xo estê. Goreyê Malmîsanijî (1991), na lawike yew keyneka Çewligije eşta nîşanîyê xo ser. Nîşanîyê keyneke şino Herbê Dinya yê Yewinî de şehîd beno. Lawike, yew sehneyê fireqetî teswîr kena. No varyant goreyê lawike wîna ya (Hêvî, 1985:115 neqlkerdox NewePel, 2012: 8):

*Serê bonê Hacî yo meydon o,*
*Binê bonê Hacî yo meydon o.*
*Yo meydonê astoron o,*
*Keno are xortanê Kirdon o.*
*Verê yîne dono çi ca k' giron o,*
*Inşala yo tira nêmono.*
*Her way vona, her way vona,*
*Her way vona Xona Hecî.*
*Çimê to sîya yê ze eçkicî,*
*Birîyê to qeytanê gicî.*
*To Homê kena ti gu mi ra vecî.*
*Ti şermayena etya vecî,*
*Mi rê bê verê bonê 'Elî Qicî.*

Varyanto bîn zî yew lawikê xowardan a. Çîyê ke dormaleyê Xunê Hecî de vîyarenê hikâye kena. Hozanî varyanto ke tede xowardayî esta tercîh kerdo. Na deyîre mojnena ke Rençber Ezîzî bi deyranê klasîkan semedê mesajo polîtîkî dayîş çend xebat kerda. Senî lawikî kerdê wasitayê lejê polîtîkî. Sereyê lawike de nehsîyê Xunê ra behs keno dima zî mesajê xo bi îlawekerdişê yew rêze mesajê xo keno de. Xowardayî camerdîya ke hed ra veti ya. Rençber na deyire de vengdano camêrdîyê kirdan. Vano madem şima hend camêrd ê û kaydayîşê mayin de zerdan erzenî, qey şima paşt nêdanê peşmergan.

*Riza Beg mayin kay duno*
*Heyder Beg erzen zerdunu*
*Duno bexşîş peşmergun o.*

Muzîke polîtîk ê kirdan helbet gelek hîra yo ma tena tîya de mintiqaya Çewligî ra di nimûneyî dayî. Bi xo wextê modernan de keso ke kirdkî muzîk keno muzîkê ey/aye polîtîk o. Çunkî ziwanê kirdan yew zemano derg qedexe bi û kirdî muzîk viraştiş yew tercîh o. Yanî hunermendê ke kirdî muzîk viraştiş wazenî wa muzîkê ey/aye raşteraşt sîyasî nêbo bi xo polîtîk o. Xusûsen badê serranê 1980an zaf hunermendî muzîkê polîtîk ê kirdan virazenî.

**Çimeyî:**


Hêvî, (1985). Xona Hecî. Hejmar 3, r. 113, Parîs.
Malmîsanij, M. (1991). Fokloré Ma Ra Çend Numuney.
Malmîsanij, M.(1992). Roja Newe (Türkçe-Kürtçe Gazete).No.1, r.4. Istanbul.
*Newepel, (2012). Çend Metnê Ma Yê Tarîxî. Humare 24, r. 8. Diyarbekir.*
*Massad, Joseph. "Liberating Songs: Palestine Put to Music" in Journal of Palestine Studies. Vol. 32. No. 3, Spring, 2003, pp.21-38.*
*Saritaş, S. E.( 2010). Articulation of Kurdish Identity Through Politicized Music of Koms.*
*Neyzî, L.(2002). Metin-Kemal Kahraman'ın Müziği: Yaşlı Kuşağın Belleği Yoluyla Dersimli Kimliğinin Yeniden Keşfi. Toplum ve Bilim 92, rp. 163-175.*


# Referandumê Xoserîya Kurdîstanî

AHMET KASIMOGLU

Hêverî PDK û YNK, dima ra sîyasîyên bîn û temsîlkarê ekalîyetî, amey têhet, vateyê xu kerd yew û qerarê xu da. 7 hezîrane de serek Mesud Barzanî, mîjdanî da ma kurdan û dinya alemî. "25 êlule de referanduma xuserîyî Kurdistan virazîyeno. Çimê ma, wa roşn bî!

Wareyê referandumî, cayo ke pêşmerge visto xu dest û ho paweno, uca yo. Ma vaci Bajarê Hewlêr, Silêmanîye, Duhok û Kerkuk; Bajarokê sey Şingal, Mexmûr, Xaneqîn, Celewla ûêb. Şarê ma yan dewleta Iraq ra cêser kuwenî û dewleta Kurdistan awan kenî / pîyeranarî. Yan zî welatê xu de, bindestîyê ereban qebul kenî û pa înan a cuya xu domnenî.

Welatê ma Kurdistan; Rojhelato Mîyanên de yo. Erdê ma kurdan; mabeynê Tirkîya, Îran, Iraq û Surîye wa barkerde yo. O semeda ma dinya de sey Kurdê Bakurî, Kurdê Rojhelatî, Kurdê Başûrî û Kurdê Rojawayî ya şinasîyenî. Gelek Kurd zî zor û tadeyê kolonyalîstan ver remayî û bîyî terkwelat / macîr. Ney macîrî her cayê dinya ya bîyî vila, la zafînê înan Ewropa de ca dayo xu.

Seserra vîstin de nufusê ma, çar goşeyê dinya de; hema zî tirkan, farisan yan ereban ser o qeyd kerdeyo. Yanî ma Kurd heme kitim î. Ma estî, la nameyê şarîya name dîyenî. Vateyê verînan a:"Dar ra maşa nêbena, Kurd ra paşa nêbeno" !

Ma hela ke nufus û welatê dewletanê bînan û yê xu nanê tîyevera, vînenî ke: 193 dewletî hetê Mîletê Yewbîyayeyî ra ameyî sinasnayîş. Nufusê ma 150 – 160 dewlete ra zêder o, erdê welatî ma Kurdîstan, 160 -170 dewlete ra hîna hîrayer o. Erdê ma, awa ma, petrolê ma, koyê ma û wareyê ma estî. Çinay ma ê bînan ra kêmêro ke, ma hema zî nêşkê dewleta xu Kurdîstan pîyeranî. Kemaney ma çîya?

1946 – 1947 rojhelatê welatî ma de, dewleta Mahabad ronîya. Adara 1970 başûrê welatî de, otonomî nîya piyera, hetan 1975. Gulana 1992; parlamentoyê kurdan Hewlêr de sazbi. 2003 de Amerîka hêna amey, Sedam Husên kanalîzasyon ra girot, berd vet mehkema û darde kerd. 2005 de kurdan pa ereban a, Iraq ser o dewleta federasyon napîyera. Serekê komarî Celal Talabanî bi, ewro Fuad Masum o. Kurd versîyê ereban de hê ciwiyenî. Gulana 2015 de bêzarîyê ereban ver, Mesud Barzanî şibi Amerîka, uca ra ageyra Çekîstan. A roj ra pey seba referandumê çi hewce bi kerd, ard resna ewro. Û vera dinya alem, eşkera kerd û va: "Wextê pîyeranayîşê / awan kerdişê dewleta xuserî ya kurdan, rewna ameyo ho vîyareno. Eke ma paweyê komşarê enternasyonalî bivinder, dewleta Kurdistan çirey pîyera nênîyena"!

"Dar pê gilanê xu gurrena"!

Ma hela ke ewnîyenê ewro: Her kes zanaye, per û çap xu gore, ho qal keno. Kolonyalîstî ke ma ser o yî; Tirkîya, Îran û Iraq nêwazenî ke, Kurd zî sey her milet dewleta xu pîyeranî. Surîye bilê xu bîya, ta nîna ke vateyê xu bivaco. Haydar Ebadî : Hedef û hêvîyê her milet esto. Ma ney ra hurmet kenî. La birayanê ma Kurdî, eke şîyêrî referandumê xuserîyî; persanê ma rê çare vînayîş ca verdên, her çî kuweno têmîyan. Çare, dîyalogê Bexda û Hewlêr o. Binali Yıldırım : " Kurdî wa şarê Iraqî ya, pîya biciwîyî". Ez zî vana, "Ma Kurdî welatê xu Kurdistan de pîya biciwîyî, hêna hol nêbeno serwezîr" ? Verfekê Surîye : Referandumê Kurdistanî gef e. BBC : Kurdên Iraqî, seba xuserîyê xu heq a şîyêrî referandum !Xebatkarê Enstîtûyê Rusyayî, Borîs Dolgov : Na referandum kurdî ke hê Îran, Tirkîya û Surîye de cîwîyenî, zêrr dano ci. No hal teyna Iraq de nê, her cayê mintiqa de, zaf çîyan bedelneno. Ne ke qerarê referandumî, xebatê hedreyîyê referandumî zî pa, sey domîno tesîr kenî. Verfekê Miletê Yewbîyayeyî, Stephanê Dujarriç vat: Qerarê referandumî eke 'E' bo; dewleta Kurdistan zî sey sewbîna dewletan, sazîya ma MY de cayê xu gena. Serekê Macarîstan Vîktor Orban vabi: 'Mintiqaya Kurdistan dewleta serbixu nêbî, la vera terorî temsîlê dinyayî kerdbi. Ma zî paştgêrîyê danî dewleta Kurdistan'.

Mesud Barzanî : Mileta mi, seba xuserîyê Kurdîstan a, kesî ra îzîn nêwazena !

Mam Celal: Kam sipê zê sipîyo ke, reyê xu seba xuserîyê Kurdistan nêdano?

Şîretê bawkalê mi Amerê Qasiman esto: Dost û dişmenê xu bisinasnên. Çîyo ke ez ha vînena, tay Kurdî ma hema zî kayekerê dişmenanî. Dişmen wazeno; ma bitersno, ma bixapîno, ma tîyeverdo, şarê ma bido xu destan, ma teyna biverdo. Ma Kurd zî rikê dişmenî de, dest bidi yewbînan û xuserîyê Kurdistan biwazî. Yew per de mileta kurdan esta, vera ma de dişmenî ma estî. Îsraîl: Qic ra pîl, heme cihuyî, paştgerê ma kurdan î.Tay verîna vera mabî, ewro zî hê vera ma de vindenî. Tirkîya, Îran, Iraq û Surîye. Tay zî wext gore cayê xu genî. Amerîka, Rusya û dewletê Ewropa.

Ma Kurd zî di per de yî; tay ganê xu seba Kurdîstan feda kenî, tay zî verîna kayekerê dişmenî ma yî. Numuneyek; rojê referandumî ke eşkera bîyo hetan ewro, tay dişmenî ma vanî no referandum qanunî nîyo. Tay partîyê kurdan, dest pêkerdo hê no vîrace kenî vila. Ma gazîn kenî dinya rê; "Hawara azadîyî kurdan beşnawên û dest bidên ma".

Referandumê Kurdistan, herhal xerîtayê Rojhelato Mîyanên bedelneno. Hukmatê Kurdistan, seba çimdarîyê referandumî; sere da MY rê. Ewro her kes seba ney zanayê û çapê xu gore; pê çimanê xuya ewnîyeno û vateyê xu vano.

Yew het a, vateyê ma kurdan esto, vera ney vateyê dişmenanê ma esto. Elbet dinya alem zî pencereyê xu ra ewnîyena û goreyê nehfê xu vateyê xu ke bivacî. La peyina peyin de, qerar qerarê şarê wareyê referandumî yo.

Gulana 2015 de, serek Mesud Barzanî hêverî şi Amerîka ageyrayîş de şibi paytexta çekan Prag. A roj ra pey ma hê vînenî ke, seba referandumê Kurdistan, dest ra çi bîyoro, texsîr nêkerd û kerd.

Ma wa ver 100 roj esto. Se rojan de, kam Kurd dest ra çi bero, heq a ey bîyaro ca. Na xebat xebata mendiş û nêmendiş o. Çîyo ke ez ha vînena, dişmen kerdinê xu tepiya nêdano. Dişmenan ra, minet nêbeno. Ez wina vînena ke, dişmen ho giranê dano xebata xapî. Ma eşkenê şarê xu pê bidi zanayîş ke wa nêbo kayekerê dişmenan. Qala verînan a ; "Dara pûçe, karmê xu zere de yo".

Ez wazena, hewteyê referandumî Duhok û Hewlêr de ravîyarnî. Xebatê şarê xu bivînî û şayî û mijdanîyê de mîyanê dezayanê xu de bî. Ez pê yeqîna ke mileta ma referandum dima, dewleta xuya xuserî îlan kena. Heyfê ma nîyo ke, ma hema zî bindestê şarî bi. Ma serdestîyê rewna kerdo heq, sey şîtê dadîyê xu kerdo helal. Û dewleta Kurdistan, rojhelato mîyanîn de, aramî û aşitî ana. Sey kerrayê domînoyî, kolonyalîstê xu fek ser fînenî erd û tira xelesîyenî.

1988, ez Çolîg de şibîya tazîyeyê Umîna Xanim. Badê tazîye rehmetî Sadiq Elçî (birayê Seîd Elçî) va, wa embazê tu şîyêrî, la ti vindir. Ap Sadiq mi ra persa, 'Ha sebena'! Mi hal û ahwalê Kurdistan ard ziwan. Rehmetî hêna persa, 'Ez vînena yan nê'? Mi va, 'Xu ra ti vînenî apo'. Bi vengo nizm a va, 'Mi hîn fahm kerd ke ez nêvînena, tu rê oxir bo'! A roj ra zerê mi de mend a, eke mi a roja mijdanî dî, Homa bîyaro werî, şina mezelcayê ap Sadiqî ser û tira vana, 'Çimê ma roşnbî apo, şarê ma yê başûrî, referandum de qerarê xuserîyê Kurdistan da. Dor – dorê ma wa'!



MURAD CÎWAN

## Nimêja vê destmêjê bivênevê ye

Biryara serlêdana rapirsiya cudabûna Başûrê Kurdistanê hat dayin. Di 25ê îlonê de yên deverên li serê nelihevkirî (maddeya 140) jî tê de hemû welatiyên pêkhateyên etnîkî, dînî û mezhebî ên Başûr ê tevî rapirsiyê bibin. Zelal nebûbe jî çawa, lê yên li derveyê welêt jî ê deng bidin.

Gelo xelkên deverên dibin destê PKKê û yên li bajarên erebnişîn ê karibin îradeya xwe diyar bikin, yan ê bên veguhastin ser sindoqên nav Herêmê?

Rapirsî lihevhatî ye li gel destûra Iraqê. Lê hin dibêjin ku li deverên nelihevkirî ên mixatabên rapirsiya maddeya 140ê (gelo tevî Herêma Kurdistanê bibin yan na), diviya berê ew rapirsî, piştre ya li ser cudabûnê bihata kirin.

Rexneyeka wiha, ji gelek aliyan ve ne di cih de ye. Yên ku maddeya 140ê cîbicî nekir ne kurd, desthilatdarên Bexdayê bûn. Wan maf tune îro xwe bispêrin wê.

Ji xwe di vê navberê de êrîşa dirindane ya DAÎŞê hat ser deverên îdîakirî. Eskerên Iraqê ew dever berdan û reviyan, hin jê (Kerkûk û başûrê Germiyan) pêşmergeyan xwe gihand wan, DAÎŞ jê dûr xistin, hin jê jî pêşmerge bi şer ji deste DAÎŞê rizgar kirin. Loma li van deveran hikumeta Bexdayê mafê serweriya xwe wenda kiriye, bêyî îradeya van deveran, şer'iyeta tu gava wê nîne.

Rapirsî ê ji xelkê bipirse, aya ew ji Iraqê cuda bibin yan na. Li deverên li serê nelihevkirî, nirxa rapirsîyê bi du rapirsiyan e. Gava dengên cudabûna ji Iraqê pirranî bin, ew otomatîkî bersiva maddeya 140ê ye jî, tê maneya ku ew dixwazin biçin ser bi Kurdistanê ve.

Rapirsî ê ne biryarder, rawêjî (şêwirdarî) be. Ji ber vê taybetmendiyê, li derûdorên siyasî yên Bexdayê û Hewlêrê ew tê şibandin destmêjekê. Hewlêr dibêje 'ew destmêjek e, piştî destmêjê mecbûriyeta nimêjkirinê tune. Nimêj dikare neyê kirin (serxwebûn neyê îlankirin).' Bexda jî bi gumaneka endîşedar dipirse, 'baş e ku nimej ê neyê kirin, destmêj çima tê girtin?!'

Ev anekdotek e, mîzaheka siyasî-dîplomasî tê de heye. Lê di rastiyê de yek ji wan nimandinên teswîrî yên herî xurt e ji bo rapirsiyeka rawêjî a li ser cudabûnê.

Rapirsiya cudabûna gelekî 'çareserkirina qedera xwe bi destê xwe' ye ku di tarîxa hiqûq û dîplomasiya navneteweyî de, di prensîb û peymanên navneteweyî de û di qanûn û peyrewên dezgehên navneteweyî yên wek Cemiyeta Eqwama berê û Neteweyên Yekbûyî ya îro de xwe ferz dike, mecbûrî cîbicîkirinê ye.

Gelek girîng e ku ev rapirsî li ser şer'iyeta destûr û yasayên navneteweyî û yên Neteweyên Yekbûyî bimeşe.

Heya nuha terefan zelal nekiribe jî, di siruşta rapirsiya rawêjî de ye ku çareserkirina pirsê li ser esasê diyalog û gotûbêjên aliyên pêwendîdar bin. Serokwezîr Nêçîrvan Barzanî piştî hevdîtinekê li gel Bexdayê gotibû 'me ji Bexdayê re gotiye, roja em biryara cudabûnê bidin berî her kesî ê haya Bexdayê jê hebe.'

Ji hevdîtinên berpirsên Kurdistanê fêhm dibe ku Amerîka, Rûsya û welatên Rojava şertên piştgirîkirina cudabûnê ya dane ber kurdan, ew e ku bê şer, bi awayekî aştiyane, bi riya diyalog û lihevkirinê bibe. Eger serxwebûn, aştiyane biserkeve ê dinya piştgiriyê bidê, lê ku şer derkeve ji nuha ve tu soz tunene. Nexwe prosesa serxwebûnê kare dirêj bikêşe, ku xeteran li gel xwe tîne.

Kurdistan muhtaca riyeka wiha ye ku Bexda nikaribe şerekî ciddî derxe, yan li herêmê bê derxistin. Siyaseta gav bi gav xurtkirina statuya de facto ya serbixweyiyê, ji alî din ve jî rêxweşkirina ku di mesela yekpareyiya Iraqê de erebên sune û şîe jî bibin mixatabên hev li pêş kurdan e. Yekîtiya Iraqê pêkhatiya ji sê aliyan e. Ew yekîtî ne bes bi cudabûna kurdan, bi çûna yek ji terefên ereb jî ê ji navê rabe. Ger erebên sune û şîe li hev nekin û herkes bi riya xwe ve biçe ji xwe Kurdistan ê li ciyê xwe serbixwe bimîne û kes nikare bêje tu çima tenê mayî. Ji bo rexweşkirina ber bi vir ve, siyaseta Kurdistanê lazim e piralîtir be.

Xetereka mezin ji bo serokên kurdan heye. Ger piştî rapirsiyê lihevhatin cudabûnê nede, yan bêçareserî dirêj bikêşe, rapirsiyê dikare bibe narincokeka demjimêrî û di destê wan de biteqe. Eger çareserî tunebe, divê sebixweyiya de facto her ber bi têraxwekirinê ve biçe. Ger lihevhatineka mayina bi Iraqê re rû bide, ji xwe berpirs mecbûr in wê bi rapirsîyeke nuh pêşkêşî îradeya gelên Kurdistanê bikin, vîna gelan careka din daxin meydanê û şer'iyetê werbigirin.

Naskirina 'mafê tayinkirina qedera xwe bi destê xwe' di program û armancên hemî rêxistinên sosyalîst, sosyal demokrat, lîberal, demokratên çi xiristiyan û çi îslamî de heye. Encama rapirsiyê li gor qanûn û rênimayên wan divê ji bal wan ve bê naskirin û cîbicîkirin. Hemû dewletên ku ev prensîb di destûrên wan de hene, yan endamên Neteweyên Yekbûyî ne mecbûr in vê îradeyê nas bikin.

Ji alî kurdan ve, PKK/KCK û Gorran tê de, hemû partî û rêxistinên Kurdistanî, rapirsiyê boykot bikin yan nekin, beşdar bibin bêjin 'erê' yan 'na' ew mecbûr in encamê nas û cîbicî bikin. Mafê wan heye ew boykot bikin, an deng bidin bêjin 'na', lê mafê wan tuneye ku encama wê; îradeya derçûyî ya 'teyinkirina qedera xwe bi destê xwe' nas û cîbicî nekin.

Ev rapirsî ne destmêjeka ji rêzê ye. Nimêja vê destmêjê ji bo hemuyan; çi neteweyî, çi jî navneteweyî bivênevê ye.

Siyasetmedar, hunermend û rojnamegerê Kurd:

# Homer Dîzeyî

Homer Dîzeyî li gundê Dûgirdkan yê girêdayî Hewlêra paytexta Kurdistanê ji dayik bûye. Homer Dîzeyî di jiyana xwe de hunermendî, rojnamegerî, siyasetmedarî û pêşmergetî kiriye. Dîzeyî bi dengê xwe yê qedîfe li seranserê Kurdistanê tê guhdarîkirin. Muzîka rojavayî li gor çanda Kurdî gelek balkêş neqişandiye. Em weke Heftenameya Basê ligel Homer Dîzeyî li ser jiyana wî ya hunerî, taybetî, siyasî û rojnamegeriyê axivîn.



DARA PORXELEK



Gelek siyasetmedarên cîhanê yên bi nav û deng ligel siyasetê hunermendiyê jî dikin. Clinton li saksafonê dide, Wezîra derve ya DYAyê Condoleezza Rice piyanîsteke navdar e. Homer Dizayî jî yek ji van kesayetan e ku him bi siyasetê û him jî bi hunerê re mijûl e. Siyaset û huner ligel hev dimeşin.

**Hûn ji malbateke dewlemend û xwedî ax bûn. Hûn ji wê fikra eşîrtî û axatiyê derketin û bûne hunermendekî mezin û netewî yê navdar. Ev yek çawa çêbû?**

Pirsyarek gelek baş e. Rastî problema min ligel vê yekê dûr û dirêj e. Tradîsyona eşîreta beriya 50-60 salî gelek xirab bû. Cihê eşîran di civaka Kurdan de hûn jî baş dizanin. Bi rastî niha ne weke berê ye. Hinek rehet bûye. Dema ez 5-6 salî bûm birayê min bi xweşiya dengê min hesiya. Mirtib dihatin gund û stran digotin min jî jiber dikir û digot. Ez gelek ji stranên mirtiban hez dikim. Dema ez çûm Ewropa jî min mirtib dîtin, jiyaneke wan a balkêş hebû. Dema çandiniyê stranên cotkariyê dihatin gotin, wê demê min jî digot. Min gelek ji stranên gundiyan hez dikir. Paşê min di derheqê van stranan de pirtûkek jî nivîsand. Dema ez di Radyoya Dengê Amerîka de dixebitîm min her hefte li ser van stranan dokumanter belav dikirin.

Piştî bavê min rihmet kir ez hatim dinê. Birayê min yê mezin Ehmed bû, ew mezinê eşîrê bû. Lê wî jî rihmet kir. Min dixwest dema ez mezin bûm dibistana muzîkê bixînim. Min ji kek Ehmed re got, wî jî got: "Ka lîseyê biqedîne paşê em ê bifikirin." Ez piçûkê malê bûm, neçar bûm ku bi ya wan bikim. Lê di dilê min de tim xwendina muzîkê hebû. Di xeyala min de piştî xwendina lîseyê biçim Roma-Viyanayê û muzîk bixwînim. Bi rastî jî min dixwest ez Muzîka Klasîk bixwînim. Min dixwest bibim Maestro. Kekê min got: "Nabe ev yek şerm e, muzîk karê mirtiban e. Beşeke din bixwîne." Kekê min ê din Enwer Beg li Enqereyê di beşa bijîşkiyê de dixwend. Kek Ehmed ji min re got: "Biçe Enqereyê ligel birayê xwe tu jî Dixtoriyê bixwîne, ji karê mirtiban çêtir e." Ji ber ku li gor wan muzîk tenê karê mirtiban bû.

Di sala 1954an de dema ez li Bexdayê bûm. Min lîse dixwend. Radyoya Bexdayê ji min xwest ku ez çend stranên Kurdî bixwînim. Min ji Kekê Ehmed re got. Wî jî ji min re got: "Baş e biçe stranan bixwîne lê navê xwe yê rast nebêje û pere jî negire." Eger min pere bigirta ez ê bibûma mîna mirtiban. Min ji bo Radyoya Bexdayê 6-7 stran gotin. 1-2 ji wan stranan yên min, yên din jî folklorîk bûn. Niha ew stran winda ne.

Di sala 1955an de min lîse qedand û ez çûm Enqereyê ji bo xwendina bijîşkiyê. Ez salekê li wir mam. Fêrî Tirkî jî bûm. Di dersên Dixtoriyê de 4 ders hebûn min 2 ders derbas kirin du ders man. Dema ez havînê vegeriyam Kurdistanê min biryar dabû ku ez venegerim Enqereyê. Kekên min Ehmed û Enwer pir israr kirin jî min nexwest ez vegerim. Pişt re nasên me ligel kekê min Ehmed axivîn û Kekê min qanî bû da ku ez biçim Viyanayê û li wir zaningehê bixwînim. Kekê Ehmed ji min re got: "Baş e biçe lê bi şertê ku tu yê muzîkê nexwînî."

Di sala 1957an de ez çûm Viyanayê. Karê min ê yekem çûyîna Konservatûrê bû. Min bihîstibû ku hilbijartinên dengan tên kirin. Lê min nedizanî ku operayê dixwazin. Dema ez ketim hundir, min dît ku bergên jûrî weke dema Mozart bûn. Ez mat mam. Yek jî rûniştibû li piyanoyê dida. Ez 20 salî bûm û ditirsiyam. Serjûrî ji min xwest ku ez texta destê xwe bidim piyanîst da ku ji min re li piyanoyê bixe. Min got, ez notayan nizanim û opera jî min qet nexwendiye. Tenê stranên Kurdî dizanim, pejirandin û min ji wan re straneke Tariq Tewfîq xwend. Gelek ecibandin lê ji min re gotin ev der tenê ji bo operayê ye. Eger tu bixwazî dibistanên muzîkê hene biçe wir. Ez ji vê yekê pir êşiyam. Qet perwerdehiya min a muzîkê tune bû. Min ji neçariyê berê xwe da beşa Zanistên Siyasetê. Min Zanistên Siyasetê li Londrayê xwend. Piştî wê jî derbasî Parîsê bûm. Li wir jî derbasî DYAyê bûm. Karê min bi giştî siyaseta Kurdî bû lê min carinan muzîk jî dikir.

**Mîna gelek kesan ez jî li bendê bûm ku hûn bîreweriyên xwe bikin pirtûk û belav bikin. Lê we di Heftenameya Basê de bi Soranî weke nivîsar belav kir. Sedema vê çiye?**

Min di destpêkê de vekolîna malbata xwe kir û wisa nivîsandin bîreweriyên xwe. Malbatê ji deverên din ên Kurdistanê koça Hewlêrê kiriye û li Hewlêrê bicih bûye. Belgeyên vê agahiyê di Pirtûkxaneyêm Îngilistanê de hene. Min dîroka malbata xwe ya 200-300 salî nivîsand heta ez gihîştim roja me. Herkes wisa dizane ku min pirtûk nivîsandiye û ji wir belav dikim. Carinan ji bo hefteyekî dinivîsim carinan jî ji bo du sê hefteyan dinivîsim. Bi rastî min tu carî bîr nebiribû ku ez bîreweriyên xwe belav bikim. Hevalên Basê ji min re gotin 'Tu çima bîreweriyên xwe nanivîsî, eger tu binivîsî em ê di rojnameyê de biweşînin.' Me ligel Basê rêkeftin îmzekir, piştî gotar bidawî bibin dê Rojnameya Basê bike pirtûk û biweşîne. Min jî piştî vê lihevhatinê bîreweriyên xwe li ser rojnameya Basê weşand.

**Hûn di bîreweriyên xwe de cihekî gelek girîng didin dayîka xwe. Dayîka we çawa li destpêka hunermendiya we dinêrî. Piştgirî dida we an ew jî li hember derdiket?**

Dayîka min bi eslê xwe ne Dîzeyî ye. Ew ji Eşîra Berzencî li herêma Koysancaqê ye. Em malbatake Hewlêrî ne. Malbata Dîzeyî ne şêx û seyîd e. Em eşîr in. Bavê min pir zû rihmet kir. Hê 45 salî bû rihmet kir. Ez piştî mirina bavê xwe hatim dinê. Dayîka min him bû bav him jî bû dayîk ji min re. Dayîka min gelek bi ser min de diket. Ez jî pir bi dayîka xwe ve girêdayî bûm. Wê jî nexwest ku ez muzîkê bixwînim. Digot, 'Eyb e, şerm e. Dibistanê bixwîne lê ji bilî muzîkê beşeke din bixwîne." Dayîka min jî ligel kekê min bû.

**Di ciwantiya we de hûn li hember pergala axatî û gundîtiyê sekinîne. Hûn ji ber pergala eşîrtiyê çûn Rojavayê Cîhanê û we zaningeh xwend an ev yek ji xwe biryara we ya takekesatî bû?**

Her çiqas em zarokê axa bin jî hinek ji me Komûnîst bûn, hinek ji me jî Marksîst bûn. Rewşenbîrên wê demê bi giştî çepgir bûn. Birayê min Kak Enwer birîndar ket, Kekê min ê mezin Kak Ehmed jî li ser vê mijarê ket hepsê. Em weke zarokên Dîzeyî bi piranî Marksîst û Komûnîst bûn.

Di wê demê de her malbateke ku rewşa wan a aborî baş bû keç û xortên xwe ji bo xwendinê dişandin Ewropa. Ne daxwaza min î takekesî bû lê min jî gelek dixwest.

**We ligel hunermendiyê siyaset jî pêş ve biriye, sedema vê yekê çi bû?**

Gelek siyasetmedarên cîhanê yên bi nav û deng ligel siyasetê hunermendiyê jî dikin. Clinton li saksafonê dide, Wezîra derve ya DYAyê Condoleezza Rice piyanîsteke navdar e. Siyaset û huner ligel hev dimeşin.

**Çend besteyên we hene?**

Bi rastî jî ez nizanim çend stranên min hene. Min gelek stranan nivîsandine, lê kêm ji wan min tomar kirine. Ez ne profesyonel im, ji ber vê yekê jî nizanim çend stranên min hene.

Li seranserê Kurdistanê hûn ji kîjan stranbêjên Kurd hez dikin?

Di vê mijarê de jî divê em kategorîze bikin. Yên kevin Kawis Axa, Meryemxan Saîd Axayê Cizîrî piştî wan Tahsîn Taha. Yên niha Aynûr Doğan, Nîlufer Akbal, Rojîn. Li Rojhilata Kurdistanê Kanî heye. Li Kerkûkê Chopy heye. Li Başûr Hanî heye û gelek kesên ku niha navê wan nayê bîra min.

**Siyaset, huner an rojnamegerî?**

Zimannasî jî heye. Dema ez li Amerîka bûm min mastera xwe li ser zimannasiyê dikir. Salekê min serkeftî bidawî anî. Paşê min di Radyoya Dengê Amerîka de dest bi xebatê kir. Û min mastera xwe di nîvî de hişt. Ez bi 8-9 zimanan dizanim. Siyaset jî, zimanzanî û rojnamegerî jî beşên ku min xebat li ser kirine. Lê huner û zimanzanî dilê min germtir dikin.

**Em ê kengî berhema we ya nû guhdarî bikin?**

Min CD nû dagirtiye. Ji deh stranan pêk tê. Niha li Silêmanî tê amadekirin. Piranî besteyên min in. Melodiyên stranan jî bi giştî yên Ewropî ne. Min stranek li ser Kobanî jî çêkiriye. Melodiya wê ya dema Partiya Komûnîst a Îraqê ye. Bi rastî jî straneke pir xweş e.

**Hûn hunermendên Bakurê Kurdistanê çawa dibînin?**

Ez gelek ji muzîka Bakuriyan hez dikim. Asîmîle nebûne. Bingeha muzîka wan tim Kurdistan e. Paqij maye. Hêviya min ew e ku vê yekê bidomînin. Weke Başûr nekevin bin tesîra Erebî. Herwiha hinek Rojhilat jî vê yekê dike.

**Di vî emrê têr û tije yê ligel siyaset û hunermendiyê de hûn dikarin di derheqê evîndariyê de çi ji me re bêjin?**

Hemû mirovên li qada hunerê kar dikin, ew di du cîhanan de dijîn. Di cîhana xwe ya taybet de ji xwe re îmagînasyonekê diafirînin. Vê afirîdê ji xwe re dikin helbest, stran an jî berhem. Eger hûn wan ji wê cîhanê derxînin ew bedbext dibin. Mirovahî jî ji berhemên wan bêpar dimînin. Hunermend bi saya wê afirandinê ji xwe re dilê xwe dikin perestgeh.

**Gelo Evîndara we ya yekem?**

Li Kerkûkê bûm. Me li dibistana navîn dixwend. Keçeke Aşûrî hebû navê wê Leyla Polmelek bû. Esmer û pir xweşik bû. Aşûriyên Îranê bûn di dema Simkoyê Şikak de reviyabûn hatibûn Kerkûkê. Bavê wê Dixtor bû. Min bi navê Leyla Polmelek stranek nivîsanibû ji bo wê. Ew hay ji vê yekê tune bû. Evîna min platonîk bû jixwe.

**Hunermendên vê demê stranên wan di demeke kin de gelek tên guhdarî kirin û tên ji bîr kirin. Lê yên klasîk, weke Tehsîn Taha, Saîd Axa û hwd nayên jibîr kirin. Her wiha yên we jî wisa ne ku di hişê mirovan de dimînin. Sedema vê yekê çiye?**

Mijara muzîkê dema tê guftogo kirin divê mirov dabeş bike. Bi taybetî jî ya muzîka Kurdî. Muzîka klasîk heye, yên gundan hene, yên cotkariyê her wiha yên olî jî hene. Yek jî stranên rojane hene. Ev stranên rojane salek du sal tên guhdar kirin û jibîr diçin ev normal e. Mayîna muzîkên klasîk di hişê mirov de asayî ye. Ciwanên serdema me guhertinê dixwazin. Çar kurên bestekarê navdar ê Alman yê Bach hene. Her çar jî hunermend bûn. Li medreseyên cuda perwerdehî didîtin. Ji bavê xwe redibêjin ku: "Bavo, mirov êdî guherînan dixwazin. Ger em jî biguherin." Bach jî ji zarokên xwe re dibêje: "Min emrekî ligel muzîka klasîk derbas kiriye, ez nikarim biguherim lê hûn ji guherînê re vekirî bin." Min jî di dema xwe de pêwistiya veguherînê dît. Bi wê hişmendiyê min dest bi muzîkê kir. Wisa difikirim ku min karekî baş kiriye. Ev guhertin jî li xweşa gel çûye.



## Ezmûna Dîzeyî ya rojnamegerî û siyaset ê?


Di sala 1963an de ji Parîsê bo şoreşa Gulanê vegeriyam Kurdistanê û min Pêşmergetî kir. Piştî saleke din ligel Kak Samî Abdurrahman û Hebîb Mihemed Kerîm li şikeftekê me Radyoya Dengê Kurdistanê damezirand. Partiyê ji Kekê min Sadî Dîzeyî û Kemal Fûad xwestibû. Ew wê demê li Mêrdînê bûn. Wan radyo ji Almanyayê kirî û ji me re şandin. Destpêka rojnamegeriya min wisa ye. Piştî wê ez çûm Amerîkayê û di Radyoya Dengê Amerîka de xebitîm. Ez him spîker bûm him jî min gotar dinivîsandin.

Dema ez hê li Enqereyê bûm jî min ji bo Kovara Hetaw helbest û gotar dinivîsandin. Paşê Kovara Karwan derket, min gelek gotar ji bo wan jî nivîsandin. Min gelek helbestên şairên Ewropî jî ji bo Kurdî wergerandin.

Hê ez biçûk bûm min di Partiya Komûnîst a Îraqê de xebat dikir. Dema ez li Ewropa bûm endamê Partiyê bûm. Paşî rihê min ê hunerî bi serket û min ji siyasetê xwe paşêve kêşa. Weke hûn jî dizanin hunemend ji azadiya xwe hez dikin. Mixabin hizbên me yên siyasî dibêjin em çi bixwazin ger hûn wê binivîsin. Min ev yek nekir. Ji ber vê yekê ez hê jî ne endamê tu partiyan im.

Ernest Hemingway

# Li pey hevokeke rast



CIWANMERD KULEK



Nameya Hemingway belkî axaftina herî kurt a xelatgirekî Nobelê bû, lê li gor Hemingway ew jî ji bo nivîskarekî gelekî dirêj bû. Di vê axaftina ku tenê ji 334 peyvan pêk dihat de Hemingway qal dikir ku “Nivîsîn, bi awayê herî baş, jiyaneke bi tena xwe ye,” û cardî di bîr tanî ku nivîskarekî baş diviya tenê bi nivîskarên mirî re têketaya pêşbaziyê.

**DESTANBÊJE** mezin Homeros gava behsa ceng û qewamên giran ên Îlyada û Odesayê dike, bi gotineke efsûnî sebeba wan rûdanan derdibirre: “Qederê tevna van hemû tiştan rist ji bo ku rojekê hindek kes çîroka wan bibêjin.” Mirov belkî celebê herî ciwan (gênc) ê candaran e li ser rûyê dinyayê û tarîxa wî di teqwîma gerdûnî de pelekî piçûk e, lêbelê bi şiyana vegotina çîrokên xwe kariye rabihuriya xwe ji a hemû celebên dî dirêjtir bike. Ademîzad di dîroka xwe ya kurt de gelek tişt jiya, ji wan gelek xeyal afirandin, gelek vegotin ristin, gelek qiset û meselok çêkirin. Gotina Homeros belkî gotina yekem û herî mezin e li ser îcraya vê wêjeyê: Tenê yek sebebê wan hemû serpêhatiyan, wan hemû derd û êş û kul û rûdan û qewaman hebû ku hatin serê me mirovan; hemû ji bo wê bû ku hinek qala wan bikin û wan bibêjin.

Kî ne evên ku hal û meseleyan vedibêjin û çîroka me dihûnin? Kî ne ew kesên ku em van hemû tiştan dijîn ji bo ku rojekê ew qala wan bikin? Tarîxa mirovatiyê bi çîrokbêjên şareza tije ne, çîrokbêjên di her serdemê de ketin reng û kirasekî dî, ji tarîfkirina hestekê heta bi qalkirina rojekê, ji sêwirandina xeyalekê heta bi salixdana serdemekê hikayeta me tomar kirine. Evana çawa neqil dikin, diafirînin yan li hev tînin;jiyan û serpêhatiya wan çi bû? Em ê di rêzenivîseke çar beşî de bikevin pey çîroka çar nivîskarên mezin ên ji çar parçeyên dinyayê, ku her yek ji wan bûye xelekeke qehîm ê vê zincîreya vebêjiyê. Em ê teswîreke piçûk û sade derxin li ser beşeke jiyana wan, yan çîroka weşandina berhemeke wan, yan serpêhatiyên ku qedera wan ew ristin ji bo ku rojekê ji me re bibe mereq, yan awa û şêwazê afirandina wan. Em ê bi rengekî yan çend rengan qala wan bikin, ji nav gelek rengên ku wan li pey xwe hişt û tevli tevna me kir.

**Li pey rêça hosteyên mezin**

Xeleka yekemîn a vê rêzê nivîskarek e ku di hunera vegotinê de tenê hosteyên mirî ji xwe re hevrik didîtin û bi wan re diket pêşbaziyê. Di cehd û xebata xwe ya nivîsînê de hunera xwe ewqas bilind kir ku awayê nivîsînê ê piştî xwe bi rengekî giran guherand û, 56 sal di ser mirina wî re, îro bûye yek ji hostayên herî mezin li panteona gewreyên berî xwe. Di 1950yî de *The New York Timesê* ragihand ku ew piştî Shakespeare nivîskarê herî girîng e. Ew Ernest Hemingway e; serkêş, maceraperest, maço, nêçîrvan, heyranê şer û cengan... gelek nav bi wî xistin, lê ew tenê li pey heqîqetekê, rastiyekê bû ku nediket bin ti nav û etîketan û hewl da ku wê tişta naye binavkirin bi awayekî herî rast, sade û fahmbar vebêje. Ji bo ku vê yekê pêk bîne tişta ku bikira jî basit û sade lê her wiha bi êş û westan bû: Gerek hemû tiştên zêde ji nivîs û gotinê bavêta, û bi vê jî nemaya, tiştinî dî yên “pirr xweş” jî ji nivîsê derxistaya ku di wê valahiya mayî de em, wek xwendevan, hîn bêtir di bin tesîra wê “xweşî û bedewî”yê de bimana û bi hest û hizrên wê bihatana dagirtin. Vê rêzika ku heta dawiya kariyera xwe (û jiyana xwe) girêdayî wê ma wiha rave dikir: “Başbûna kîtabekê divê, ji alî nivîskarê wê ve, li gor mikemeliya malzemeye ku wî jê biriye bê nirxandin.” Li gor vê teoriyê nivîskar dikaribû her tişt jê derxista bi şertê ku zanibûya çi jê derxistiye û beşê ku jê derxistiye dê çîrokê xurt bike û bi vî rengî bihêle ku xwendevan tiştekî bêtir his bikin ji hindê ku têdigihên.

Hemingway jiyana xwe bi arezûya ku hevokeke rast binivîse bihurand. Bêyî hevokên ku em binê wan xêz bikin, bêyî gotinên bedew, qerase, aforîzmatîk, bi stîleke ku di nêrîna pêşî de hin xwendevan tiştên “edebî” tê de nebînin û bifikirin ku ew dikarin jê baştir binivîsin, bi tewaziheke bêpayan cîhaneke mezin û rengîn a xeyal û nîgaşan afirand. Piştî mirov bi ser xurtî û dewlemendiya vê hunerê dibe, mirov di ber xwe de wê gotina Homeros berevajî dike: “Tiştên ku diqewimin diqewimin, tenê ji ber ku hostayên gotinê qala wan dikin.”

**Nifşekî winda li Parîsê**

Ernest Hemingway di 1899an de li Chicagoyê hat dinyayê. Nivîsên wî yên pêşî di rojnameya *Kansas City Starê* de, di 1917an de derketin. Hemigway piştre karê xwe yê li vê derê dê wiha bîr bianiya: “Ev dibistana berra bû ji bo min bo ku hîn bibim bi hevokên kurt û sade binivîsim.”

Xwesteka wî ya ku tevlî şerê cîhanê bibe ji ber ku çavên wî xerab bûn nehat qebûlkirin, lê piştre bo karê ajotina ambûlansê li sengera Îtaliyê tevli artêşê bû. Di 1922yan de wek rojnamevan şerê Yûnan û Tirkan şopand. Dema vegeriya Chicagoyê û nizanibû dê êdî berê xwe bidaya kû, di şahiyekê de Hadley Richardson nas kir û neh meh şûn de pê re zewicî. Nivîskar Sherwood Anderson nav tê da ku biçe Parîsê û nameyek ji bo wî nivîsand da ku wî bi hevalên xwe yên li wê derê, li xerîbiyê, bide naskirin. Hemigway tevî jina xwe û kurê xwe Jack li Parîsê bi cî bû, Parîsa salên 1920î, Parîsa ku ji qewla Gertrude Stein “sedsala bîstan li wir bû.” Hemingway li wê derê bi helbestkar û nivîskarên Amerîkî ên wek Ezra Pound û F. Scott Fittzgerald re bû heval, bi rêk û pêk serdana Gertrude Stein dikir û diçû kîtabxaneya Shakespeare & Co. a Sylvia Beachê, ku James Joyce jî mudawimê wir bû. Gertrude Stein nivîskarên wê demê ên li wir, ku tevli şer bûbûn, sirgûn bûbûn, bê welat mabûn, bi vî rengî bi nav kiribû: “Nifşê Winda.”

Hemingway li Ewropa ji bo rojnameya Amerîkî *Toronto Starê* û du ajansên dî dixebitî û di ber de çîrokên fîktîf dinivîsandin. Hemingway bi wê xeyal û hêviyê dijiya ku rojekê dev ji karê rojnamevaniyê berde û bi nivîsîna fîksîyonê jiyana xwe bidomîne. Lê hê pirr hebû ji bo çîrok û romanên ku dinivîsandin wê serbestîyê jê re bînin. Lewma li Parîsê di belengazî û hejariyê de dijiya tevî Hadleyê û kurê wan Jack.

**Berhemên winda**

Hemingway carekê dema li Lozanê bû ji bo şopandina konferansekê ji bo *Toronto Starê* û du ajansan, Hadleyê ji Fransayê lêxist ku here cem wî. Pîlan ew bû ku herdu dê ji wir biçûna çiya bo kaşûnê *(skiing)*. Roja ku Hadley gihaşt bal Hemingway ji girî çavên wê venedibûn û devê wê nedigeriya. Hey çiqas Hemingway di ber da jî ku derdê xwe bibêje, gotin ji Hadleyê çênedibûn. Lê dema dawiya dawî Hemingway mesele bihîst nexwest bawer bike: Çenteyê Hadleyê li Gara Lyonê hatibû dizîn û hemû tiştên ku Hemingway nivîsîbûn, gelek çîrok û romanek, tevî eslên xwe di wî çenteyî de bûn. Hadley xwestibû surprîzekê lê bike, bi gumana ku Hemingway dê li wê derê, di tatîla wan de, li ser wan bixebitiya. Hemingway dikira aqlê xwe bixwara, di cî de li trênekê siwar bû û beziya daîreya wan a li Parîsê lê dît ku rast bû, kopyeyên karbon jî li malê nemabûn û di nav wî çenteyî de çûbûn.

Ji van berhemên wî yên ewil ên ku hatin dizîn tenê çîrokek di destê wî de ma. Wî berê ev çîrok şandibû ji hin ciyan re bo weşandinê lê ji ber ku nehatibû qebûlkirin jê re şûnde şandibûn û li posteyê bû. Dû re ev çîrok dê di rojeke giran û bê çare de bihata hawara wî. Rojekê, bê pere, li kîtabxaneya Sylvia Beach rûdinişt û bi vê xanimê re suhbet dikir. Sylvia Beach gelek caran di desttengiyan de alî Hemingway kiribû û ji bo xwendinê jî her tim kîtab didanê. Hemingway şerm kir ku bibêje heqê xwarinê jî di berîka wî de tine û bi behaneya ku dê here malê navroja xwe bixwe ji bal wê rabû. Gava dê rabûya, Sylvia Beach nameyeke ku ji Hemingway re hatibû dayê. Name ji kovara elmanî Der Quershnittê hatibû. Heqê wê çîrokê,600 frank, tê de bû. Pere xist berîka xwe û berê xwe da pastexaneyekê. Ma jê xweştir çi hebû ji bo wî! Hemingway ne tenê ji bo xwarin û vexwarinê, ji bo nivîsînê jî, her tim diçû qahwexaneyên Parîsê. Dikaribû bi *café crèmekê* ji sibehê heta êvarî li wan deran bixebitiya.


## Şeydayiya jiyanê û qewlê mirinê

Hemingway ji serborî û serguzeştan hez dikir, aşiqê temaşeya cenga conegayan a li Spanyayê bû, diçû nêçîrê li Afrîqayê û masîgiriya deryayên kûr dikir li oqyanosê. Di demên ku li Key Westa Floridayê dijiya de wî bi xwe qeyîkek çêkiribû û navê wê kiribû Pilar. Bi vê qeyikê bi hevalên xwe yên masîgir re diket pêşbaziyê û di hemû pêşbaziyan de dibû yekemîn. Dîsa bi vê qeyîkê masiyek girt ku masiyê herî mezin bû di celebê xwe de ku heta wê gavê li Atlantîkê hatibû zeftkirin. Van meyildariyên wî navê wî bi maçotiyê derxistin û ew kirin wek îkonekî mêranetiyê. Hetta helwestên “siyaseten rast” nehiştin ku berhemên wî di kîtabên dersê ên dibistanên dewletê de derkevin.

2yê Tîrmeha 1961ê, Mary Hemingway, jina çaremîn û dawîn a nivîskar, bi dengê demançeyekê hişyar bû. Cendekê bê ruh ê mêrê wê, bi kirasê ku wî herî pirr jê hez dikir û navê “xeftanê şah” lê kiribû, li odeyê dirêjkirîbû. Heta çend mehan jî Mary wiha bawer kir ku Hemingway dema demançeya xwe paqij dikir bi şaşî bera xwe dabû. Lê Hemingway tiştekî ku gelekî ji zû de pê zanibû bi hemdê xwe kiribû: Berî wê bi gelek salan dema bavê wî bi demançeyekê xwe kuştibû, di nameya ji xesûya xwe re de Hemingway qal kiribû ku ew ê jî “rojekê bi wî şiklî here.” Û dema ew roj hatibû, -bêhnteng ji nerihetiya giraniya laşê wî ê ku bûbû nêzîka 100 kîloyî, ji nexweşî û depresyonên ku carina diketê û xema ku êdî nema dikare binivîse – bi guleyekê xala dawî li wê hevoka rast û heqîqî a jiyana xwe xistibû.

Di 1950yî de *The New York Timesê* ragihand ku ew piştî Shakespeare nivîskarê herî girîng e. Ew Ernest Hemingway e; serkêş, maceraperest, maço, nêçîrvan, heyranê şer û cengan... gelek nav bi wî xistin, lê ew tenê li pey heqîqetekê, rastiyekê bû ku nediket bin ti nav û etîketan û hewl da ku wê tişta naye binavkirin bi awayekî herî rast, sade û fahmbar vebêje.





## Xelata ku hat ber deriyê Tenêtiyê

Hemingway serpêhatî û şahidiyên xwe di berhemên xwe de cardin ristin. Di romana xwe ya *Xatirxwestina ji Çekande* xwe spart azmûneyên xwe yên li sengerê şer ên Îtalyayê, di *Naqos ji bo Kê Lêdide*de ji şahidî û tecrûbeyên xwe yên dema şopandina şerê navxweyî ê Spanyayê sûd wergirt, di çîroka xwe ya meşhûr, *Berfên Kilimanjaroyê*,de serboriyên xwe û jina xwe yên nêçîrvaniya li Afrîqayê vejandin, di romana xwe ya dawî a mezin, *Pîremêr û Derya*, de silaveke bi hesret da bîranînên xwe yên masîgiriyê.

Di 1954an de “ji bo hostehiya wî ya di hunera vegotinê de û bandora ku li şêwaza hemdem kiriye”, komîteya edebiyatê a Nobelê ew xelat kir. Hemingway ji ber nerihetiya xwe nikaribû biçûya Stockholmê, ji dêvla wî balyosê Amerîkayê ê Swêdê, John C. Cabot, xelata wî wergirt. Nameya ku Hemingway şand ji rêwresmê re jî ji aliyê vî kesî ve hat xwendin. Nameya Hemingway belkî axaftina herî kurt a xelatgirekî Nobelê bû, lê li gor Hemingway ew jî ji bo nivîskarekî gelekî dirêj bû. Di vê axaftina ku tenê ji 334 peyvan pêk dihat de Hemingway qal dikir ku “Nivîsîn, bi awayê herî baş, jiyaneke bi tena xwe ye,” û cardî di bîr tanî ku nivîskarekî baş diviya tenê bi nivîskarên mirî re têketaya pêşbaziyê: “Nivîsîna edebiyatê dê çiqasî hêsan bûya eger tenê pêwîst bûya ku mirov tiştên ku berê baş hatine nivîsîn bi awayekî dî binivîsiya. Ji ber ku nivîskarên ewqasî mezin ên berê hene, nivîskarek tê dahfdan bo ciyekî wêdetirî ciyê ku dikare heriyê, ciyekî ku li wir kes nikare alî wî bike.”



Orkestraya Zarokên Ma

# Zarok hebin hêvî jî heye



NÛJÎN ONEN

Li cîhê ku zarok hebin li wir hêvî jî heye. Yek ji wan cîhiyan jî Ma Music Center e. Dema mirov diçe wir dengê stranan, dengê zarokan, dengê enstrumanan giş tevlîhev dibin û ew dengê tevlîhev dibin mirov aciz nake. Berovajî wê hêviyê dixe dilê mirov. Ji ber ku bi sedan zarok û mezin li wir kurs û perwerdehiya muzîkê bi zimanê xwe dibînin. Di heman demê de 2 orkestrayên vê navenda muzîkê hene; yek "Orkestraya Zarokên Ma" yek jî "Orkestrya Rîtmên Xwezayî" ye. Şêrko Kanîwar berpirsê Ma Music Centerê û Mamosteyê Orkestraya Rîtmên Xwezayî ye. Devrim Demir jî mamosteya muzîkê û berpirsa beşa zarokan e. Herduyan jî ji Heftenameya Basê re qala xebatên xwe kirin.

**"Li vir zarok fêrî zimanê xwe jî dibin"**

Mamosteya muzîkê û berpirsyara beşa zarokan Devrim Demir ji me re behsa perwerdehiya ku didin zarokan dike û wiha pê de diçe: "Zarok bo min taybet in. Xebata ku ez bi zarokan re dikim ji bo min cûdatir e. Mirov bi wan re kelecan dibe ji ber ku em her tim zarokan wek pêşeroja mirov bi nav dikin ji ber wê tu pêşeroja xwe çiqas dewlemend bikî tu yê ji wê encameke pir xurt bigirî. Ji ber wê em dixwazin hemu enerjiya xwe bidin zarokan. Zarokên ku ez bi wan re dixebitim hejmara wan bi ser 200 kesî re ye. Ji bo konserekê em bi wan re niha xebatekê birêve dibin. Beriya ez ji we re behsa konserê bikim dixwazim behsa dersên periyodîk yê di nav hefteyê de bikim. Zarokên me yên ku tenê tên kursan hene, yên perwerdehiya amûra distînin hene û herwiha yê tên perwerdehiya bingehîn ya muzîkê dibînin jî hene. Li vir bêhtir em bi zimanê Kurmancî perwerdehiyê didin. Ji bo kesên nizanin, dersên me yên ziman jî hene. Mixabin gelek malbat bi zarokên xwe re bi Kurmancî naxivin. Ji ber wê piraniya zarokan bi Kurmancî nizanin lê li vir avantajeke wan ya din jî heye fêrî zimanê xwe jî dibin. Zarok eleqeyeke pir mezin li hember ziman jî nîşan didin. Çiqas nizanibin jî dema tu bi zimanê wan tiştekî fêrî wan dikî tu wê roniyê di çavên wan de dibînî, bêhtir jî fêm dikin.

**"Em bi hersê zaravayan stranan amade dikin"**

Ji aliyê din, Devrim Demir di derbarê "Orkestraya Zarokên Ma" de wiha diaxive: "Ev orkestra ji zarokên ku tên kursê pêk tê. Him koro heye him orkestra heye. 200 zarok tê de cih digire, hejmara wan zêdetirî 200 kesî ye lê ji bo ku ev xebat ket demsala havînê gelek şagirtên me derketin derveyî bajêr. Ji ber wê kêm e, nexwe hejmara zarokên me nêzî 300î ye. Hefteya borî me dest bi provayê wê kir. Di orkestrayê de tembûr, keman, santûr, tembûra sêtêl û rîtîm hene. 150 zarok jî di koroyê de cih digire. Me ji bo konserê 6 stran amade kirine, hinek jê solo tên

> "Muzîk giyan e, mirov nikare jiyaneke bêmuzîk bifikire. Zarok di temenê biçûk de teqez divê dest bi muzîkê bikin. Ji ber ku muzîk di jiyana zarokan de tiştên ku kêm mane temam dike, eleqeya zarokan a li hember muzîkê gelekî mezin e"

gotin, hinek jê solo-koro ne. Konsera me dê 8ê Tîrmehê de çêbibe. Armanca vê konserê ev e ku bibînin ka çi huner di wan de heye. Navê orkestraya me jî "Orkestraya Zarokan ya Ma" ye. Stranên ku me ji bo zarokan amade kirine bir zaravayên Kurmancî, Soranî û Zazakî ne. Em hewl didin ku ji aliyê zimên ve repertuara xwe berfireh û dewlemend bigirin. Stranên ku me hilbijartine bêhtir yên gelêrî ne. Ji ber ku muzîka di roja me de tê çêkirin ji aliyê muzîka Kurdî ve ne dewlemend e. Mirov nikare wê wek muzîka Kurdî jî binirxîne. Em bêhtir hîmê xwe ji çanda gelêrî digirin. Zarokeke me ya 4 salî wê strana Hesen Zîrek Newrozê bibêje."

**"Eleqeya hemû zarokan bo muzîkê heye"**

Demir bandora muzîke ya li ser zarokan jî wiha dinirxîne: "Em dibêjin muzîk giyan e. Mirov nikare jiyaneke bêmuzîk bifikire. Zarok di temenê biçûk de teqez divê dest bi muzîkê bikin. Ji ber ku muzîk di jiyana zarokan de tiştên kêm maye temam dike. Ji ber wê eleqeya wan a li hember muzîkê gelekî mezin e. Carînan malbat tên dibêjin 'em dixwazin zarokên xwe bişînin kursê lê eleqeya wan bi muzîkê re nîne, em jê nebawer in ku ew ê amûrekê lê bide' em dibêjin hûn serê xwe bi vî tiştî nêşînin, yek zarok tune ku eleqeya wan li hember muzîkê tunebe.

**"Her zarok ji xwe re amûrekê hildibijêre"**

Şêrko Kanîwar di berdewamiya axaftina xwe de wiha dibêje: "Em van mijaran berî xebatê diaxivin. Piştî axaftinê êdî tiştên di destê wan de dikarin giyanekî li wan bar bikin. Ew darikê di destê wan de, ew kevçiyê çayê... Em radihilên li şûşa vala dixin. Ji bo wan maneyekê wê çê dibe. Dizanin ku li wir tiştekî ji rêzê çênakin. Em dibên wey em guh didin rîtma xwezayê û bi vê xebata xwe em dixwazin peyamekê jî hercar bidin guhdaran, ji bo ku guh bidin rîtma xwezayê. Her zarok ji xwe re amûrekê hildibijêre. Yê ku li satilan, yê ku tebaxên çayê, şûşeyên vala dixin... Hinek nîsk û birincê dixin hundirê şûşeyên plastîk û ji xwe re marakasan çêdikin. Zarokên ku nû tevlî me dibin henekê xwe pê dikin dibêjin em ê bi van çawa orkestrayê çêbikin. Lê piştî 2-3 ceribandinan dema ku ahenga wan dengan dibihîzin û dibînin ku wa ye tiştekî bi hevdu re dikin –ku bi kêmanî 100 zarok vê xebatê dike- li hev guhdarî dikin, li benda hev dimînin, zarok pir jê hezdikin.



## Zarok fêrî jiyana denbêjan jî dibin

Şêrko Kanîwar qala xebateke din ya taybet dike ku di vê xebatê de malbat û zarok bi hevdu re perwerdehiyê distînin û wiha dewam dike: "Ji aliyê din ez perwerdeyê didim zarokên temenê wan 2-3-4-5 salî dê û bavê wan jî bi wan re dikevin dersa muzîkê. Ev xebata 4 salan e. Li gorî temenê xwe yê biçûk zarok dibin komên 4 an 5 kesî. Ji hefteyî saetekê bi dê û bavê xwe re û 28 hefteyan tên dersê. Her hefte straneke Kurdî fêr dibin. Sê hefteyan carekê jiyana dengbêjekî fêr dibin. Dengê Aram Tîgran, Evdalê Zeynikê, Şeroyê Biro, Meryem Xan, Hiseynê Farê, Xerapetê Xaco guhdarî dikin û em jiyana wan wek çîrokan ji wan re vedibêjin. Her strana ku em wî hefteyî fêr dikin em bi rêya Whatsappê an jî bi rêya flashdiskê didin malbatan. Wek çawa bi seatan derman bikar tînin, wisa jî serê sibehê carekê, êvarê carekê teqez divê malbat bi zarokên xwe re wê stranê guhdarî bikin. Hefteya din dema zarok tên kursê em dibînin yê ku zimanê wan digerin ji ber kirine yê ku zimanê wan nagere melodî ji ber kirine. Bi vî awayî em hewl didin bîra zarokan ya newayî ya melodîk pêş bikeve.





> "Ev xebata 4 salan e. Li gorî temenê xwe yê biçûk zarok dibin komên 4 an 5 kesî. Ji hefteyî saetekê bi dê û bavê xwe re, 28 hefteyan tên dersê. Her hefte straneke Kurdî fêr dibin, ji sê hefteyan carekê jî jiyana dengbêjekî fêr dibin. Dengê Aram Tîgran, Evdalê Zeynikê, Şeroyê Biro, Meryem Xan, Hiseynê Farê, Xerapetê Xaco guhdarî dikin û em jiyana wan wek çîrokan ji wan re vedibêjin"



## "Amûrên em bikartînin, alavên ku bikar neyên in"

Xwediyê Ma Music Center û Mamosteyê Orkestraya Rîtmên Xwezayî Şêrko Kanîwar wiha behsa xebatên xwe dike: "Ez li Ma Music Centerê bi zarokan re xebateke taybet bi rê ve dibim. 11 sal e ez bi zarokan re vê xebatê dikim. Navê wê "Orkestraya Rîtmên Xwezayî" ye. 120 kes di orkestrayê de cih digire. Hemû alav û amûrên em bikartînin ew alavên avêtine ku bi kêr neyên in û dema tu wan diavêje xwezayê wek zibil zirarê didin xwezayê jî. Wek satilên mast, satilê boyaxê, klavyeyên kompîtiran, şûşeyên sodayan, şûşeyên avê yê plastîk... hemû tiştên ku dikarin rîtma xwezayê xera bikin. Berî ku em dest bi vê xebatê bikin bi zarokan re her car di xebata yekem de bi qasî 15-20 deqeyan em li ser rîtma xwezayê şêwrê dikin. Rîtma dinyayê heye, cîhan li dora xwe û li dora tavê digere. Rîtma daran û gulan heye, tu wan av didî û hêdî hêdî bi rîtmekê mezin dibin, şev û roj bi rîtmekê çêdibin, dilê me bi rîtim diavêje. Dema rîtma dilê me xera dibe em diçin nexweşxanê. Dema ku daristan tên şewitandin çi dibe? Bandorê li me dike, aheng û rîtma xwezayê xera dibe an jî dema ku em behsa Heskêfê bikin di bin avê de bimîne çawa rîtma xwezaya civakê xera dibe? Bîra civakî û dîrokî tê kuştin, heger ku li Munzurê bendav çêbibin dîsa her wisa."



## "Civakîbûna zarokan pêş dikeve"

Şêrko wiha behsa taybetmendiya xebat û bandora wê ya li ser zarokan dike: "Zarokên pir şermok hene. Ji xwe taybetmendiyeke vê xebatê ew e dema min dest pê kir û heta niha zarokên ku li dibistanan dersên wan pir xerab in, zarokên di dibistanên pergalê de nikarin xwe îfade bikin, zarokên di nav civakê de, di nav hevalên xwe de nikarin xwe îfade bikin û bi tiştekî din eleqedar nebûne di nava vê orkestrayê de dibin kesek. Dibin endamekî orkestrayê û êdî tiştên di destê wan de deng derdixe, tiştekî pir hûrik e lê bi qîmet e. Tiştekî pir girîng heye xwerexnekirinê an rexnekirinê fêr dibin. Çawa fêr dibin? Mesela heger ku şaş lê didin ew xwe bi xwe ji hevdu re dibêjin ka bisekine divê te 3 caran lê bida an jî amûrek zehmet heye wexta bîdonê lê dixin yê ku rîtma wan pir baş dikarin derbasî wê beşê bibin. Piştî 2-3 ceribandinan, xwe bi xwe êdî dikarin bibêjin ez nikarim vê lê bidim ez dikarim derbasî marakasê bibim? An jî piştî salekê dikarin werin bibêjin êdî rîtma min baş bûye ez jî dikarim derbasî Koma Bîdonan bibim? Êdî zarok xwe bi xwe kapasîteya xwe fêr dibin. Li gorî kapasiteya xwe li wir bicîh dibin. Ev xebat bandorê li karakterê wan yê jiyanê jî dike. Civakîbûna zarokan pêş dikeve, mecbûr e li benda 100 hevalê xwe bisekine heta ku dor were wî. Ji bo wê ew zarokên bêsebir, bi taybet zarokên hîperaktîf di wê xebatê de asta wan a guhdarîkirin û baldariyê diçe saetekê. Ew zarokê ku 5 deqeyan nikarin li te guhdarî bikin di vê xebatê de saetêkê li cîhê rûdinîn. Ji aliyê din bi zaravayên Kurmancî, Soranî, Zazakî stranan dibêjin. Weke solo nabêjin lê bi hevalê xwe re hewl didin dengê xwe bilind bikin.

